FERHENG Ê PÎŞKÊN KURDÎ

Û PÎŞGOTINEK LI SER RÊJE Û DEMÊN PÎŞKAN

KURDÎ - INGLÎZÎ - EREBÎ

THE DITIONARY OF KURDISH VERBS

AND PREFACE ABOUT THE MOODS AND TENSES OF THE VERBS

KURDISH - ENGLISH - ARABIC

قاموس الافعال الكوردية

مع مقدمة عن صيغ و ازمنة الافعال

كوردي - انكليزي - عربي

Parêzer
Ibrahim Remezan Zaxoyî

FERHENG Ê PÎŞK ÊN KURDÎ

Xwediyê Imtiyazê
HAFIZ QAZÎ

Sernivîskar
MUEYAD TEYIB

©
Mafê Çapkirinê
parastî ye

Adrês
Eraq - Kurdistan
Duhok
Avahiyê yekêtiya
Sendikayen Karkeren
Kurdistanê
Tel.7225376 - 7222125

www.spirez.org
www.spirezpage.net

- **Jimara weşanê:** (241)
- **Navê pirtûkê:** Ferheng pîşkên kurdî
- **Danan:** Îbrahîm Remezan Zaxoyî
- **Pêdaçûn**:Xelat Remezan Nejjar
- **Derhênana hunerî:** Evraz Hisên
- **Berg**: Beyar Cemîl
- **Serperiştî ya hunerî:** Nazdar Jezeri
- **Serperiştî ya çapê**: Şêrwan Ehmed Teyib
- **Çapa:** yekem
- **Tîraj:** (750) Dane
- **Jimara Sipardinê:** (735) li sala (2007)
- **Çapxanya Xanî - Duhok**

دار سپيريز للطباعة والنشر
دهوك

SPIREZ PRESS & PUBLISHER
DUHOK

FERHENG Ê PÎŞK ÊN KURDÎ
Û PÊŞGOTINEK LI SER RÊJE Û DEM ÊN PÎŞKAN
KURDÎ – INGLÎZÎ - EREBÎ

THE DICTIONARY OF KURDISH VERBS
AND PREFACE ABOUT THE MOODS AND TENSES OF THE VERBS
KURDISH – ENGLISH - ARABIC

قاموس الافعال الكوردية
مع مُقَدمة عن صيغ وأزمنة الافعال
كوردي – انگليزى – عربي

Îbrahîm Remezan Zaxoyî

2007

Diyarî

Ez evê pirtûkê dikim diyarî bo cenabê **Nêçîrvan Barzanî**, serokê hukomet a herêm a Kurdistan a fidiral yê rêzdar;çiku cenabê wî,bivan kiryarên gelek baş radibe:-

1- Têgoşîn bo nehiştin a nexuendewarîyê,bi vekirin a xulan bo nexuandewaran li her cihekî pêdivê di Herêm a me ya Fidiral de.

2- rêzgirtin û handan a zana û rewşenbîran li welatî û li derveyî welatî. Zana û rewşenbîr,çira ne welatî ruhindikin û berê welatîyan didin bo pêş; da bigehin kerwanê welat ên pêşkevetî di cîhanê de.Ligel harîkirin a wan bo vekirin a dezgehên demborînê bo çelakî yên civakî û hunerî, da dev ji çayxanan û leyiztin a domînê û perkan berdin.

3- Vekirin a dibistanan û kolîc ên pêdivê li gelek dever ên welatî,da bibin bingeh bo zankoyan.

4- Pêşvebirin û xurtkirin a dezgehên asayîşê bo paraztin a welatîyan .

5- Puîte pêdana nivîsîn a zimanê me yê şirîn bi pîtên kurdî latînî,da hin parçeyên bakur a welatî agehdarbibin ji çelakîyên hukomet a me.

Hizar silav bo can ê bab û bapîr ên wî yên nemir.

Xoşî ya em têda dewlet serê Barzanî yê nemir û malbat û heval ên wî ne.

Parêzer Ibrahîm Remezan Zaxoyî

Pêrist

Pêşgotin …………………….......................... 9

Pîta A 27

Pîta B 37

Pîta C 49

Pîta Ç 51

Pîta D 59

Pîta E 73

Pîta Ê 75

Pîta F 77

Pîta G 81

Pîta H 91

Pîta Î 105

Pîta J 107

Pîta K 113

Pîta Kh 119

Pîta L 123

Pîta M **131**

Pîta N **137**

Pîta O **145**

Pîta P **147**

Pîta Q **165**

Pîta R **173**

Pîta S **187**

Pîta Ş **199**

Pîta T **207**

Pîta U **221**

Pîta V **223**

Pîta W **233**

Pîta X **239**

Pîta Y **247**

Pîta Z **249**

Paşgotin **257**

Jêder ên pirtûkê **259**

Pêşgotin

Min di vê pirtokê da pitir ji 1400 pîşk ên kurdî yên petî danan pêş çav ên xuandewar ên hêja egera min jê ewe, ku her yek ji me jêder ên pîşkan biduristî binasin, da çu şaşî di axavtin û nivîsînê da çê ne bin. Gelek ji nivîskar ên Kurd evan şaşîyan dikin:-

1. **Di dem ê daxuaz de** (The imparative) ligel pîşk ên(verbs) **zanîn û karîn.**

   Çêbûn a dem ê daxuaz:-

Bi+ rih a pîşkê+ e. Bo kitê. (for singular.)
Bi+ rih a pîşkê+in. Bo komê.(for plural.)
Rêz a yekê ji rêz ên derhînan a rihê ji jêderî.

Jêder(infinitive)	**Pîşk a borî(past tense)**	**Rih(The basic)**
Zanîn	zanî	zan
Karîn	karî	kar
Revin	revî	rev
Kirrîn	kirrî	kirr
Firîn	firî	fir

Bi + zan+ e.= **bizane**. Bi + zan + in.= **bizanin**.
Bi + kar + e.= **bikare**. Bi + kar + in.= **bikarin**.
Bi + rev + e.= **bireve**. Bi + rev + in.= **birevin**.
Bi + kirr + e.= **bikirre**. Bi + kirr + in.= **bikirrin**
Bi + fir + e. = **bifire.** Bi + fir + in. = **bifirin.**
Bizane,bizane,ez kurdim.
Ez dizanim,ku tu kurdî
Min zanî ye,ku tu li Siwîdê dijî.
Min zanî bû,Ku ew peşêmane (poşmane).
Ez dikarim kurdî bixuînim.
Tu dikarî kurdî binivîsî.
Ew dikare inglîzî bixuîne.

Hinkes evê rêzê bikardînin bişaşî:-
Bi + rih + ibe.= bizanibe. Bi + rih + ibin.= bizanibin.
Bizanibe,bizanibe,ez kurdim. Ev şaşîye.
Ez dizanibim,ku tu kurdî. Ev şaşîye.
Ew dizanibe,ku tu kurdî. Ev şaşîye.
Tu dizanibî,ku ez kurdim. Ev şaşîye.
Ez dikaribim kurdî bixuînim. Ev şaşîye.
Tu dikaribî kurdî binivîsî. Ev şaşîye.
Ew dikaribe inglîzî bixuîne. Ev şaşîye.

Têbînî:- Bizanibe û Bikaribe.Bizanibin û Bikaribin şaşî ne di zimanê kurdî de. Min hîvî heye kes bikar ne îne.(Bizane û Bikare.Bizanin,û Bikarin duristin bikarbînin.)

2. <u>Werin</u><u>:-</u> Hin kes werin dikin **jêder**. Ew şaşîyek mezin e. Were! kit, werin! kom, pîşkên ferman in (daxuaz in).

Jêderê were (**Hatin) e. Hatin, bihê(were), dihê, hat, dihat, hatîye, hatîbû.**

Hinkes dibêjin(teqe lê were kirin.) Ev şaşîye çiku(were) li vir ne daxuaz e. Başe, teqe kengî lê hat kirin? Divê bihê zanîn ka teqe kengî lê hat kirin.Çiku divê pîşkê dem ê xu hebe.(Pîşk(verb) karek e di demekê de dihê kirin.).

(Teqe lê were kirin.) ristek bê wate ye. Çiku bê dem e. Seyrî evan ristan bike:-

- Teqe lê dihê kirin. Kengî? Niha (present contiuous tense).
- Teqe lê hat kirin. Kengî? Berî niha (demê borî)(past tense).
- Teqe lê dihat kirin. Kengî ?dema ez borîm. (demê borî yê berdewam.)
- Teqe lê dê hê kirin. Kengî? Demê bêt (demê ayinde). (future tense).
- Teqe lê hatîye kirin berînoke(allready). Demê tewawbor (present perfect)
- Teqe lê hatîbû kirin,berî ez biçim. Demê dûrbor (past perfect).
- Heker teqe lê bihê kirin,ew dê reve/revit. Demê niha yê bilanî (înşaî) ye (present subjunctive tense.)

- Heker teqe lê hatiba kirin,ew da reve/revit. Demê borî yê bilanî. (Past subjunctive tense).

Têbînî:- Were! Werin! Ne jokerin da bo hemî dema bikarbînin. Bo daxuazê bitinê bikarbînin, çiku demê wan demê ne borî ye. Wek:-

- Aram wer**e** da biçin! An
- Gelî bira wer**in** da biçin!
- Te gazî wan kir da bihên. Çiku hemî amadene bo çûnê.

3. He, ha. han = one, ones.

He:- peyvek taybete,cihê navê nêr û mê digire,kit û kom, da nav dubare nebe; demê em (ev,ew) bikarbînin bo bersiva (Kî ji van? An, Kî ji wan?)

Wek:

- kî ji van mirîşkan hêkkerin? Bo bersivê: Ev mirîşk hêkker e. An, Ev a he hêkkere. This one is egglayer. An, Ev duên he(ha,han) hêkkerin. These tow ones are egglayers. An, Evên he(ha,han) hêkkerin. These ones are egglayers. He(ha, han) di bersivê de cihê navê mirîşkê girt da dubare ne be/bit.

Dr. Kamiran Bedirxanî di rêzman a zimanê kurdî de,li jêr babetê cînav ên nîşadanê(Ev,Ew) wê gotî:-

Ev he/ha. **Ew he/ha**. Divîya gotiba:- **Ev e**. **Ew e**.
Çiku(**e**)=(**is**)Pîşka bûnê,**he/ha** ne pîşka bûnê ne.An divîya gotiba:-
Hin dever (**e**) dikin (**he,ha**).

Têbînî:- Hinkes He /han Bikardînin wek pîşka bûnê,dema dibêjin:-

- (Ev bajar han)ew şaşîye. Ya rast; (Ev bajar e.) (this town is.)
- Hinkes he/han bikardînin wek cînavê nîşadanê bo kitek dûr (Ew), dema dibêjin:- (Bajar han)Ew şaşîye. Ya rast, (Ew bajar) (That town).

Vêca nabit em (han)Carekê bikin pîşka bûnê û carek din bikin cînavê nîşadanê(ew). Ma joker e? Divêt em zimanê xu yê şirîn aloz nekin û ji şaşîyan paqijbikin, da pêngavekê ber bi zimanê yekgirtî ve biçin.

4. Hin birayên hêja evan şaşîyan dikin di **jêderan** de.

ŞAŞ (WRONG)	**RAST (RIGHT)**
Çûyîn	cûn (têneper e)
Rawestîn	rawestan (têneper e)rawestandin(Têper e)
Dayîn	dan (têper e)
Geryan	geran (têneper e) gerandin (têper e).
Nivîsandin	nivîsîn (têper e)
Kolandin	kolan (têper e)
Kirryan	kirrîn (têper e)
Livyan	livîn(têneper e) livandin(têper e)
Nasandin	nasîn (têper e)
Peqyan	peqîn (têneper e)peqandin (têper e)
Revyan	revîn (têneper e) revandin (têper e)
Vegeryan	vegeran (têneper e) vegerandin (têper e)
Westîn	westan (têneper e) westandin (têper e)
Zayîn	zan (têper e)
Tirsîn	tirsan (têneper e) tirsandin (têper e)
Tiraştin	tiraşîn (têper e)
Vekolandin	vekolîn (têper e)

Têbînî:- Ez dê hemî jêder ên pîşkan danim pêş çav ên xuendewar ên hêja, da bihên nasîn û şaşî nehên kirin. **Supas**.

RÊJE Û DEM ÊN PÎŞKAN

Rêje ya ragehandinê (indicative mood) (elsîxe elîxbarîye bi Erebî). Ev rêje ye kiryar ên rastîyê ber çav dikin, û **heşt** dem hene:-

1. Demê ferman(daxuaz) (imparative).
2. Demê ne borî (ranebordo) (present tense).
3. Demê neborî yê berdewam (present continuous).
4. Demê bihê(bêt) (ayinde) (future tense).
5. Demê borî (rabordo) (past tense).
6. Demê borî yê berdewam (rabordoyberdewam) (past continuous)
7. Demê tewawbor (present perfect tense).
8. Demê dûrbor (past perfect tense).

Demê ferman(daxuaz):- Ew kar e,yê peyvker (first person) ji peyvligelî (secondperson) dixuaze, daku bike piştî demê axavtinê û bi harîkarî ya pêşgir (bi---e) çêdibe, heker kit be û (bi---in), heker kom be. Wek:-

Bi + rih a pîşkê + e. bo kitê.

Bi + rih a pîşkê + in. Bo komê.

- **Aram** nav ê xu(xwe)**bi**nivîs**e**!
- **Zarokîno** nav ên xu **bi**nivîs**in**!

Têbînî:- Heker pît a paşîn ya rihê(regî)dengdar(vowel)be; **e,**nakeve pişt kitê; lê **n**, dê keve pişt komê. Wek:-

Kit	**Kom**		**Kit**	**Kom**
1. Bi+ şû = bişû.	Bişû**n**.	**Bo neyî yê**:	Neşû(Meşû)	Neşûn(Meşû**n**)
2. Bi+ xu = bixu.	Bixu**n**.	=	Nexu (mexu)	Nexu**n**(Mexu**n**)
3. Bi+ rî = birî.	Birî**n**.	=	Nerî (Merî)	Nerî**n** (Merî**n**)
4. Bi+ hê = bihê.	Bihê**n**.	=	Nehê (mehê)	Nehê**n**(Mehê**n**)
5. Bi+ zê = bizê.	Bizê**n**.	=	Nezê (Mezê)	Nezê**n**(Mezê**n**)
6. Bi+ vê = bivê.	Bivê**n**.	=	Nevê (Mevê)	Nevê**n**(Mevê**n**)
7. Bi+ dirû=bidirû.	Bidrû**n**.	=	Nedirû(Medirû)	Nedirû**n**(Medirû**n**)

Demê neborî du demin:-

Demê neborîyê berdewam. Ew kar e,yê di demê axavtinê de çêdibe biharîkarîya:- (Di + rih a pîşkê + (m,im,î,e,n,in) = Present continuous. Wek:-

a). Ez nanî dixu**m**.	I am eating the bread. (M) = am.
b). Ez sêvan dikirr**im**.	I am buying the apples. (im) = am.
c). Tu çêlan difiroş**î**.	You are selling the cows. (î) = are.
ç). Ew nanî dipêj**e**.	She is baking the bread. (e) = is.
d). Em cilan dişû**n**.	We are washing the clothes. (n) = are.
e). Hûn pirrteqalan diçin**in**.	You are picking the oranges.(in) = are.

Demê neborî (present tense). Em evî demî bikardînin, daku biaxêvin li ser hin tişta çêdibin bi giştî ne di demê axavtinê de. Wek:-

1. Karek bi berdewamî çêbibe.Wek rastî.

Çêbûn a evî demî:-

Di + rih a jêderî + (m,im,î,e,n,in). Wek:-

a).Erd **dizivire** li dor xorê (rojê).
b).Xor(roj) **derdihê** li rojhelatê.

2. **karek dubare bi be.**

c).Brînpêç çavdêrî ya nesaxan **dikin.**

3. **Karek bû ye hîbûn (habit,custim)**

a).Bilind herroj saet(çikok) heftî spêdê **diçe** bo karî.
b).Kelebab (dîkil) Spêdê zû **bankdide.**
c).Bazarî êvaran saet (çikok) heşt **di**girin.

4. **Karek me bivê em bizanin ka çendcara dihê kirin.**

a). Çendcara (how often) di heftî yê de, tu **diçî** bo sînemayê ?
b). Çendcara di heyvê de,Ara serê xu **ditiraşe** ?

5. **Bo diyarkirina cihê jiyanê bikardihê.**

a). Nizar **dijît** li Hewlêrê.
b). Kurd **dijîn** li Kurdistanê.

Bo neyîyê(negative)(na) dane cih ê (**di**) di ristê de.
a). Roj hel**di**hê li rojhelatê. Roj hel**na**hê li rojavayê.
b). Roj **di**çe ava li rojavayê. Roj **na**çe ava li rojhelatê.
c). Erd **di**zivire li dor xorê (rojê). Erd **na**zivire lidor heyvê.
ç). Ez kurdî **di**axêvim bi duristî. Ez kurdî **na**axêvim bi şaşî.
d). Salar hişyar**di**be spêdê zû. Salar hişyar**na**be spêdê zû.
e). Azad **di**nive çikok heştî şevê. Azad **na**nive çikok heştî şevê.
ê). Bijar otombîlê **di**hajot herroj. Bijar otombîlê **na**hajot herroj.
f). Bazarî digirin di şevan de. Bazarî **na**girin di cejnan de.

Bo pirsê (question)(interrogative)(**Ma**)dane pêşîya ristê û nîşana pirsê(**?**) dane paşî ya ristê(hevokê)(sentense). Wek:-
a). **Ma** roj heldihê li rojhelatê **?** Erê.
b). **Ma** roj diçeava li rojavayê **?** Erê.
c). **Ma** erd dizivire li dor heyvê **?** No. (Ne.)
ç). **Ma** ez kurdî diaxêvim bi duristî **?** Erê. No.
d). **Ma** Salar hişyardibe çikok heftî spêdê **?** Erê.
e). **Ma** Azad dinive çikok heştî şevê **?** No. (Ne).
Ê). **Ma** Bijar otombîlê dihajo herroj **?** Erê. (No).
F**). Ma** bazarî digirin di cejnan de **?** No.

Têbînî:- Di rist ên serê de,me demê niha bikaranî;lê ne di demê axavtinê de.

Demê bêt (bihê, ayinde, future):-Ew kare,yê di demê piştî axavtinê de çêdibe. Du rêz hene nîşa me didin, ku tiştek dê çêbe di demê bêt de.

1. bi harîkarîya (**dê = shall,will**). Ew kar ne sedê sede,**hizirkirine**.

a). Azad sêvan **dê** kirre. **Hizirkirine**. Weheye bikirre,weheye ne kirre.

b).Tu nameyekê **dê** nivîsî.**Hizirkirine**.Weheye binivîsî,weheye ne

c). Em gulan **dê** çînin.**Hizirkirine**.Weheye em biçînin,weheye em neçînin.

2. Bi harîkarîya **(wê bi=Am going to.Is going to. Are going to)**
Ew kar sedê sede (100%100). Biryardane.

a). Azad sêvan **wê bi**kirre.Azad is going to buy apples. **Biryardane.**

b). Tu nameyekê **wê bi**nivîsî.You are going to write a letter. **Biryardane**.

c). Em gulan **wê bi**çînin.We are going to grow roses. **Biryardane.**

Têbînî:- Hinkes (**dê,wê bi**) dikin(**ê bi**), pît a (**d**)û(**w**)bikarnaînin. Ew ne zimanê **edebî ye**, zimanê **tebayî ye**(**A'mî ye).** Min hîvî heye (**dê, wêbi**) bikarbînin.

Bo neyî yê (negative) (**Na**) danin cih ê (**dê,wê bi**).

a). Bijar xanî **dê** kirre. Bijar xanî **na** kirre.(na= shall not,will not)
Bijar **will** buy the house. Bijar **will not** buy the house.

b). Salar hespekê **wê bi**kirre.Salar hespekê **na** kirre.(Na=am not going to.Is not going to,are not going to).Salar is going to buy a horse. Salar is not going to buy a horse.

Bo pirsê (interrogative):- (**Ma)**dabine pêşîya ristê û nîşan a pirsê (**?)** dabine paşîya ristê.

a). **Ma** bijar xanî **dê** kirre **?** Erê,Bijar xanî **dê** kirre.No, Bijar xanî na kirre.

b). **Ma** Salar hespekê **wê bi**kirre **?** Erê, Salar hespekê **wê bi**kirre.

Demê borî (rabordo,buhorî,past tense). Ew kare, yê berî demê axavtinê çêbûyî û bi avêtin a (**n,in**) ji jêderî

Jêder	**Pîşk a borî**
Çûn	çû
Hatin	hat
Revîn	revî
Revandin	revand

Têbînî:- Pîşk ên demê borî pêdvêyî pîşk a bûnê ne wek harîkar û dibin paşgir bo pîşkê.(pîşk ên bûnê evin):- (m,im,î,yî,e,ye,n,in).

a). Ez çû**m** bo bazarî duhî.
b). Ez hat**im** ji Dihokê pêr.
c). Em suyarbû**n** li hespan vê spêdê.
ç). Ew gehişt**in** nav rezî berî katekê.(berî katekê=an hour ago).
d). Wî gul çinî**n** duhî nîvro.
e). Min sêv firot**in** betirpêr.

Demê borî neyî. Bo neyî yê (ne) dabine pêşî ya pîşk a borî.

a). Ez çûm bo bazarî duhî. Ez **ne** çûm bo bazarî duhî.
b). Ez hatim ji Dihokê pêr. Ez **ne** hatim ji Dihokê pêr.
c). Min gul çandin berî du roja. Min gul **ne** çandin berî du roja.
ç). Em peyabûn ji otombîlê şevêdî. Em peya**ne**bûn ji otombîlê şevêdî.
d). Ew suyarbû li hespî pêr êvarî. Ew suyar**ne**bû li hespî pêr êvarî.

Demê borî pirs. Bo pirsê (Ma) dabine pêşîy a ristê û nîşan a pirsê (?) dabine paşî ya ristê.

a). **Ma** ez çûm bo bazarî duhî **?**
b). **Ma** ez hatim ji Dihokê pêr **?**
c). **Ma** min gul çandin berî du roja **?**
ç**)**. **Ma** em peyabûn ji otombîlê şevêdî **?**
d). **Ma** ew suyarbû li hespî pêr êvarî **?**

Dem ê borî yê berdewam (past coninuous tense).

Ew kar e, yê berdewamîyekê distîne berî axavtinê:-

- **Bi pêşgir** (**di**) ligel pîşk a borî ya têper çêdibe + (**n,in**) bo komê(plural).
- **Bi pêşgir** (**di**) û paşgir (**m,im,î,yî,n,in**) ligel pîşk a borî ya têneper çêdibe.

a). Min nan **di**xuar,dema tu hatî.
b). Ew suyar**di**bû li hespî,dema ez borîm.
c). Se **di**rewîn,dema kerwan gehiştî.
ç). Hûn **di**hatin û **di**çûn,dema stêr rijayî.
d). Ew **di**girî,dema babê wî venegerayî bo malê.

Dem ê borî yê berdewam û neyî.

(**ne**) dabine pêşîy a pîşka borî ya berdewam.

a). Min nan **ne**dixuar,dema tu hatî.
b). Ew suyar**ne**dibû li hespî,dema ez borîm.
c). Se **ne**direwîn,dema kerwan gehiştî.
ç). Hûn **ne**dihatin û **ne**diçûn,dema stêr rijayî.
d). Ew **ne**digirî,dema babê wî venegerayî bo malê.

Demê borî yê berdewam û pirs.

Bo pirsê (**Ma)** dabine pêşîya ristê û nîşan a pirsê(**?**) dabine paşîya ristê.

a). **Ma** min nan **di**xuar,dema tu hatî **?**
b). **Ma** ew suyar**di**bû li hespî,dema ez borîm **?**
c). **Ma** se **di**rewîn,dema kerwan gehiştî **?**
ç). **Ma** hûn **di**hatin û **di**çûn,dema stêr rijayî **?**
d). **Ma** Kawe **di**girî,dema babê wî ve**ne**gerayî bo malê **?**

Dem ê tewawbor (present perfect tense).

Ew kar e, yê dem ê borî çêbûyî û berdewame; an dem ê borî destpêkirî û berî axavtin tewawbûnê rawestayî.

Çêbûn a demê tewawbûr bi du texlîta ne (cora ne).

1 a). Pîşk a **tewaw** + **ye** ligel pîşk ên têper bo **nejimarnavan û jimarnav ên kit (single).**
b). Pîşk ên **tewaw** + **ne** ligel pîşk ên **têper** bo **jimarnav ên kom (plural).**
c). Pîşk ên **tewaw** + (**me,yî,ye,ne**) ligel pîşk ên **têneper**.

1. Min şîr kirî**ye**. Min şîr **ne** kirrîye**. Ma** min şîr kirrîye?
2. Te av vaxuarî**ye**. Te av **ne** vexuarîye. **Ma** te av vexuarîye?
3. Wî hespek firotî**ye**. Wî hespek **ne** firotîye. **Ma** wî hespek firotîye?
4. Me du hesp firotî**ne**.Me du hesp **ne** firotîne. **Ma** me du hesp firotîne?
5. Wê pênc bizin kirrî**ne**.Wê pênc bizin **ne** kirrîne. **Ma** wê pênc bizin kirîne?
6. Ez çûyî**me** bo Zaxoyê.Ez **ne** çûyî**me** bo Zaxoyê. **Ma** ez çûyîme bo Zaxoyê?
7. Tu çûyî**yî** bo Dihokê.Tu **ne** çûyî**yî** bo Dihokê. **Ma** tu çûyîyî bo Dihokê?
8. Ew çûyî**ye** bo gundî.Ew **ne** çûyîye bo gundî. **Ma** ew çûyîye bo gundî?
9. Em çûyî**ne** bo Wanê.Em **ne** çûyîne bo Wanê. **Ma** em çûyîne bo Wanê?

2 a). Wê+pîşka tewaw ligel pîşk ên **têper** bo **nejimarnavan û jimarnav ên kit.**

b). Wê + **pîşk a tewaw** + (**m,me,î,yî, n,ne)** ligel pîşk ên **têneper**.

1. Min masîyek **wê** kirrî. Min masîyek **ne** kirrî**ye**. **Ma** min masîyek Kirrî**ye?**
2. Te sê sêv **wê** kirrî**n**. Te sê sêv **ne** kirrî**ne**. **Ma** te sê sêv kirrî**ne?**
3. Ez **wê** çûyî**m** bo Dihokê. Ez **ne** çûyî**me** bo Dihokê. **Ma** ez çûyî**me** bo Dihokê?
4. Hûn **wê** hatî**n** ji Dihokê.Hûn **ne** hatî**ne** ji Dihokê.**Ma** hûn hatî**ne** ji Dihokê?

Demê dûrbor (past perfect tense).

Heker du kar çêbûn di demê borî de; divê demê karê yekem **dûrbûr be** û demê karê duwem **borî be**.

Çêbûn a vî demî:-

1 a). Pîşk a **tewaw + bû**, ligel pîşk ên têper bo **nejimarnavan û jimarnav ê kit**.

b). Pîşk a **tewaw + bûn**, ligel pîşk ên têper bo jimarnav ên kom.

2\ Pîşk a **tewaw + (bûm,bûyî,bû bûn**), ligel pîşk ên têneper.

1. Min av **vexuarî bû**,berî dîtin a te.
2. Te şîr **kirrî bû**, berî hatin a wî.
3. Wî hespek **kirrî bû**, berî çûn a me.
4. Me sê hêstir **firotî bûn**, berî av rabûnê.
5. Gulê pênc bizin **dotî bûn,** berî gehiştin a bêrîvanan.
6. Ez **çûyî bûm** bo Dihokê, berî hatin a Bijarî.
7. Tu **hatî bûyî** bo malê, berî hatin a min.
8. Ew **revî bû** ji gundî, berî hatin a polîsî.
9. Em **nivistî bûn** li ser banî, berî revîn a Aramî.

Bo neyîyê (**ne)** dabine pêşîy a pîşk a tewaw.

1.Min av **ne vexuarî bû**, berî dîtin a te.
2.Te şîr **ne kirrî bû**, berî hatin a wî.
3.Wî hespek **ne kirrî bû**, berî çûn a me.
4.Me sê hêstir **ne firotî bûn**, berî av rabûnê.
5.Gulê pênc bizin **ne dotî bûn**,berî gehiştin a bêrîvanan.
6.Ez **ne çûyî bûm** bo Dihokê,berî hatin a Bijarî.
7.Tu **ne hatî bûyî** bo malê,berî hatin a min.
8.Ew **ne revî bû** ji gundî, berî hatin a polîsî.
9.Em **ne nivistî bûn** li ser banî, berî revîn a Aramî.

Bo pirsê, (Ma) dane pêşîy a ristê û nîşan a pirsê (**?)**dane paşîy a ristê.

- **Ma** min **av vexuarî bû**,berî dîtin a te **?**
- **Ma** te şîr **kirrî bû**,berî hatin a wî **?**

Rêje ya bilanî. (subjunctive mood),(elsixe el înşaî,ye).

Ev rêje ye kiryar ên:- **çêbûn, hatubat û xuezî yê** pêşçavdikin. Rêje ya bilanî, demek neborî û sê dem ên borî hene.

Dem ê neborî yê bilanî (present subjunctive tense).

Çêbûn a vî demî:-

Bi + rih(binyat) + (**m,im,î,e,n,in**) ligel pîşk ên **têper û têneper**.

Wek:-

1. Heker ez **bibînim**, ez dê kirrim.
2. Heker tu **bibînî**, tu dê kirrî.
3. Heker ew **bibîne**, ew dê kirre.

4. Heker em **bibînin**, em dê kirrin.
5. Heker hûn **bibînin**, hûn dê kirrin.
6. Heker ew **bibînin**, ew dê kirrin.

Bo neyîyê (ne) dabine cihê (bi) û (na) dabine cihê (dê).

1. Heker ez **ne**bînim,ez **na** kirrim.
2. Heker tu **ne**bînî,tu **na** kirrî.
3. Heker ew **ne**bîne,ew **na** kirre.
4. Heker em **ne**bînin,em **na** kirrin.
5. Heker hûn **ne**bînin,hûn **na** kirrin.
6. Heker ew **ne**bînin, ew **na** kirrin.

Têbînî:- Di paristên heker de(**Ma**)dabine pêşîy a **şaristê** û nîşan a pirsê (**?)** dabine paşîy a ristê. Hinkes (**Ma**)dadinin pêşî **ya paristê**. Ew şaşîye.

1. Heker ez bibînim,**ma** ez dê kirrim?
2. Heker tu bibînî,**ma** tu dê kirrî?
3. Heker ew bibîne,**ma** ew dê kirre?
4. Heker em bibînin,**ma** em dê kirrin ?
5. Heker hûn bibînin,**ma** hûn dê kirrin?
6. Heker ew bibînin,**ma** ew dê kirrin?

Demê borî yê bilanî (past subjunctive tense).

Çêbûn a vî demî:-

1\ a) **Pîşk a borî** + (**bam,bayî,ba,ban**) ligel pîşk ên **têneper**.

1. Heker ez **çû bam**,tu da hêyî.
2. Heker tu **çû bayî**,ez da hêm.
3. Heker ew **çû ba**,Gulê da hê/hêt.
4. Heker em **çû ban**,hûn da hên.
5. Heker hûn **çû ban**,em da hên.
6. Heker ew **çû ban**,Aram û Gulê jî da hên.

Bo neyîyê (ne) dabine pêşî ya pîşk a borî ya bilanî.

1. Heker ez **ne** çûbam,tu da hêyî.
2. Heker tu **ne** çûbayî,ez da hêm.
3. Heker ew **ne** çûba,Gulê da hê/hêt.
4. Heker em **ne** çûban,hûn da hên.
5. Heker hûn **ne** çûban,em da hên.
6. Heker ew **ne** çûban,Aram û Gulê jî da hên.

Bo pirsê,di parist ên heker da, (**Ma**) dabine pêşîy a şaristê û nîşan a pirsê (**?**) dabine paşîy a ristê.

1. Heker ez çûbam,**ma** tu da hêyî **?**
2. Heker tu çûbayî,**ma** ez da hêm **?**
3. Heker ew çûba,**ma** Gulê da hê/hêt **?**
4. Heker em çûban,**ma** hûn da hên **?**
5. Heker hûn çûban,**ma** em da hên **?**
6. Heker ew çûban,**ma** Aram û Gulê jî da hên **?**

2\ b) **Pîşk a borî** + (**iba,iban**)heker pît a **paşîn** ya pîşk a borî bêdeng be.Wek:-

Kir, dît, got, xuar, dot, ajot, alîst, aland, çand, vekir, girt, hejand, hijmart

Pîşk a borî + (**ba,ban**)heker pît a paşîn ya pîşk a borî dengdar be.Wek:-

Kirrî, da, za, çinî, birrî, dada, bazda, darda, dirû(diruî), gura, hêra, hinû.

Ligel pîşkên têper.

1. Xuzî min yarî kiriba.
2. Xuzî te çêl dotiba.
3. Xuezî wî bizin firotiban.
4. Xuezî wê hirî şûştiba.
5. Xuzî me xuarin xuariba.
6. Xuzî we gundor çandiban.
7. Xuezî wan gamêş xudankiriban.
8. Xuezî min çêl **kirrîba**.
9. Xuzî mehînê canîyek **zaba**.
10. Xuzî wî çêl **guraba**.
11. Xuezî wê gul **çinîban.**
12. Xuezî me genim **diruîba.**
13. Xuzî we cil(kinc) **druîban**.
14. Xuzî wan pirs **zanîban**.

Têbînî:- Hinkes (bi-----a) bikardînin û dibêjin:

1. Xuezî min yarî **bi kir a.**
2. Xuezî te çêl **bi dot a**.

3. Xuezî wî bizin **bi firot a**.
4. Xuezî min çêl **bi kirrî ya**.
5. Xuezî mehînê canîyek **bi za ya**.

Ev şaşîyek mezine çiku (**bi**) nîşan a **demê neborî** ye (**present tense**) na be em ligel **demê borî** (**past tense**) bikarbînin.

Bo neyîyê ne dabine pêşîya pîşk a tewaw.

1. Xuzî min yarî **ne** kiriba.
2. Xuzî te çêl **ne** dotiba.
3. Xuezî wî bizin **ne** firotiba.
4. Xuezî wê hirî **ne** şûştiba.
5. Xuzî me xuarin **ne** xuariba.
6. Xuzî we gundor **ne** çandiban.
7. Xuezî wan gamêş **ne** xudankiriban.
8. Xuezî min çêl **ne** kirrîban.
9. Xuzî mehînê canîyek **ne** zaba.
10. Xuzî wî çêl **ne** guraba.
11. Xuezî wê gul **ne** çinîban.
12. Xuezî me genim **ne** duruîba.
13. Xuzî we cil **ne** duruîban.
14. Xuzî wan pirs **ne** zanîban.

Di xuzîyê (xuezîyê) da pirs nînin.

Demê tewawborê bilanî (present perfect subjunctive)

Çêbûn a vî demî:-

1. **Pîşk a tewaw** + **baya**. Ligel pîşk ên **têper.**
2. **pîşk a tewaw** + (**bama,baya,bana**). Ligel pîşk ên **têneper**.

a). Xuzî min **dîtî baya**,daku min **kirrî baya**.
b). Xuzî te **dîtî baya**,daku te **kirrî baya**.
c). Xuezî wî **dîtî baya**,daku wî **kirrî baya**.
ç). Xuezî wê **dîtî baya**,daku wê **kirrîbaya**.
d). Xuzî me **dîtî baya**,daku me **kirrî baya**.
e). Xuzî we **dîtî baya**,daku we **kirrî baya**.
ê). Xuezî wan **dîtî baya**,daku wan **kirrî baya**.

a). Xuzî ez **çûyî bama** bo Amedê.
b). Xuzî tu **çûyî baya** bo Amedê.

c). Xuezî ew **çûyî baya** bo Amedê.
ç). Xuezî em **çûyî bana** bo Amedê.
e). Xuezî hûn **çûyî bana** bo Amedê.
ê). Xuzî ew **çûyî bana** bo Amedê.

Têbînî:- Ev dem e di ziman ê **Inglîzî** da bikar nahê.
Bo neyîyê (ne) dabine pêşîy a pîşk a tewaw.
a). Xuezî wan **ne dîtîbaya**, daku wan **ne kirrîbaya**.

Dem ê dûrbor ê bilanî (past perfect subjunctive)
Çêbûn a vî demî:-
1. **Pîşk a tewaw** + **bûa(bûwa**). Ligel pîşk ên **têper.**
a). Xuzî min **kirrî bûa**.
b). Xuzî te **kirrî bûa**.
c). Xuezî wî **kirrî bûwa**.
ç). Xuezî wê **kirrî bûwa**.
d). Xuzî me **kirrî bûa**.
e). Xuzî we **kirrî bûa**.
ê). Xuezî wan **kirrî bûwa**.

2. Pîşk a tewaw + **(bûma,bûya,bûna**). Ligel pîşk ên **têneper**.
Wek:-
a). Xuzî ez **çûyî bûma**,berî çûn a Nizarî.
b). Xuzî tu **çûyî bûya**,berî çûn a Narînê.
c). Xuezî ew **çûyî bûya**,berî çûn a Hejarî.
ç). Xuezî em **çûyî bûna**,berî çûn a Nazê û Ciwanê.
d). Xuzî hûn **çûyî bûna**,berî çûn a Nermînê û Nesrînê.
e). Xuzî ew **çûyî bûna**,berî çûn a deybaban.

Bo neyî yê (ne) dane pêşîya pîşka tewaw. Wek:-
a). Xuezî min **ne** kirrî**bua**.
b). Xuezî te **ne** kirrî**bua**.
c). Xuezî wî **ne** kirrî**buwa**.

a). Xuzî ez **ne** çûyî**bûma**, berî çûn a Nizarî.
b). Xuezî tu **ne** çûyî**bûya**, berî çûn a Narînê.

Têbînî:- **1.** Hokerê (Na) bikardihê bo neyîyê(negative) ligel demê neborî û demê bêt**. Lê** ligel pişk ên (**zanîn, karîn û hebûn**) (Ni) bikardihê.Wek:-

a) Ez **ni**zanim tu kîyî.
b) Ez **ni**karim,te bibînim.
c) Min sêvek heye.

- Min sêvek **ni**ye. **Lê** bo **komê** (**Ni**) dibe **(Nî)** Min du sêv hene.
- Min du sêv **nî**nin. Te sê gundor hene. Te sê gundor **nî**nin. Wî çar çêl hene. Wî çar çêl **nî**nin.

Têbînî:-2. Min jêderên pîşkan bikaranîn wek pîşk û wek navê jêderî.Çiku: Jêder = pîşka borî + (n,in).

Pîþkaborî	**Jêder**
Çû	çû**n**
Kirrî	kirrî**n**
Revî	revî**n**
Hat	hat**in**
Dît	dît**in**
Barkir	barkir**in**
Suyarbû	suyarbû**n**

Jêder hene têper û têneper. Jêderên **têper** pîşk ên wan pêdivêyî **pîşkberê duristin(direct object**) di ristê de.

Min **mazî** çinîn. Te **genim** firot.

Jêderên **têneper**, pîşk ên wan ne pêdvêyî **pîşkber ên duristin**.

Ez **hatim.** Ew **revî.** Gulê **kenî**. Gurg **mir.**

Jêder **bê dem e**; lê pîşk ên jê dihên hildan **dem hene**. Çiku pîşk bê dem nabe. **(pîşk karek e di demekê de dihê kirin).** Wek:-

Çûn: jêderek **têneper e** pîşk ên jê dihên hildan evin:-

Biç e: (here) pîşka daxuaz e(imparative)
Diç e: pîşka neborî ye(present).
Çû: pîşka borî ye(past).
Diçû: Pîşka borî ya berdewam e(past continuous).
Çûyî ye: pîşka tewawbor e(present perfect).
Çûyî bû: pîşka dûrbor e(past perfect).

Kirrîn: jêderek **têper e** pîşk ên jê dihên hildan evin:-
Bikirr e: pîşka daxuaz e(imparative).
Dikirr e: pîşka neborî ye(present).
Kirrî: pîşka borî ye(past).
Dikirrî: pîşka borî ya berdewam e(past continuous).
Kirrî ye: pîşka tewawbor e(present perfect).
Kirrî bû: pîþka dûrbor e(past perfect)

Derkirin: Jêderek **têpere darijtî ye** ji (der + kirin) = derkirin. Pîşk ên jê dihên hildan evin:-
Derbike: pîşk a daxuaz e (imparative).
Derdike: pîşk a neborî ye (present).
Derkir: pîşk a borî ye (past).
Derdikir: pîşk a borî ya berdewam e(past continuous).
Derkirî ye: Pîşk a tewawbor e (present perfect)
Derkirî bû: pîşk a dûrbor e (past perfect)

Suyarbûn: jêderek **têneper e lêkdayî ye** ji (suyar + bûn). Pîşk ên jê dihên hildan evin:-
Suyarbibe: pîşk a daxuaz e (imparative).
Suyardibe: Pîşk a neborî ye (present).
Suyarbû: pîşk a borî ye (past).
Suyardibû: pîşk a borî ya berdewam e (past continuous).
Suyarbûyî ye: pîşk a tewawbor e(present perfect).
Suyarbûyî bû: pîşk a dûrbor e (past perfect).

Jêder (infinitive) hem **pîşk** jê dihên hildan hem **navê jêderî** ye (verbal noun). Navê jêderî di ristan de dibe pîşker (**subject**) û pîşkber. (**object**); lê nabe pesn (**adjective**) wek navê pîşkerî (**present participle**). Navê pîşkerî wek:- Zana, gerok, nûsek (nuîsek).

Têbînî:- Di ziman ê **Kurdî** de wek ziman ê **Inglîzî** û **Siwîdî**; du cor (**K**) hene;
Di ziman ê inglîzî de:-
Yekem= -**K**- wek:- Kat, king,work,kart,wake.
Duyem= -**CK**-(sivik) wek:- Ja**ck**, bla**ck**,sti**ck**,qui**ck**ly,atta**ck**.

Di ziman ê kurdî de:-

Yekem= -**K**- wek:- **k**ar= work=شُغل.**k**olan=to dig=يَحفُر. **k**a?=where=أينَ
Duyem=-**Kh**-(sivik).wek:-**Kh**ar=kid=جَدي .**kh**olan=narrow street=زُقاق
Kha=hay=تِبن .**kh**aj=pine=صَنوبر.**Kh**err=deaf=أطرَش .**Kh**êr=penis=زُبّ
Khin=short=قَصير .**Kh**otan=pen=زَريبة .**Kh**erik=unripefruit=فاكِهة فجّة

Û me gelek peyv hene (K)ên wan sivikin,dive em (**H**)danin pişt.

Têbînî :-

sinbul	nav	
j	jêder	infinitive
tê	têper	transitive
tên	têneper	intransitive
n.j.	Nav ê jêderî	verbalnoun
vt.	Têper	verb transitive
vi.	têneper	verb intransitive

Parêzer Îbrahîm Zaxoyî

A

Abrûbirin:j.tê.vt. Hetikbirin. **To despise,To scorn.** **يُهينُ ، يُحَقِّرُ**
Aramî karek ne di rê da kir,abrû yê xu(xwe) bir.
Salarî Nazê maçîkir li kholanê, abrû yê wê bir.
_ :n.j. verbal noun. **Despite, Contêmpt.** **إِهانه ، تَحقير**
Abrûbirin a hevalan ne karek başe.

Abrûçûn :j.tên.vi. Şerimkirin. **To be ashamed.** **يَستَحي**
Semyanî li bazarî tirek kir abrûyê wî çû.
_ :n.j. verbal noun. **Shame.** **إِستِحياء**
Salar guh nade abrûçûnê di nav hevalan de.

Adekirin:j.tê.vt. Pakkirin a bîstanî ji dexelî.**To clean.يُنَظِّفُ ا لزَّرعَ**
Du adekeran bîstanê min adekirin.Paleyekê rez adekir.
_ :n.j.Verbal noun. **Clean.** **تَنظيفُ ا لزَّرع**
Adekirin a bîstanan karekî pêdivê ye.

Agehdarbûn:j.tên.vi. Hatin têgehandin. **To inform.** **يُعلِمُ ،يُخبرْ**
Em agehdarbûn bo kombûnê (civînê).
_ :n.j.Verbal noun. **Information.أِ علا م ، أِ خبا ر**
Agehdarbûnê berê gundîyan da zibare ya gundî.

Agehdarkirin : j.tê. vt. Têgehandin. **To inform.** **يُنَبِّه، يُخْبِرُ**
Samanî ez agehdarkirim bo seyran a karêzan.
_ : n.j. verbal noun**. Information.** **اِخْبارْ، اِعْلامْ**
Agehdarkirin a gundî hat kirin.

Agirbarankirin : j.tê. vt. gullebaran. **To shoot.** **يُطْلِقُ ، يَرْمي**
Pêşmergeyan neyar agirbarankirin berî sê roja.
_ : n.j. verbal noun. **Shooting.** **اِطلاقْ ، رَمي**
Agirbarankirin a neyaran rojekê kêşa.

Agirbestkirin : j.tê.vt. Şer ragirtin.**To cease-fire.** يوقِفُ القِتالْ
Israîlê û Felestînîyan agirbestkirin.
_ : n.j. Verbal noun. Stopping fire. ايقافُ القِتالْ
Agirbestkirin çêbu dinavbera Parti û Yeketî de.

Agirdadan : j.tê.vt. 1.Agirhilkirin.To commove .يُثيرُالفِتنة
2.Agirkirin.To set on fire.يُشعِلُ النّار .
1.Xortekê agirdada li navbera Mameş û Pişderîyan.
2.Aramî agirdada li ber tanê rezî.
N.j. verbal noun.1.Commotion . إثارةُ الفتنه.
2.inflamation.إشعالُ النّار
1.Agirdadan li navbera du hozan ne karek başe.
2.Agirdadan li nêzîkî puîşî karê bê mejîyan e.

Agirgirtin:j.tê. vt. Agir têberbûn,sotin.To catch fire.يَشتَعِلُ
Behzad nivistî bû agirîgirt xanyê wî.
_ :N.j.Verbal noun. Catch fire .إشتِعالْ
Agirgirtin a pûşî li payîzan zû nahê vemirandin.

Agirhilkirin: j.tê. vt. 1.Dar sotin bûn agir. To set fire to, To inflame. يُشعِلُ النّار
2.Têkvedankirin. **To commove**. يُثيرُ الفِتنة
1.Nizarî agirhilkir daku goştî bibirêje/it.
2.Aramî agirhilkir li navber a hevalan.
_ : n.j.Verbal noun.**1.Setting fire to.**إشعالُ ا لنّار
2.Commotion.ثورة،فِتنة
1. Agirhilkirin nêzîkî dexlan qedexe ye.
2. Agirhilkirin li navber a gundî yan,karê bekoya ne.

Agirkirin : j.tê. vt. agirdagîrsandin. **To set on fire**. يُشعِلُ النّارَ
Hejarî agirkir da xu gerimbike. Zînê agirkir bo ça çêkirinê.
_ : n.j. verbal noun**. Setting on fire**.إشعالُ النّارْ
Agirkirin xoş e li zivistanê.

Agirvemirandin: j.tê.vt. agirkujandin.**To extinguish, to put out**. يُطفِىء النّار
Xanî yê Behzadî disot gundîyan vemirand.
_ : n.j. verbal noun. **Extinguishing. putting out**.إ طفاءُ ا لنّار
Agirvemirandin karê agirvemira ne.

Agirxoşkirin: j.tê. vt. agirjiyandinwe. **To kindle, to stoke**. **يُزكي النّار**
Rojekî sar me agirxoşkir, da agir me gerimbike.
Rojekî sar me agirxoşkir,da em gerim bibin.
_ : n.j. verbal noun. **Kindling.** **إزكاءُ النّار**
Agirxoşkirin li roj ên sar pêdivêye.

Ahenggêran : j. Tê. vt. Şahîkirin. **To celebrate .** **يَحتَفِل**
Kurd ên Swîdê ahenggêran newroz a îsal li Tênista.
_ : n.j. verbal noun. **Celebration**. **اِحتفا لْ**
Ahenggêran a newroz a îsal li Swîdê gelek xoşbû.

Ajotin :hajotin. J.tê. vt. Lêxurrîn 1.**To lead .2. To drive**.**يَقودُ**
Min hêster ajot. Te otombîl ajot.
_ : n.j. verbalnoun.**1.Lead,leading. 2.Drive driving**.**قِياد ه**
Ajotin a hêstiran ne asan e.Ajotin a otombîlan asan e.

Akincîbûn:j.tê. vi. Li warekê binecihbûn bo jiyanê. **To reside.** **يُقيمُ، يَسكُنُ**
Şemal li Bamernê akincîbû.
_ : n.j. verba noun. **Residing.اِقامه ، اِسكانْ**
Akincîbûn a Şemalî li Bamernê , karek başbû.

Alandin : j.tê. vt. Lêpêçan. **To wrap, To wind** **يَلُفُّ**
Sînemê benik li tibl (til) a xu aland.
_ : n.j. verbal noun **Wrapping(up)**.**لَفّ**
Gulê gulolkek çêkir ji alandin a benkî.
Alandin a benkî li ser teşî yê asan e.

Alizîn : j.tên.vi. Li hev hatin alandin.**To complicate**.**يَشتَبك**
Davên me alizîn , nahên vedan.
_ : n.j. verbal noun. **Complication**.**اِشتِباك**.
Alizîn a davan,em gîrokirin ji ravkirinê(nêçîrê) vê spêdê.

Alizandin:j.tê.vt.Li hev alandin a bê serûber.**To complicate**.**يُشَبِّك** .
Behzadî dav alizandin şevêdî.
_ : n.j. verbal noun. **Complication**.**تَشابُك**.
Alizandin a davan nêçîr a kewan têkda.

Alîkdan : j.tê vt. Xuarin dan a ajelî.**To feed, to fodder**. يُعْلِفُ، يُطعِمُ
Sêvê hesp alîkdan şevêdî.
_ : n.j. verbal noun. **Feed, fodder**.تَعْليف، إطْعام .
Alîkdan a dewaran karê zelaman e.

Alîstin : j.tê. vt. xuarin bi ezmanî. **To lick**.يَلْعَقُ، يَلْحَسُ
Seyî şîr alîst ji birsan. Se şîrî dialîse ji birsan.
_ : n.j. verbal noun**. Licking**. لَعْقْ ، لَحِسْ
Alîstin a şîrî bi ezmanî li seyî xoştê(xoşdihê).

Alozbûn : j.tên. vi.Têkçûn, ser lê şêwan. **To become confused**.
يَتَحَيَّرُ، يَرْتَبِكُ
Nizar alozbû,dema gurg dîtî li pêşîya xu.
_ : n.j. verbal noun. **Confusion**.حيره ، إرتباكْ
Alozbûn di demê tengavîyan de asayî ye.

Alozkirin: j.tê.vt.Têkbirin, ser lê şêwandin.**To become confused**.
يُحَيِّرُ ، يُرْبِكْ
Bê diravîyê(pareyîyê) ez alozkirim. Destkurtîyê ez alozkirim.
_ : n.j. verbal noun. **Confusion.** حيرَه ، إرباك.

Alozkirin a şagirdî di demê taqîkirinê de, ne ke!

Amadebûn:j.tên.vi.Pêkhatin.**To get ready**.يَسْتَعِدُّ ، يَتَحَضَّرُ.
Qenco amede ye bo çûnê.
_ : n.j. verbal noun. **ready.** حاضِرْ ، مُستَعِدّ
Amadebûn a Zînê bo wexerê ne asan e ,çiku berçiçik şîr e.

Amadekirin : j.tê. vt. Pêkanîn(pêkînan). Lêkdan. **To be ready**.
يُهَيِّؤُ، يَستَعِدّ
Rojî xu amadekir bo wexerê(oxerê).
_ : n.j. verbal noun.**Readiness**.تَهَيُّء، إستِعدادْ
Amadekirin a zaroyan bo her karî ne asan e.

Anîn : J.tê. vt. Înan, hanîn, **To bring, to get**.يَجْلُبُ,
Xorşîdî pênc bizin anîn ji gundî.
_ : n.j. verbal noun. **Bringing, getting**. إحضارْ ، جَلِبْ
Anîn a celebek pezî ji gundî; karê şivanî ye.

Arambûn: j.tên.vi. Tenabûn, bêhinhatin. **To calm down, to quiet**. يَصْبُرُ ، يَهدَ ؤ
Ez arambûm dema şerê cîhanê bi dawî hatî.
_ : n.j. verbal noun. **Quiet**. صَبرْ، هِدوء.
Arambûn piştî şerî pêşveçûn e.

Aramkirin : j.tê. vt. Tenakirin , **To calm, to quieten**.يُصَبِّرُ، يُهَدِّ ؤ .
Min zaro aramkirin da bikarin bixuînin.
_ : n.j. verbal noun. **Quiet**. تَصبير، تَهدِءة
Aramkirin a zaroyan li şahîyan karek giran e.

Arandin:j.tê.vt.Harkirin.**To provoke, to excite**.يُغْضِبُ، يُثيرُ
Cangîrî stêng arandin pêr êvarî.
_ : n.j.verbal noun. **Provocation, excitement**.اِغضابْ، اِثاره.
Arandin a stêngan karê zarokan e.

Asanbûn : j.tên.vi. Sanahîbûn. **To become easy**.يَهونُ، يَسهَلُ
Fêrkirin a kurdî asanbû bi pîtên(tîpên) latînî.
_ : n.j. verbal noun**. Easy, simple**. هَيِّنْ، سَهل.
Asanbûn a fêrkirin a kurdî bi pîtên latînî pêşveçûn e.

Asankirin : j.tê.vt.Sanahîkirin. **To make easy**.يُسَهِّلُ
Pîtên latînî fêrkirin a zimanê kurdî asankir.
_ : n.j. verbal noun.**Easy**. تَبْسيطْ، تَسهيلْ
Asankirin a fêrbûn a zimanê kurdî serkevtin e.

Aşgêran:j.tê.vt. Aş dan karî.**To run the mill**.يُشَغِّلُ الطّاحونه
Hevalî deh roja aşgêra bo gundîyan.
_ : n.j verbal noun. **Running the mill.**تَشغيلُ الطّاحونه .
Aşgêran karek asan e.

Aştbûn: j.tên.vi. Pêkhatin. **To establish peace**. يَتَصالَحْ.
Partî û Yeketî aştbûn ji dil.
_ :n.j. verbal noun**. Peace** صُلحْ
Aştbûn a her du partîyan dilê me kurdan xoşkir.

Aştkirin : j.tê.vt. Pêkanîn (pêkînan) **To reconcile**صالِحْ
Emrîka Partî û Yeketî aştkirin.
_ : n.j. verbal noun **Reconcilation.**مُصالحه.
Aştkirin a Partî û Yeketî li ser destê Emrîka çêbû.

Avabûn:J.tên.vi. ١.To build. يَنْبَني، يَتَشَيَّدُ. ٢.To set,to sink. يَغيبُ

1.Gund êt kavil avabûn ve.

2.Roj avabû; garan vegera bo gundî.

_:n.j.verbal noun. 1.build. تَشْييد 2.going down.غياب، اختفاء

1.Avabûn a gundan ne karek asan e.

2.Avabûn a rojê(xorê)nîşan a şevê ye.

Avakirin:j.tê.vt. To build. يُشَيِّدُ.

Gundîyan gundên xu avakirin.

_ :n.j.verbal noun. build. بناء، تَشييدْ

Avakirin a gundan gundî pêrabûn.

Avadanbûn:j.tên.vi.Mirov çûn navda.**To lodge,to accommodate** يأوي، يُسْكِنُ

Gund ên wêran hatin avakirin;paşî avadanbûn.

_ : n.j. verbal noun.**Lodging**, accommodation.إسكانْ

Avadanbûn a gund ên kêm av ne asan e.

Avadankirin:j.tê.vt.Mirov birin navda.**To belodged, toaccommodate.** يُسَكِّنُ

Gund ên nû hatin avakirin, hatin avadankirin.

_ : n.j. verbal noun. **lodge, accommodation**.ئيواء، إسكانُ

Avadankirin a gund ên nû hatin avakirin, hat kirin.

Avdakevtin: j.tê. vt. Avkêmbûn,avdabezîn.**To decrease water**. يَنْخَفِضُ الماءْ

Havînê av dadikevin û canca çikdibin(hişkdibin).

_ : n.j. verbal noun. **water decrease**.إنخِفاضُ الماءْ

Avdakevtin a rûbaran li havînan berçav e.

Avdan :j.tê.vt. Av gehandê, dan ber avê, awdan. **To irrigate**.يُروي

Rezvan heftî yê carekê bîstanî avdide.

_ : n.j. verbal noun. **irrigation.** إرواءْ

Avdan a bîstanî karê rezvanî ye.

Avdêran:j.tên.vi.Av jê hatin.**To ooze, to leak**.يَنْضَح، يَتَرشَّحْ

Denê me yê avê avdêrîn e. Hemû den avdêrîn in.

_: n.j. verbal noun. **oozing, leakage**.نَضِحْ، رَشَحْ

Avdêran ji gozikan bi şevê avê sardike.

Avdêrandin:j.tê.vt.Av jê çûn.**To ooze,to leak.**يُنَضِّحْ، يُرَشِّحْ
Gozikê me,avê kêm didêrîn e.
_ :n.j.verbal noun**.ooze,oozing,leak,leakage**.نَضِحْ، رَشَحْ
Avdêrandin ji denan,denan kerx nake.

Avêjtin (avêtin): j.tê. vt. Ji xu dûrkirin,firêdan. **To throw.**يَرْمي
Berevanî berek avêt kêlê,lêneda.
_ : n.j. verbal noun. **throwing.** رَمْ
Avêjtin a cilkan hîbûn e li Swîdê.

Avgêran:j.tê.vt.Avê dide têhnîyan,**To distribute water.**يُوَزِّعُ الماءْ
Şemalî avgêra di şahî ya bira yê min de.
_ : n.j. verbal noun. **water distribution**.تَوْزيعُ الماءْ
Avgêran di şahîyan de harîkarî ye.

Avgirtin:j.tê.vt.Avrawestandin. **To enclose water.** يَحْبِسُ الماء
Behzadî avgirt ji bîstanî, bîstan hişik kir.
_ : n.j. verbal noun. **water enclosure.**اِنْحِباسُ الماء
Avgirtin ji ser bîstanan karê neyaran e.

Avisbûn:j.tên.vi.Tiştbûn. Bergirtin.**To become pregnant**.يَحْبَلْ
Çêl a Bapîrî avis e. Sê çêl ên me avisbûn îsal .
_ : n.j. verbal noun**. pregnancy**. حَبَلْ، حَمِلْ
Avisbûn a kitikan dikeve heyv a şubatê.

Aviskirin:j.tê.vt.Zik pirrkirin,bi tiştêxistin.**to make pregnant.**يُحَبِّلْ
Gayekê çêlek aviskir li garanê.
_ : n.j. verbal noun. **pregnancy.** حَمِلْ،حَبَلْ
Aviskirin a mehînan bi harîkarî ya mirovan çêdibe.

Avjêçûn : j,tên. vi. Dêrandin. **To ooze**, **to leak.**يَنِزُّ، يُسَرِّبُ
Denê çayxanê kêm avjêdiçe.
_ : n.j. verbal noun. **oozing, leakage.** نَزْ، تَسَرُّبْ
Avjêçûn ji denên kerx kêm e.

Avkêşan:j.tê.vt. Avguhaztin. **To draw water, to carry water** **يَنْقُلُ الماء, يَسْحَبُ الماء**

Jinikan avkêşa bo savar kelandinê duhî. Me av ji bîrê kêşa.

_ : n.j. verbal noun.**drawing water,carrying water**.**نَقلُ الماء**

Avkêşan karê jinikan e li gundan.

Avlêkirin:j.tê.vt.Av avêtinê,av lê barandin.**To spray water**. **يَرُشُّ بالماء**

Nemam ên te çandin çirmisîn,avêlêbike.

_ : n.j. verbal noun**. spraying water**. **رَشٌّ بالماء**

Avlêkirin a herroj li nemam ên nû çandî, pêdivê ye.

Avrabûn : j.tên. vi. Lafaw **to flood**. **يَفيضُ الماء**

Serêbiharê li kurdistanê avradibin.

_ : n.j. verbal noun. flood. **فَيَضان**

Avrabûn a rûbaran her sal li meh a nîsanê çêdibe.

Avsarbûn : j.tên. vi. Avtezîbûn.**To cool water.يَبرَدُ الماء**

Ziviztanan av ên rûbaran sardibin.

_ : n.j. verbal noun. **cooling waterبَرَدُ الماء**

Avsarbûn ziviztanan karek asayî ye.

Avsarkirin : j.tê. vt. avtezîkirin.**To cool water**.**يُبَرِّدُ الماء**

Havînan em pêdivêyî avsarkirinê ne bo vexuarinê.

_ : n.j. verbal noun**. cooling water**.**تَبريدُ الماء**

Avsarkirin li havînan karê tezîkerê ye.

Avşêlîbûn : j.tên.vi. Avpîsbûn, avgêlbûn. **To muddy water**. **يَتَعَكَّرُا لماء**

Baran barî avşêlîbû li celalan.

_ : n.j. verbal noun. **muddy. عَكَرُ الماء**

Avşêlîbûn a rûbar ê gundî salê carekê ye.

Avşêlîkirin : j.tê vt. Avpîskirin, avgêlkirin. **To muddy water**. **يُكَدِّرُ الماء**

Barîn a baranê avşêlîkir li celalê gundî.

_ : n.j. verbal noun. **muddy**.**تَكديرُ الماء**

Avşêlîkirin bi barîn a baranê çêdibe.

Avtêçûn : j.tên. avê didêrîne, av xu têda nagire. **To leak water**. **يَتَسَرَّبُ الماء**

Me meşk a avê guhorî, çiku avtêdiçû.

_ : n.j verbal noun. **leaking water**. **تَسَرُّبُ الماء**

Avtêçûn ji meşkê, meşkê ji kardiêxe.

Avzan : j.tê. vt. Derhatin a avê ji erdê. **To spring, to well**. **يَنبَعُ الماء**

Xak a kurdistanê cihê avzanê ye.

_ : n.j. verbal noun. **spring, saurce**. **نَبعُ الماء**

Avzan li dorêt gundê me kêm e.

Avzêrkirin :j.tê.vt.kiraskirin bi zêrî.**To gild**. **يَطلي بالذهَب**

Zincîr a sto yê Ciwanê avzêrkirî ye;ne zêr e.

_ : n.j. verbal noun**. gilding**. **طليٌ بالذهَب**

Avzêrkirin karê zêringirî ye.

Awarebûn : j.tên. vi. Koçbûn, derbederbûn. **To tramp. يَتَشَرَّدْ**

Gelek gundî di enfal a reş da awarebûn.

_ : n.j.verbal noun.**homlêssnêss, vagrancy**. **تَشَرُّد**

Awarebûn a gundî yên kurd,Sedam husên hobarbû.

Awarekirin : j.tê. vt. koçkirin, derbederkirin. **To tramp. يُشَرِّد**

Be,isîyan gundî yên kurd awarekirin.

_ : n.j.verbal noun. **homlêssnêss, vagrancy**. **تَشَرُّدْ**

Awarekirin a gundî yên kurd, Rijêm a Be,is pê rabû.

Axavtin : j.tê. vt. peyivîn, **to speak, to talk**. **يَتَكَلَّمْ**

Sînemê ligel deyk a xu axavt,da li bira yê wê bibor e/it.

_ : n.j. verbal noun. **speaking, talking**. **تَكَلُّمْ**

Axavtin a Narînê û deyk a wê li ser şûkirinê(şuîkirinê) bû.

B

Bacdan : j.tê. vt. xuîkdan. **To pay tax**. **يَدفعُ الضَّريبة**
Ez her sal bac a hatê didim.
Divê her mirovek xudan hat; bacê bide.
_ : n.j. verbal noun. **paying tax**. **دَفعُ الضَريبه**
Bacdan serfirazî ye û jê revîn şermizarî ye.
Lawê kurd ji bacdanê ne reve.

Bacwergirtin: j.Tê.vt. xuîkwergirtin. **To get tax, to receive tax.** **يَستَلِمُ الضَريبه**
Bacwergir bacê werdigire.
_ : n.j. verbal noun. **getting tax, receiving tax.** **اِستِلامُ الضَريبه**
Bacwergirtin karê bacwergirî ye.

Backomkirin:j.tê.vt.xuîkkomkirin.**To gather tax**,**to collect tax**. **يَجمَعُ الَضَريبه**
Gundîyan backomkirin bo bacwergirî.
_ : n.j. verbal noun**. gathering tax**, **collecting tax**. **جَمعُ الضَريبة**
Backomkirin li gundan harîkarî ye bo bacwergirî.

Badan : j.tê.vt. **1**.ristin.**To spin.** **يَغزل** . **2**.zivirandin. **To turn**. **يُدَوِّرُ**
1.Teşî davan badide.
2. Narînê xu bada gêjbû.
_ :n.j.verbal noun. 1.**Spinning. 2.Turning**. **1.** **دَوَران** **2**. **غزل**
1. Badan rîsî dike benik bo çinînê.
2. Badan serê zarokan gêjdike.

Bangdan :j.tê.vt. Gazîkirin bo nivêjê. **To call out to pray**. **يُؤَذِّنُ**
Melayê spêdê bangda,gundî çûn bo mizgeftê.
_ : n.j. verbal noun. **calling out to pray**.ا ذا ن
Bangdan a spêdê gundî hişyarkirin ji xewê.

Bangêran:j.tê.vt. Bagurdan bi ser banî ra înan û birin. **To roll the roof. يَحدِلُ السَّطحَ.**

Berî baran barînê gundîyan bangêran.

_ : n.j. verbal noun. **rolling the roof. حَدلُ السَطِح**

Bangêranê gundî ji dilopan paraztin.

Bangkirin : j.tê. vt. Xuaztin. **To invite**. يَعزِمُ، يَدعو

Bijarî hemî heval û hogir bangkirin bo şahî ya xu.

_ : n.j. verbalnoun. **inviting.** عُزومه، دَعوة

Bankirin a heval û hogiran bo şahî yê dilê wan xoşkir.

Banqutan: j.tê vt. Şuînik li banî dan. **To knock the roof**. يَدُقُّ السَّطحَ

Hin kesan banqutan, berî baran barînê.

_ : n.j. verbal noun.**knocking the roof.** دَقُّ السَطِح

Banqutanê dîwar ji avpêdaçûnê paraztin.

Barandin : j.tê. vt. Av havêtinê, av lêkirin. **To spray, to sparge**. يَنهَمِرُ،يَرُشُّ

Seyranê av li nanî barand da nerimbib/e/it.

_ : n.j. verbal noun. **spray**. اِنهمار، رَشْ

Av barandin li nanê tîrê yê req bo nerimbûnê ye.

Barîn : j.tên. vi. Av ji bilindî yê hatin.**To rain**.يَمطُرُ

Baran barî, di rê ya gundî de, cil ên me terkirin.

_ : n.j. verbal noun. rain, **raining**.اِنهمار، مَطَر

Barîn a baranê ne hêla em biçin bo seyranê.

Barkirin: j.tê.vt. **1**.Tişt danan/ ser piştê/têda. **to lay load /on/in.** يُحَمِّلُ

2. Koçkirin. **to depart,to go away**يَرحَل.

1.Darîyan (darkeran) hêstir barkirin bi darên birrî.

2.Koçeran barkirin ji warên kevin.

_ : n.j. verbal noun. **1**.**Laying a** load / on/ in. حمل ، تحميل

2.Departure , Going away, leaving. تَرحيل

1.Barkirin a hêstir a şehmoz ne sanahî ye.

2.Barkirin ji warekê bo warek din her sal çêdibe.

Barrandin : j. tê vt. dengê pezî. **To bleat.**يَثغو الخَروف
Berxan barrand ji birsan.   Berx dibarrînin ji birsan.
_ : n.j. verbal noun**. bleat.** ثِغاءُ الخَروف
Barrandin a berx ên nû zayî xoştire ji dengê ba yî.

Barrîn: j.tên.vi.deng ji pezî derkevtin.**To bleat,to ba,a**. يَثغو
Berxê sava ji birsa barrî.
_ : n.j. verbal noun. **bleat**. غث
Barrîn a berx ên sava ,çend xoşe !

Başbûn: j.tên.vi.Çakbûn.**To become better,to improve**.يَتَحَسَّنُ
Nesaxê me başbû bi dermanê diktor bijarî.
_ : n.j. verbal noun. **betterment,improvement.**تَحَسُّن
Başbûn ji êşa zirav kêmbû sal ên bîstê.

Başkirin: j.tê. vt. Çakkirin. **To improve.** يُشفي، يُحَسِّنُ
Dermanî nesax başkir ji êşa giran.
_ : n.j. verbal noun. **improvement**.شِفاءْ، تَحَسُّنْ
Başkirin a nesaxan bi dermanî bû ne bi niviştîyan.

Baweranîn (Bawerînan): j.tê.vt. Dilkevtin, Dilê wî kevtê. **To blieve in.** يُؤَمِّنُ
Îmamê Elî yekemîn kes bû ji xortan, yê baweranî bi pêxemberî. silavên xudê lê bin.
_ : n.j. verbalnoun. **Believer** , **belief.** ئيمان، ثِقة
Baweranîn a xizman; pêxember,dilxoşkir

Bawerkirin: j. tê. vt.Kevt dilê wan.**To believe** . يَعتَقِدُ
Ez bawerdikim ku Xudê êke bê hevale.
_ : n.j. verbalnoun. **belief**.اِعتِقا دْ
Bawerkirin bi yeketî ya Xudê pêdivê ye li ser herkesekê.

Baweşkirin: j.tê.vt. Dan ber sîngê xu, dest li stoyî alandin. **To embrace**. يُعانِقُ، يَحْضُنُ
Nizarî kurê xu baweşkir;piştî ji wexerê vegerayî.
_ : n.j. verbal noun. **Embrace**. عِناقْ، حَضُنُ
Baweşkirin a Aramî û Dulberê ji evînê bû.

Baweşînkirin: j.tê vt. Ba lê kirin, **To swish.** يَهُفُّ
Nazikê babê xu baweşîndikir,dema deyk a wê hatî .
_ : n. J. verbal noun. **Swish.** هَفّ، هَفيف
Baweşînkirin li havînê bi baweşîn a destî ne mayî ye.

Bazarkirin: j.tê vt. Biha pirsîn, nirx pirsîn. **To bargain with.** يُعامِلُ ، يُساومُ
Tiştî bazarbike, berî kirînê!
_ : n.j. verbal noun. **Bargain.** مُعامَلَه، مُساوَمه
Bazarkirin berî kirrînê, pêdivê ye.

Bazdan : j.tê. vt. Xu di ser tiştî ra avêtin. **To jump over.** يَقفِزُمِن فوق
Her çend ku co ya avê fireh bû,min şiya ez bazbidim.
Dîwar ne gelek bilind bû,min karî ez bazbidim.
_ : n.j. verbal noun**. jumping.** قفزْ
Bazdan di ser co yan ra karê werzişkeran e.

Belavbûn: j.tên.vi. **1**. Ji hev dûrkevtin**. To disperse.** تَفرَّقوا
2. Hat pêradan. **To spread**. يَنتشِرُ
1. Em ji hev belavbûn, di şerî de.
2.Qeymax li ser nanî belavbû,dema min xuarî.
_ :n.j.verbal noun. **1. Dispresion**. تَفريق **2**. **Spread**. نَشِرْ
1.Belavbûn di şerî de pêdivê ye.
2.Belavbûn a tehînduşavê li ser nanî; dibe nantehînk.

Belavkirin: j.tê vt. **1**.Ji hev dûrkirin. **to disperse**. يُفرِّقُ
2. Pêradan. **To spread**. يُنشِرُ
1.Me Khar û bizin ji hev belavkirin da baş biçerin.
2.Min qeymax liser nanî belavkir û kir balolk.
_ : n.j. verbal noun. 1.**dispersion**. تَفريق **2.spread.** نَشِرْ
1.Belavkirin a bizinan li çolê baştire bo çerînê.
2.Belavkirin a qeymaxê li ser nanî baştire bo zarokan.

Berbûn: j.tên. vi. Kevtin. **To fall down**. يَقعُ، يَسقُطُ
Zaro ji doşkî berbû û serê wî şkest.
_ : n.j. verbal noun**. falling down**. وقوع، سِقوط
Berbûn ji bilindî yê,ziyan jê çêdibin.

Berdan: j.tê.vt. **1**.Hêla biçe, vekir. **to release**. **يُسَيِّبُ**
2.dest li ser rakir. telaqda. **to divorce**. **يُطَلِّقُ**
1.Hejarî hêstir berda, da biçer/e/it.
2.Samanî jin a xu berda.
_ :n.j.Verba noun **1.Release. تَسييبْ** **2.Divorce. طلاقْ**
1.Berdan a kewan ji rikehan canca pêdivêye.
2.Berdan a jinikan li dadgehan çêdib/e/it.

Berhevkirin: j.tê.vt. Pêkanîn, amadekirin. **To prepare. يُحَضِّرُ**
Segvanî karê xu berhevkir.
_ :n.j.Verbal noun: **Preparation. تَحضير**
Berhevkirin a karî Segvan tenakir.

Berhingarîkirin: j.tê.vt. Yeqegirtin, Xu têkilkirin. **To provoke. يَتَحَرَّشُ**
Aramî şaşîkir ligel Danî;lê Danî berhingarînekir.
_ :n.j.Verbal noun.**Provocation. تَحَرُّشْ**
Berhingarînekirin a Danî dilê Aramî xoşkir.

Berkevtin: j.tê.vt.kêrhahin. **To be good**. **يَصلُحُ**
Alan ev xanî berdikev/e/it,tu bikirrî.
Lezgîn xuşk a Narînê berdikev e tu bixuazî!
_ : n.j. verbal noun. **Goodness**. **صَلاحْ**
Berkevtin a jinik ên kurdan, dana Xudê ye.

Bersinggirtin :j.tê.vt.Desthilînan.**To face, to defend**. **يَتَصَدّى**
Aram kurek aza ye bersing a kesê nagir/e/it.
_ : n.j. verbal noun. **defence. تَصَدِّي**
Bersinggirtin a zordaran camêrî ye.

Bersivdan: j. tê. Vt. cabdan, welamdan. **To answer, to reply**. **يَرُدُّ، يُجاوبُ**
Bijarî pirsek kir ,min bersivda bilez.
_ : n.j. verbal noun. **answering, replying**.**رَدّْ، جَوابْ**
Bersivdan a durist jîrî ye.

Bestin: j.tê.vt. **1**. grêdan. **To bind, to fasten**. **يَربُطُ.**
2. Qerisîn. **To freeze.** **يَتَجَمَّدُ**
1.Min hêstir best bi singî ve.
2.Duhî sarbû celal hat bestin.
_ : n. j. verbal noun**. binding, fastening**. **رَبط. 2.Freeze. إنجماد**
1.Bestin a hêstir a şehmoz pêdivê ye.
2.Bestin a celalan li çille yê zivistanê çêdib/e/it.

Beşkirin : j.tê.vt. Lêkvekirin. **To divide, to separate**. **يُقسِّمُ**
Qazanc hat beşkirin li ser beşdaran.
_ : n.j. verbal noun. division, separation**. تَقسيم، قِسْمه**
Beşkirin a qazancî li ser beşdaran hat kirin serê salê.

Bezandin : j.tê. vt. Şkandin /di şerî da/di berêkanê da. **To overcome**, **to defeat**. **يُهزمُ**
Kewekî sorik kewê min bezand duhî êvarî.
_ : n.j. verbal noun. **overcoming, defeating. هَزيمه**
Bezandin a kewê min ji layê kewekî sorik ve çêbû.

Bezîn : j.tên. vi. Revîn, dorrîn . **to overcome. يَنهَزِمُ**
Kewê min bezî pêr êvarî di kozikî da.
_ : n.j. verbal noun. **overcoming. هَزيمه**
Bezîn a kewê min ez êşandim.

Bexşandin : j.tê vt. Dan, dikin diyarî. **To give. يَمنَحْ، يَعطي**
Serokê gundî hêstirek bo min bexşand par havînê.
_ : n.j. verbal noun**. giving. مَنح، عَطاء**
Bexşandin a hêstirê ji layê serokî ve, ez dilşadkirim.

Bexşîn : j.tên. vi. Dan, diyarîkirin. **To give. يَمنَح، يَعطي**
Min otombîlek bexşî bo kurê xu bi hilkevta serkevtin a wî.
_ : n.j. verbal noun. **giving**. **مَنح، عَطاءْ**
Bexşîn a diyarî yan dilê zarokan xoşdike.

Bêhêzbûn : j. tên. vi. Ji kaskevtin. **To lose power or strength**. **يَفقُدُ طا قتَهُ**
Ez bêhêzbûm Ji kêm xuarinîyê.
_ : n.j. verbal noun**. Powerlessness. فَقدُ الطاقه**
Bêhêzbûnê ez ji kar êxistim.

Bêhêzkirin : j.tê vt. Ji kasêxistin. **To become powerless**. **اَفقدُ طاقتَهُ**
Karkirin a berdewam ez bêhêzkirim.
_ : n.j. verbal noun. **powerlessness**. **فقْدُ الطاقه**
Bêhêzkirin a min ji Kêm xuarinîyê çêbû.

Bêhinvedan :j.tê. vt. Karnekirin, hesanewe. **To rest. يَرْتاحُ**
Min rojekê karkir; paşî min bêhinveda.
_ : n.j. verbal noun**. Resting. را حة.**
Bêhinvedan baş bû bo tenduristî ya min.

Bêhinvekirin : j.tê. vt. pişûstandin. **To take rest**. / اِرتاح
Min rojekê di heftî yê da bêhinvekir,evê heyvê.
_ : n.j. verbal noun. **taking rest. Resting.را حة.**
Bêhinvekirin a rojekê ji heftîyê sûd gehand min.

Bêhîvîbûn : j.tên.vi. Bêomêdbûn. **To despair**. **يَيْاَسُ**
Heval bêhîvîbû ji dîtin a kurê xu di qad a şerî da.
_ : n.j. verbal noun. **despair. يَئس**
Bêhîvîbûn a min ji çûn a Parîsê,ji bê pareyî(diravî) bû.

Bêhîvîkirin: j.tê vt. bêomêdkirin. **To become desperate.**يَئِسَ، اَيَّسَ
Min hin dirav ji pismamê xu xuazt;lê ez bêhîvîkirim.
_ : n.j. verbal noun**. desperation. Hoplessness. قِنوط، يَئس**
Bêhîvîkirin a min ji pismam ê min çêbû.

Bêhinkêşan: j.tê. vt. Henasekêşan. **To breathe, to respire**. **يَتَنَفَّسُ**
Şemalî bilez bêhindikêşa, di demê karkirinê da.
_ : n.j. verbal noun. **Breathing, respiration**. **تَنَفُّسْ**
Bêhinkêşan a kuîr pişan firehdike.

Bêhnijîn : j.tên. vi. Pişmîn**. To sneeze**. **يَعطسُ**
Ez sê cara liser hev bêhnijîm.
_ : n.j. verbal noun. **sneeze, sneezing**. **عَطِسْ**
Bêhnijîn difna girtî vedike.

Bêhoşbûn: j.tên.vi. Nivistin, ne hişyarbûn. **To faint**. **يُصابُ بالاِغماء، يُغمى عَلَيه**
Ez bêhoşbûm li heştî şubat a 1963-ê,dema min nûçe bihîstin.
_ : n.j. verbal noun. **fainting. اِغماء**
Bêhoşbûn a min pênc çuka (deqîqa) kêşa.

Bêhoşkirin:j.tê.vt. Nivandin,ne hişyarkirin. **To become unconsious.** **يُفقِدُهُ الوعيه**

Bihîstin a nûçe yên heştî şubat a 1963-ê, ez bêhoşkirim.

_ : n.j. verbal noun. **un consciousness.** **فقدُ الوعي**

Bêhoşkirin a min ji bihîstin a nûçeyan bû.

Bêjîngkirin: j.tê.vt.Vewijartin, genim pakkirin. **To sift, to sieve**. **يُغربِلُ، يُنخِلُ**

Genim hemû hat bêjîngkirin, çu nema nebêjîngkirî.

_ : n.j. verbal noun. **sifting, sieving**. **غربَلة، نَخل**

Bêjîngkirin a genimî biha yê wî berizkir(bilindkir).

Bêkarkirin:j.tê.vt.Îş jê kêşan,betalkirin. **To repeal, to despense with** **يُستَغنى عنهُ، يُبطِلُ**

Min xu bêkarkir da ez pirtûkan binivîsim.

_ : n.j. verbal noun. **repeal , اِستغناء عن، إبطال**

Ne be nanbir bi bêkarkirin a karkeran!

Bêşdan : j.tê vt. Harîkarî bi diravî û bi cilkan. **To contribute**. **يَتَبَرَّعُ**

Hemû gundîyan bêşdan bo komele ya sêwîyan.

_ : n.j. verbal noun**. contributing**. **تَبَرُّع**

Bêşdan karê mirov ên dilovanin.

Bêşkirin: j.tê. vt. Dirav û cilik kirin diyarî. **To contribute.** **تَبَرَّعوا**

Gundîyan genim bêşkir bo hejaran.

_ : n.j. verbal noun**. Contributing**. **تَبَرُّعْ**

Bêşkirin a genimî mirovatî bû,ji layê gudîyan ve.

Bêzarbûn : j.tên. vi. Pê nexoşbûn, ser lê şêwan. **To displease**. **يَنزَعِجُ،يَستاءُ**

Segvan bêzar e ji reqî ya axa yê gundî.

_ : n.j. verbal noun. **Displeasure**.**اِنزعاج، اِستِياء**

Gundî bêzarbûn ji xûk danê.

Bêzarkirin:j.tê vt.Dil nexoşkirin,ser lê şêwandin. **To displease**. **يُزعِجُ**

Berdewambûn a şerî Cangîr bêzarkir.

_ : n.j. verbal noun. **Displeasure.** **اِزعاجْ**

Bêzarkirin a Aramî Ji berdewamî ya şerî bû.

Bicihbûn(bicîbûn) : j.tên. vi. Cihek dît lê bijît. **To dwell**, **To settle down** يسكِنُ ، يُقطِن .
Koçber vegeran û zû bicihbûn.
_ : n.j. verbal noun**.** **Dwelling**. سَكَنْ
Bicihbûn a koçberan hukmet pêrabû.

Bicihkirin: j.tê.vt. Cihek bo wan dîtin lê bijîn. **To lodge, to live in.** يُسَكِّنُ
Koçber hatin bicihkirn li Dihokê.
_ : n.j. verbal noun. **Lodging, living**. إ سكا نُ
Bicihkirin a koçberan zû hat kirin.

Bicihanîn : j.tê vt. Pêkanîn, Bicîanîn. **To execute,to complete.** أنجَزَ، يُنجِزُ
Çi karê te bivê, ez dê bo te bicihînim.
_ : n.j.verbal noun.**Execution, Completion**. إنجازْ
Bicihanîn a karê rojê pêdivêye.

Bidestkevtin : j.tê.vt.Qazanckirin,Peydakirin.**To optain, to get**. يَنالُ، يُحَصِّلُ
Kewek serjêkirî rojê bidestbikev/e/it; zor başe bo Azadî.
_ : n.j. verbal noun. **Optainment, getting**. نَيْل، تَحصيل
Bidestkevtin a xanîyek vala bo kirrînê serkevtin e,evî demî.

Bihakirin :j.tê vt. Nirxkirin, **To value**. يُثمِّنُ
Berdevkî(dellalî) xanî bihakir ,berî ez bikirrim.
_ : n.j. verbal noun**.** **Value.** **Valuation**. تثمين
Bihakirin a berdevkî pêdivêye bo kirrîn a xanyan.

Bihîstin : j. tê. vt. gulêbûn(guhlêbûn). **To hear**. يَسمَعُ
Min dengek bihîst û ez li pey dengî çûm.
_ : n.j. verbal noun. **hearing**. سِماعْ
Bihîstin a dengekî bilind,ez hişyarkirim.

Bijartin : j.tê. vt. Jêgirtin,**To choose, to select,to elect**.يَختارُ، يَنتَخِبُ
Min hespê spî bijart ne yê reş.
_ : n.j. verbal noun. **Choosing, selection, election.** اِنتِخابْ، اِختِيارْ
Bi bijartin a hespê spî dilê min xoşbû.

Bikaranîn : j.tê vt. Da ber karî. **To use**. **يَستَعمِلُ**
Min otombîl bikaranî berî ez bikirrim.
_ : n.j. verbal noun. **Using**. **اِستِعما ل**
Bikaranîn a otombîlê berî kirrînê ez piştrastkirim,ku başe

Binçenganêkirin.:j.tê vt. Hevgirtin bidestan bo zoranê. **To wrestle**. **يَتَصارعُ**
Bijarî û fêrkerê codo û keretê binçenganêkirin .
_ : n.j. verbal noun. **wrestling**. **مُصارَعه**
Binçenganêkirin corek e ji cor ên zorxanê

Bindarîkirin:j.tê.vt. Seqbêrîkirin, Çavdarîkirin. **To take care of**. **يَعْتَني ب**
Gulê du sala bindarîya birayê xu kir .
_ : n.j. verbal noun. **Care**. **اِعتِناء**
Bindarîkirin a mirovê nesax, karek mirovatî ye

Bindestkirin:j.tê.vt. **1**.Dagîrkirin. **To conquer**. **يَحتَلُّ**
2. desteserkirin. **To detain.** **يوقِفُ، يُخضِعُ**
1.Japanî Gelek sala çîn bindestkir.
2.Polîsî Berevan car roja bindestkir .
_ : n.j. verbal noun.**1.Conquest, yielding**. **اِحتِلال**.
2.Detaition. **اِعتِقا ل**
1.Bindestkirin a çînê ji layê Japanî ve, gelek sala kêşa.
2.Bindestkirin a Berevanî ji çar roja ne pitir bûn.

Binecihbûn:j.tên.vi.Akincîbûn.**To dwell,To lodge.** **يَسكُنُ**
Koçer li Ermiştê binecihbûn.
_ :n.j. Verbal noun. **Dwelling, Lodging**. **سَكَن ، سَكْنى .**
Binecihbûn a koçeran li Ermiştê karek başbû.

Binecihkirin: j.tê.vt. Akincîkirin. **To lodge.** **يُسكِنُ، يُقطِنُ**
Leşkerî koçer binecihkirin li Ermiştê.
_ :n.j.Verbal noun.**Lodging.** **اِسكا ن**
Binecihkirin a koçeran leşker pêrabû.

Biran (birhan): j.tên.vi. Kes ji wan neman. **To perish**. **يَفنى، يَهلَك**
Malbat a Gêncoyî biran kes jê neman.
_ : n.j. verbal noun. **Perishable.** **فَناء، هَلاك**
Ne mixabin bo biran a milet ên zimanê xu ne paraztin.

Birandin(birhandin): j.tê.vt. Kes ji wan nehêlan. **To perish.** يُهلِك
Êşa giran malbat a Gêncoyî birandin.
_ : n.j. verbal noun. **Perishable.** فناء، هَلاكْ
Birandin a malbatê bi êşa giran bû, berî sed sala.

Birajtin : j.tê. vt. Goşt danan ser agirî bo xuarinê. **To roast.** يَشْوي
Bilindî goşt birajt li seyranê bo mêhvanan şembî ya borî.
_ : n.j. verbal noun. **Roasting**. شَواء، شَيْ
Birajtin a goştî li seyranê bo mêhvanan serferazî ye.

Biserêkveînan:j.tê.vt. Pêkînan,pêkanîn. **To complete.** أكمَل، أتَمَّ
Me karê malê biserêkveîna.
_ :n.j.Verbal noun. **Completion.** إكما ل ، إتما م
Biserêkveînan a karê malê, em tenakirin.

Bînîn : j.tê. vt. Dîtin. **To see**. يَرى ،يُبصِر
Min Hejar bînî li mûzexanê şeva/dî/din.
_ : n.j. verbal noun. **seeing**. إراءة، إبصا ر، رُؤية
Bînîn a deybaban her roj pêdivê ye.

Bîrhatin : j.tê. vt.Bîranîn,jibîrnekirin.**To remind of**. يَتَذ كَّرُ
Bîr a komeleyê hat xanîyekê avabikin bo jîn a mirov ên pîr .
_ : n.j. verbal noun. **Reminding.** تَذ َكُّرْ
Bîrhatin ên mêranî ya pêşmergeyan dilî geşdikin.

Borandin: j.t.vt. **1**.Derbazkirin. **To pass.** يَمُرِّر
2. To spend a time. يَقضِّي وَقتاً
1.Min bar di gelî ra borand.
2.Me demek xoş borand pêkve
_ :n.j.verbal noun. 1.**Passing.** مَرْ، مرور .
2.Spending a time.قضاء وقت
1.Borandin a barî di gelî ra bo hêstirê xoşbû.
2.Borandin a demekî xoş pêkve bo me hilkevtbû.

Borîn: j.tên.vi. **1**.Derbazbûn. **To pass.** يَمُرُّ
2. To spend a time. يَقضي وَقتاً
1.Şermîn û birayê xu borîn di gelî ra**.**
2.Rûniştin a me xoşbû,me nizanî çewa dem borî**.**

_ :n.j.verbal noun. 1. **Passing.** مرور ،مَرّ **. Spending a time.** قضاء وَقتٍ
1.Borîn di gelî ra li Şermîn û birayê wê xoşhat
2.Em bi dem borînê ne hesayin di rûniştinê de.

Bûn: j.tên.vi. **1**.Çêbûn. **To be.** يَكونُ **2. To become.** يَصبَحُ .
3. To be born. يَلِدُ
1.Bijar noşdar **e**. Şivan dartaş **bû**. Ez parêzer **im**. Em baş **in**.
2.Bijar **bû** noşdar. Şivan dê **be** dartaş. Ez dê **bim** parêzer.
3.Gulê kiçek **bû.** Mehînê du canî **bûn**. Bizin dê kharekê/**be**.
_ :n.j.verbal noun. 1. **Being.**كائن . **2. Becoming.** صَيرورة
3.Birth. ولادة
1.2.Bûn a Bijarî noşdarekî gelek baş serkevtin bû.
3.Bi bûn a kharikî guhan ên bizinê şîr hatinê.

C

Cemisandin: j.tê.vt. Di nav rûnî da sorkir. **To fry.** **يُقَلِّي**
Jin a min car hêk cemisandin bo têşt a îro.
_ : n.j. verbal noun. **Frying.** **قلي**
Cemisandin a hêkan bo têştê hî ye.(adete)

Cengkirin: j.tê.vt. Şerkirin, pêkdadan a biçekan. **To fight. To war against.** **يُحارِبُ، يُقاتِل**
Îraqê û îranê heşt sala cengkirin.
_ : n.j. verbal noun. **Fighting.** **حَرب، قِتا ل**
Çengkirin a cîhanê ya duê,sal a 1945-ê bi dawî hat.

Cudabûn : j.tên. vi. Jêkvebûn, Ji hev dûrkevtin. **To separate.تَفَرَّقوا**
Bira yê Behzadî ji wî cudabû par.
_ : n.j. verbal noun. **Separation.** **اِنفِصال، فِراق**
Cudabûn a bab û zaro yan hî ye li hemû cîhanê.

Cudakirin : j.tê.vt. Jêkvekirin, Ji hev dûrkirin. **To separate.** **يُفَرِّقُ**
Bira yê Sûlavê xu di malê de cudakir.
_ : n.j. verbal noun. **Separation.** **تَفريق**
Cudakirin a birayan çêbû‹ berî lêkvekirin a paşmayî.

Cûtin:j.tê.vt. Bi didanan givajtin, bi didanan hêran. **To chew, To masticate.** **يَعلِكُ، يَمضغ**
Hin kes piştî xuarinê benîştî dicûn.
_ : n.j. verbal noun. **Chewing, mastication.** **مَضْغ**
Cûtin a benîştî piştî xuarinê hî ye li Ewruppa.
Cûtin a parû yî divê 32 caran be.

Colan : j.tên. vi. Livîn. **To move**. يَتَحَرَّك
Li kombûna gelek ne cole(live)! Kirête.
_ : n.j. verbal noun. **moving.** حَرَكه، تَحَرُّك
Colan a pezî li kûzan bo çerê ye.

Colandin : j.tê. vt. livandin. **To move**. يُحَرِّكُ
Daykê landik coland da zaro biniv/e/it.
_ : n.j. verbal noun. **Moving, movment**. حَرَكه
Colandin a landikê bo zaro nivandinê ye.

Cotkirin : j.tê.vt. **1**.Kêlan a zevyan. **To plough**.يَحرُثُ
2. Bikî cot. **To double**. يُثَنّي
Azadî hemû zevî cotkirin.
Zaro hatin cotkirin di rêzbûnê de.
_ : n.j. verbal noun. 1.**Ploughing.** حِراثه **2**.**Double**. تَثنيه
Cotkirin a zevyan havînan gelek baş e bo çandinê.
Cotkirin a hespan bo erebane kêşanê hî ye(adete).

Ç

Çakbûn: j.tên.vi. Başbûn, Saxbûn. **To recover**, **to get well**. **يَشفى**
Avdel çak e ne nesax e. Avdel çakbû ji nesaxî yê.
_ : n.j. verbal noun**. Recovery**. **شِفاءُ**
Çakbûn a Avdelî ji nesaxî yê gelek bilez bû.

Çakkirin : j.tê. vt. Başkirin,saxkirin. **To recover**. **يُشفي**
Dr. Bijarî nesaxek saxkir bi dermanan.
_ : n.j. verbal noun. **Recovery. شِفاء**
Çakkirin a nesaxî dilê hevalê wî xoşkir.

Çandin : j.tê. vt. Riwandin, şînkirin**. To plant, to grow**. **يَزرَعُ**
Azadî nemamek çand,derçû gêlas.
_ : n.j. verbal noun. **Planting, growing. زراعه**
Çandin a derametî roj a newrozê despêdike,li kurdistanê.

Çapkirin : j.tê.vt. Nivîsîn bi çapê. **To print**. **يَطبَعُ**
Zaxoyî pirtûk a rêziman a kurdî çapkir sal a 1998-ê li Dihokê.
_ : n.j. verbal noun. **Printing. طَبعْ، طِباعه**
Çapkirin a pirtûkan dirav divê.

Çareserbûn:j.tên.vi. Derman wergirtin, Saxbûn. **To treat. يَتَعا لَج.**
Êşa nesaxî çareserbû.
_ : n.j. verbal noun. **Treatment. عِلاجْ**
Çareserbûn a nesaxî, Dr. azad pê rabû.

Çareserkirin : j.tê.vt. Derman danê, Saxkirin. **To treat. يُعالِجُ**
Dr. Azadî nesax çareserkir duhî.
_ : n.j. verbal noun. **treatment. مُعالَجه**
Çareserkirin a nesaxî Dr. Azad pêrabû.

Çavbestin : j.tê.vt. 1.çavgirêdan. **to wrap the eyes. يُغطي العَينْ**
2.Tênegehiştin. **Do not realize. لا يَفهَمُ**
1.Zaro di hin yarîyan de çavan dibestin.
2.Çavbestin a hinkesan ji nezanînê ye.
_ : n.j. verbal noun. **1. Eye,s wrap. غطاء العَين**
2.Not realizing. عَديمُ الفهم
1.Yarîya çavbestinê li seyranan dihê kirin.
2.Ne hemû mirov çavbestî ne.

Çavdêrîkirin: j.tê.vt. Guhdan, seqbêrîkirin. **To care,to keep. يَعتَني**
Dayk pitir ji babê çavdêrî yê dike li mindalan.
_ :n.j. verbal noun. **Care, keeping. رعايه، عِنايه**
Çavdêrîkirin a mindalan karê dêbabane.

Çavêşan : j.tê.vt.Çavkulî. **Eye pain, تَوَجع العيون**
Gava çav ên te êşan,nîşa noşdar ê çavan bide!
_ : n.j. verbal noun. **Eye pain. وَجَع العُيون**
Çavêşan a mindalan havînan zore.

Çavgêran: j.tê.vt. Lêgeran, lêkolîn. **To seek, to look for. يُفتِّشُ، يَبحَثُ**
Min çavgêran, min Gulê ne dît Li seyranê.
_ : n.j. verbal noun. **Seeking, looking for. تَفتيش، بَحث**
Çavgêran a gundîyan bo mehîn a bezirbûyî sernegirt.

Çavkizbûn : j.tên.vi. Kêm dîtin. **Eyes to be weaken. يُضعِفُ النَّظر**
Çavkizîyê ez ji xuandin û nivîsînê kirim.
_ : n.j. verbal noun. **Eyes weakening. ضُعفُ النَّظر**
Çavkizbûnê ez ji karkirinê /êxistim/kirim û xîzankirim.

Çavkizkirin : j.tê.vt. Hêla kêm bibîne. **To weaken the eyes. يُضعِفُ النَّظر**
Ronahîya kêm çav ên min kizkirin.
_ : n.j. verbal noun. **Eyes weakening. ضُعفُ النّظر**
Çavkizkirin a min ji ronahî ya kêm çêbû.

Çavkulbûn : j.tên.vi. çavêşan. **To feel eye pain. Eye sickness تَوَجُّعُ العُيون**
Havînan çav ên zarokan kuldibin.
_ : n.j. verbal noun. **Eye pain. وَجَعُ العُيون**
Çavkulbûn a kurikan pitir e ji ya keçikan.

Çavkildan : j.tê.vt. Kil kire çavan. **To paint eyelids with kohl. يُكَحِّلُ العُيون**
Narînê bisik badan û çavkildan û şahî kir.
_ : n.j. verbal noun. **Painting eyelids with kohl. تَكحيلُ العُيون**
Çavkildan çavan diparêzin û geşdikin.

Çavlêkirin : j.tê.vt. Zerzerkî wî vekir. **To imitate. يُقَلِّدُ**
Azadî herroj werziş dikir,kurê wî jî çavlêkir.
_ : n.j. verbal noun. **Imitation. تَقليد**
Çavlêkirinê Diyar kir yarîkerek baş.

Çavlirêbûn : j.tên.vi. Ma lihîvîyê. **To wait. يَنتَظِرُ**
Zava çavlirêya bûkê bû, ji xoşîya distirî.
_ : n.j. verbal noun. **Waiting for. اِنتِظار**
Çavlirêbûn a zavayî bo bûkê xoşî bû bo wî.

Çavlirêkirin : j.tê.vt. Li hîvîyê rawestan.**To wait. يَنتَظِرُ**
Qubad berdan ji zîndanê, Diya wî çavlirêya wî kir.
_ : n.j. verbal noun. **Waiting. اِنتِظار**
Çavlirêkirin a zîndanî yên dihên berdan, xoşe.

Çavneqandin: j.tê.vt. Lêborîn, **To forgive, to over look. يَتَسامَحُ**
Nazê şaşîyek mezin ligel Zînê kir;lê Zînê çavneqandin.
_ : n.j. verbal noun. **Over looking, Forgiving. تَسامح**
Çavneqandin a Zînê bo şaşî ya Nazê karek baş bû.

Çavpêkevtin: j.tê.vt. Hev dîtin, Gehiştin hev. **To face, to meet with. يُلاقي،يُواجه**
Serok ê Herêmê çavpêkevtinek ligel parêzeran çêkir.
_ : n.j.verbal noun. **Facing, meeting with. مُواجَهه، لقاء**
Çavpêkevtin a serokî ligel parêzeran,giring bû.

Çavsorbûn : j.tên.vi. Têkçon, dilman. **to be angry. يَغضَبُ**
Gava min bihîstî,ku gurgî berx ê min kuşt,çavliminsorbûn
_ : n.j.verbal noun. **Anger. غَضَبْ**
Cavsorbûnê Lezgîn girt,dema deyka wî mirî.

Çavsorkirin : j.tê.vt.Hat têkçon,dilê wî ma.**To anger**. يُغضِبُ
Mirin a deyk a Lezgînî çavlêsorkirin.
_ : n.j verbal noun. **Anger. غَضَبْ**
Çavsorkirinê çav li Besê tarîkirin.

Çavşorbûn : j.tên.vi.Şermê girt.**To be ashamed of. يَخجَلُ**
Arî çavlêşorbûn,dema deyka wî şûkirî.
_ : n.j.verbal noun. **Shame. خَجَلْ**
Çavşorbûnê Arî girt,dema deyk a wî şûkirî.

Çavşorkirin : j.tê.vt. Dan şermê. **To shame. يُخَجِّلُ**
Qazê jiber dîtin a babkuştîyê xu çavşorkirin.
_ : n.j.verbal noun. **Shame. خَجَلْ**
Çavşorkirinê hêla Nazê gundî bihêl/e/it.

Çavvebûn : j.tên.vi. Têgehiştin. **To understand. يَفهَمُ**
Lawê min! çavvedibin bi xuandinê û geranê!
_ : n.j.verbal noun. **Understanding. فَهمْ**
Çavvebûn a baş ewe tu gelek bixuînî û bigerî.

Çavvekirin : j.tê.vt. Hişyarkirin. **To pay attention to. يَنتَبهُ**
Dema ez gehiştîme Swêdê,min çavvekirin bo sûd wergirtinê
_ : n.j.verbal noun. **Attention. إنتِباه**
Çavvekirinê hêla ez gelek tişta fêrbim.

Çavxurandin : j.tê.vt. hizirkirin, **To think. يَفكِّرُ**
Dema te dît mirovek çavandixurîne,bizane wê hizrekê dike.
_ : n.j.verbal noun. **Think, thinking. تَفكير**
Çavxurandin nîşana jîrîyê ye.

Çeman : j.tên.vi. xuehirkirin. **To bend, to bow.يَنحَني**
Gulê xu çemand da pênosî rakit.
_ : n.j.verba noun. **Bending, bowing. إنحِناء، حَني**
Çeman a werzişî bo piştê başe.

Çemandin : j.tê.vt. Xu xuehirkirin.**Tobend, to bow. يَلوي، يَحني**
Nazê xu çemand da malê bimal/e/it.
_ : n.j.verba noun. **bending, bowing. إنحِناء، لَوي**
Bi çemandin a berdewam pişt diêşe.

Çepllelêdan:j.tê.vt. Destqutan. **To aplaud, to clap hands. يُصَفِّقُ**
Şagirdan çepllelêdan bo fêrkerê xu.
_ : n.j.verbal noun.**Aplause,clapping the hands.تَصفيق**
Çepllelêdan bo handanê, karek başe.

Çeqan : j.tên.vi. Jêstandin. **To take by trick. يَأخُذُ بالحيلة** .
Gulê! Çend dirav ji te hatin çeqan? Pênc dînar.
_ :n.j.verbal noun. **Taking by trick. أخذ بالحيله** .
Çeqan a diravî karek ne başe,xu jê dûrbiêxin

Çeqandin : j.tê.vt. Jêstandin a bi fêl. **To take. يَأخُذُ غدراً، يَستَحوذُ على**
Aram te çend dînar ji Gulê çeqandin?
_ : n.j.verbal noun. **Take. أخذ، إستِحواذٌ**
Çeqandin a diravî ji jinik ên gundî karek ne camêrane ye.

Çerîn : j.tên.vi. Lewerîn. **To pasture, to graze. يَرعى، يَسرَحُ**
Pezê me çerî(çêrî)li koz a gundî.
_ : n.j.verbal nou. **Pasturing, grazing. رَعي**
Çerîn a pezî şivan pê radib/e/it.

Çerandin : j. Tê.vt. Lewerandin. **To pasture to graze. يَرعى**
Şivanî pez çerand li koz a gundî.
_ : n.j.verbal noun. **Pasturing,grazing. رَعي**
Çerandin a pezî li kozan baştire ji çerandinê li zevyan.

Çerxkirin :j.tê.vi. Hulîkirin, **To polish. يَصقُلُ**
Dartaşî pêpk ên mêzê çerixkirin.
_ : n.j.verbal noun. **Polishing. صَقلٌ**
Çerxkirin a pêpk ên mêzê biha yê wê bilindkir.

Çespandin:j.tê.vt. **1**.Pêvenan.pêvehêlan. **To cohere. يَلتَصِقُ**
2.Di erdê da Qutan. **To be or become stationary. يُثَبِّتُ**
1.Sînemê pol bi nameyê ve çespand.
2.Sing di qurê ra hat çespandin.
_ :n.j.verbal noun. 1.**Coherence.ألتِصا ق** **2.Stationary. ثا بت**
1.Çespandin a polî name da hinartin.
2.Bi çespandin a singî,hêstir pêve hat girêdan.

Çewirkirin : J.tê.vt. Rûn lê dan. **To oil. يُدهِنُ**
Min kêlon çewirkir da jeng ne girit.
_ : n.j.verbalnoun. **Oiling. تَدهين**
Çewirkirin a kêlonan ji ber jengê bû.

Çêbûn : j.tên.vi. **1**.Sazbûn. **To make.** يَصنَعُ. **2**.bûn. **To be.** يَصيرُ
1.Nan çêbû û mêhvan hatin.
2.xanî çêbû berî zivistanê.
_ : n.j.verbalnoun. **1. making.** صُنْعْ. **2. Being.** صَيرورِه
1.Çêbûn a nanî,berî hatin a mêhvanan serferazî bû.
2.Çêbûn a xanî ‹berî hatin a zivistanê gelek xoş bû.

Çêkirin : j.tê.vt. Duristkirin, pêkînan, sazkirin. **To make.** يُصنِّعُ
Me keprek çêkir li ser banî.
_ : n.j.verbal noun. **Making.** صُنْعْ
Çêkirin a doşavê rezvan pê rabû.

Çikbûn:j.tên.vi. **1**.Hişikbûn. **To become dry.** يَجُفُّ
2.Amadebûn. **To be ready.** يَستَعِدُّ
1.Av a celalê hoza çikbû.
2.Ez çikim bo wexerê.
_ : n.j.verbal noun. 1.**Dryness.** جفاف **2**.**readiness.** إستِعداد
1.Çikbûn a celalî ji ne barîna baranê bû.
2.Çikbûn a min bo wexerê da dilê hevalê xu xoşkim.

Çikkirin : j.tê.vt. Hişkirin, bê avkirin. **To dry.** يُيَبِّسُ، يُجفِّفُ
Me celal çikkir da em pirekê çêkin.
_ : n.j.verbal noun. **dryness.** تَيَبُسْ، جَفا ف
Çikkirin a celalî ji ber çêkirin a pirê bû.

Çikilîn : j.tê.vt. Xu girtin di erdê de. **To stick into.** يَغرُزُ
Hêstir bi singê çikilî ve hat girêdan.
_ : n.j.verbal noun. **Stick.** غرزْ
Çikilîn a singî di erdê de bi qutanê çêbû.

Çikilandin : j.tê.vt. Kirin di erdê de. **To stick into, to drive.** يُدخِلُ
Me sê sing çikilandin bo girêdan a hêstiran.
_ : n.j.verbal noun. **stick.** غرَّزَ، شكَّ
Çiklandin a singan mindal pê rabûn.

Çinîn:j.tê.vt. **1**.Jêvekirin. **To Pick.** يَقطُفُ.
2.Raçandin, tevin**. To spin.** يَنسُجُ
1. Me sêv çinîn bo firotinê duhî êvarî.
2.Perîşanê berrikek çinî bi heftîyekê.

_ : n.j.verbal noun. 1. **Picking. قطف.** **2.Spin. نَسج.**
1. Çinîn a sêvan, jinik pê rabûn, duhî êvarî.
2. Çinîn a berrikê, Perîşan pê rabû.

Çirisîn : j.tên.vi. Teyisîn. **To shine. يَلمَعُ**
Şevekê ez gehiştim nihal a gundî,min dît tiştek di çirise, ez çûm nikve, pelek agirî bû hemma têhin têda mabû.
_ : n.j.verbal noun. **Shining. لَمَعا نْ**
Çirisîn a agirî bi şevan dilê rêvingan xoşdik/e/it.

Çirmisîn : j.tên.vi. qurmiçîn.**To wilt. يَذوي، يَذبُلُ**
Kulîlk çirmisîn di guldanan de,çiku man bê av.
_ : n.j.verbal noun. **Wilting. ذَوي، ذبول**
Çirmisîn a kulîlk ên guldanan ji bê avîyê ye.

Çirmisandin : j.tê,vt. Qurmiçandin. **To wilt. يُذوي، يُذبل**
Kejê destikê nêrgizan çirmisand ji bê avî.
_ : n.j.verbal noun. **Wilting. ذَوي، ذبول**
Çirmisandin a kulîlk û gulan ji bê avî ye.

Çixandin : j.tê.vt. Paşvebirn, **To insult. يّهينُ، يُذِلُّ**
Kurê min hişyar be kesê ne çixîne!
_ : n.j.verbal noun. **Insult. اِهانه، اِذلال**
Çixandin a mirovan karek ne camêrane ye.

Çîzbûn : j.tên.vi. Revî di berêkaneyê de. **To lose. يَخسَرُ**
Kewê min çîzbû di berêkaneyekê de ligel kewek sorik.
_ : n.j.verbal noun. **Loss. خُسران، خَساره**
Çîzbûn a kewê min, ez gêjkirim.

Çîzkirin : j.tê.vt. Hat revandin. **To lose. يُخَسِّر**
Kewê sorik kewê min çîzkir. Sed mixabin.
_ : n.j.verbal noun. **Loss. خَساره**
Çîzkirin a kewê min dilê min ji kewgîrîyê sarkir.

Çokşkestin: j.tê.vt. Ma bê omêd(hîvî). **To lose resolution. يَفقُدُ العَزيمه**
Rêvingî çoklêşkestin dema babê wî mirî.
_ : n.j.verbal noun. **Losing resolution. فقدُ العَزيمه**
Çokşkestin a rêvingî bi mirn a babê wî lê diyarbû.

Çolbûn : j.tên.vi. Valabûn. **To empty, to void.** يَفرُغ، يَخلو
Bi çûn a zarokan bo Hewlêrê,mal çolbû.
_ : n.j.verbal noun. **Empty, voidness.** فَراغ، خِلوّ
Çolbûn a malê bi çûn a zarokan diyare.

Çolkirin : j.tê.vt. Valekirin. **To void**. يُفَرِّغ، يُخلي
Gundîyan gund ê Bêzih ê çolkir ji ber bombordimanê.
_ : n.j.verba noun. **Voidness.** فَراغ، خُلوّ
Çolkirin a gund ê Bêzihê sal a 1988-ê bû.

Çûn: j.tên.vi. Cih guhorîn, Royîn.**To go**. يَمشي، يَذهَبُ
Nazê çû bo seradan a malbatê li Ermiştê pêr.
_ :n.j.verbal noun**. Going.** مَشي، ذِها ب
Çûn a Nazê bo seradan a malbatê gelek nekêşa.

D

Dabestin:j.tê.vt. Girêdan bo qelewkirinê. **To make fat.** يُسَمِّنُ
Şemalî berxê xu dabest, bo firotinê.
_ : n.j.verbal noun. **Fattening.** تَسمين
Dabestin a berxan hîye (adete)li kurdistanê.

Dabe**ş**bûn:j.tên.vi. Beşbûn. **To divide.** يُقسِمُ
Heval dabeşbûn li ser partîyan.
_ : n.j.verbal noun. **Dividing .** اِنقِسام، قِسمه
Dabeşbûn a hevalan li ser partîyan karek başbû.

Dabe**ş**kirin : j.tê.vt. Beşkirin, lêkvekirin.**To divide.** يُقسِّمُ
Qazanc hat dabeşkirin li ser endaman serê salê.
_ : n.j.verbal noun.**Dividing.** تَقسيم
Dabeşkirin a qazancî li ser endaman her sal e.

Dabezandin : j.tê vt. Anîn xar (Ji Hespî). **To get down.** يُنَزِّلُ، يُرَجِّلُ
Hevalî kurê xu dabezand ji kerê asinî.
_ : n.j.verbal noun. **getting down.** تنزيل، تَرجيل
Dabezandin a zarokan، yarmetî dane(harîkarîye)bo wan.

Dabezîn : j.tên.vi. Hatin xar (ji hespî). **To get down.** يَتَرَجَّلُ، يَنزَلُ
Kurê hevalî dabezî ji kerê asinî.
_ : n.j.verbal noun. **Getting down.** تَرَجُّل، نزول
Dabezîn ji hespan bo bêhin vedanê bû.

Dabirîn : j.tên.vi. Vebirîn, parçeyek da alekê. **To isolet.**يَفرُزُ
Xanê alek xanîyê xu dabirî bo hejarekê.
_ : n.j.verbal noun. **isolation.** فرز
Dabirîn a xanî ji layê Xanê ve karek mirovatî bû.

Dabirandin :j.tê vt. Vebirandin. **To isolet. يُفرزْ**
Viyanê nîvek xanîyê xu dabirand bo kurê xu.
_ : n.j.verbal nou. **Isolation. إفرا ز**
Dabirandin a nîvek xanî ji neçarî bû.

Dabînbûn : j.tên.vi. Arambûn. **To calm down.يَهدَوَ**
Heker zaro dûrkevt ji deyk a xu,dabînnabe.
_ : n.j.verbal noun. **Calm. هِدوء**
Dabînbûn a brîndaran bi penckirinê çêdibe.

Dabînkirin : j.tê.vt. Aramkirin. **To calm. يُهَدِّوَ** .
Dayk dişên zarokan dabînbikin.
_ : n.j.verbal noun. **Calm. تَهدِئه**
Dabînkirin a zarok ên nesax noşdar dikin.

Daçeqandin : j.tê vt. **1**. Têrakirin**. to stick. يَغرُزْ**
2.Jêstandin. **To overcome. يَستَحوذُ على**
1.Pînedozî dirêşk daçeqand çermî bo dirûnê.
2. Fêlbazekê deh dinar ji min daçeqandin vê êvarê.
_ :n.j.verbal noun. 1.**Stick. غرز 2. overcoming. اِستِحواذ .**
1.Daçeqandin a dirêşkê di çermî ra bo dirûnê bû.
2.Daçeqandin a deh dînaran ji min duhî êvarî bû.

Daçeqîn : j.tên.vi. 1.Têra çûn. **To stick. يَغرُزُ في**
Derzî daçeqî di balîfê ra.
Gilç daçeqî di qurê ra.
Dirêjk daçeqî di çermî ra.
_ : n.j.verbal noun. 1. **Stick. غرز**
Daçeqîn a derzîyê di balîfê ra ji bêdestîyê bû.
Daçeqîn a gilçî di qurê ra Alan pêrabû.

Dadan:j.tê vt. **1**.Da karî. **To oparate. يُشَغِّل**
2.hatin xar. **To land, To descent. يَهبُط، يَنزلُ**.
1.Azadî otombîl a nû dada, pê çû gundî.
2.Kotrê dada ser hêlîn a xu. Firokê dada firokgehê haiha.
_ :n.j.verbal noun.1.**Operating.تَشغيل** . **2.Descent. هِبوط ، نِزول**
1.Dadan a otombîlê asantire ji ya firokê.
2.Dadan a firokê li firokgehê، berî deh çuk a(deqîqe ya)bû.

Dadkirin : j.Tê vt. Muhakemekirin. **To judge.** يُحاكِمُ.
Sêşembê diz birin bo dadkirinê li dadgeha Dihokê.
_ : n.j.verbal noun. **Judgement.** حُكْم.
Dadkirin a dizî hat kirin li dadgeh a Dihokê.

Daêxistin : j.tê vt. Girtin bi kilîlê. **To close, to shut.** يَغْلُقُ.
Zinar kurê min‹ dergehî daêxin, diz zehfin van rojan!
_ : n.j.verbal noun. **Close.** غَلِقْ.
Daêxistin a dergehan bi şevê pêdivê ye.

Dahatin : j.tê.vt. 1.Nizim bû, dakevt. **To come down.** يَهبُطُ، يَنقُصُ,
2.Verêjtin. **To accrue (to).** يَنتجُ عَن , يَردُ دَخلاً
1.Av a celalê gundî dahat,ji bê baranî.
2.Çend bû dahat a gundî ji genimî îsal.
_ : n.j.verbal noun. 1.**coming down.** هِبوطْ، نَقِص
2.income. ئيراد،دَخِل.
1.Dahatin a celalê gundî ji kêm baranî bû.
2.Dahatin a dever a dihokê ji genimî îsal baştir bû ji par.

Dahêlan : j.tê.vt.şorkirin.**To lower,to bring down.** يُدَندِلُ.
Xanê dewlik dahêla bîr a avê,bo av hilkêşanê.
_ : n.j.verbal noun.**Lowering.** اِنزال، دَندَلة.
Dahêlan a dewlikê bo av hilkêşanê ji bîrê Xanê pê rabû.

Dakirin : j.tê.vt. **1**.veşartin. **To hide.** يَكتُمُ، يُخفي
2.Kirin jor. **To enter.** يُدخِلُ
1.Xunavê kulên xu dakirin.
2.Şermînê pez dakir govê.
_ : n.j.verbal noun. **1.Hiding.** اِخفاء **2.Bringing in.** اِدخال.
1.Dakirin a kul û kovanan ne sanahî ye.
2.dakirin a bezî di govê de karê şivanî ye.

Dagirtin : j.tê vt. Tijîkirin. **To fill.** يَملؤُ.
Gulê kedûn û gozik dagirtin bi avê û birin ser banî.
_ : n.j.verbal noun. **Filling.** مَلئ.
Dagirtin a kedûn û gozikan karê jinikan e.

Dagîrkirin : j.tê.vt. Standin. **To occupy.** يَحتَلُّ.
Pêşmergeyan kerkûk dagîrkir sal a 1991-ê.
_ : n.j.verbal noun.**Occupation.** اِحتِلا ل.
Dagîrkirin a kerkûkê sal a 1991-ê bû.

Daketin(dakevtin): j.tê.vt. Dahatin. **To drop, to go down.** يَنقُصُ، يَنخَفِضُ.
Av a celalê hoza daket havînê.
_ : n.j.verba noun. **Dropping.** نَقص، اِنخِفاض .
Daketin a celalan havînê çêdibe.

Daleqandin : j.tê.vt. Hilawîstin. **To hang.** يُعَلِّقُ .
Kejê meşk bi stûnê ve daleqand.
_ : n.j.verbal noun. **Hanging.** تَعليق .
Daleqandin a ristên bamîyan bidîwaran ve Kewê pê rabû.

Damezran : j.tên.vi. Cihgirtin. **To stay at.** يَسكُنُ، يَثبُتُ، يُقيمُ .
Koçer li warên kevin damezran îsal.
_ : n.j.verbal noun. **Stay.** اِسكان ، اِقامه .
Damezran a koçeran li warên kevin hîbûn e.

Damezrandin:j.tê.vt. Danan. **To establish.** يُنشِئُ ، يُسكِنُ
Me rezek damezrand li zevî ya rex gundî.
_ :n.j.verbal noun. **stay.** اِسكان، اِنشاء
Damezrandin a rezî li zevî ya rex gundî karek başbû.

Dan : j.tê.vt. **1**.Bexşîn. **To give, to grant.** يُعطي
2.Çêkir. **To creat.** يَخلُقُ
1.Min nan û pênîr(penîr) da şivanî.
2.Xudê Adem da ji axê. Xudê erd û esman danan.
_ : n.j.verbal noun. 1.**Giving,granting.** عَطاء .**2.Creation.** خَلقْ
1.Dan a xuarinê bo mêhvanan pêdivêye.
2.Dan a Xudê rê lê nahê girtin.

Danan: j.tê.vt. **1**.Xist ser erdê. **To put.** يَضَعُ
2.çêkir. damezrand. **To establish.** يُنشِئُ , يُؤَسِّسُ
1.Nazê guldan dana ser mêzê.
2. Semyanî rezek tirî dana li pal a girî.
_ :n.j.verbal noun.**1. put.** وَضعْ . **Establishing.**اِنشاء ، تَأسيس .
1.Danan a guldanan li ser mêzan karê jinikan e.
2.Danan a rezan karê rezvan ên şehreza ne.

Danîştin : j.tê.vt.Rûniştin.**To sit down.** يَجلِسُ .
Ez daniştim ser doşkî bo bêhin vekirinê.
_ :n.j.verbal noun. **Sitting down**. جلوس.
Daniştin a ser doşkan xoşe.

Danpêînan(Danpiyanan): j.tê.vt. Selmandin, Gotin erê. **To confess.** **يَعترِف**
Gulê şaşîyek kir û danpêîna.
_ : n.j.Verbal noun. **Confession.** **إِعتراف**
Danpêînan a Gulê bi şaşîyê ,karek baş bû.

Danûstandin: j.tê.vt. Boçon ên cuda, Peyivîn. **To argue (with).** **يُناقِشُ**
Du kesa danûstandin kir li ser krîn û firotinê.
_ :n.j.verbal noun. **Argument.** **مُناقشه**.
Dan û standin a me li ser çandinê ser ne girt.

Dapo**ş**în : j.tê.vt. Nixavtin. **To cover.** **يُغطي**.
Me nemam dapoşîn da çûçik ne xun.
_ :n.j.verbal noun. **Covering.** **تَغطيه**.
Dapoşîn a nemaman karek baş bû me kirî.

Dardan : j. tê.vt. **1**.Pîvan. **To measure.** **يَقيسُ**
2.dagirtin. **To fill.** **يَملؤُ**
1,2. Me fitre dardan da Şermizar ne bin.
_ :n.j.verbal noun. 1**.Measuring.** **قِيا س** **2.Filling.** **ملئٌ** .
1,2. Dardan a fitran em serferaz kirin.

Daûran(dauîran):j.tê.vt, Qûtdan. **To swallow.** **يَبلَعُ**.
Segvanî libek kezwanê daûra(dauîra).
_ : n.j.verbal noun. **Swallow.** **بَلعْ**.
Daûran a tebelê bivveye, xu jê dûrkin zarokîno

Dawe**ş**an : j.tên.vi. Berbûn. **To fall down.** **يَتَساقط** .
Sêv ên îsal hemî daweşan,çu bi daran ve neman.
_ : n.j.verbal noun. **Falling down.** **سِقوط، تَساقُط** .
Daweşan a sêvan ji hurre bayî bû.

Dawe**ş**andin:j.tê.vt. Werandin. **To fall down.** **يُسقِط ، يُوَقّعُ** .
Me sêv daweşandin bo firotinê.
_ :n.j.verbal noun. **Falling down.** **إِسقاط** .
Daweşandin a sêvan bo firotinê bû.

Daxdan : j.tê.vt. Agir pêvenan. **To burn.** يَكوي بالنار .
Narînê ne şiya kiç a xu daxbide.
_ : n.j.verbal noun. **Burning.** كَويٌ ، حَرَقٌ
Daxdan a zarokan ne karek başe,çuca wenekin.

Daxuazkirin: j.tê.vt. xuaztin.**To invite.** يَدعوا
Salarî em daxuazkirin bo dawet a xu par.
_ : n.j.verbal noun.**Invitation.** دعوه ، طلب
Daxuazkirin a me bo dawetê ji hejêkirinê bû.

Dazanîn : j.tê.vt. Bo cemawerî diyarkir. **To declare.** يُعلِنُ
Cotyarî dazanîn, ku dê serê heyvê jin a xu guhêzit.
_ : n.j.verbal noun. **Declaration**. إعلا ن
Dazanîn a Cotyarî bo guhaztin a jinê dilê me geşkir.

Dehmengirtin:j.tê.vt. Hîvîkirin, **To entreat.** يَتوَسَّلُ
Merdanî sed dînar dan Arî bidestgirtin dema dehmenlêgirtî.
_ :n.j.verbal noun: **Entreaty.** تَوَسُّلْ
Dehmengirtin a Merdanî dilê wî nerimkir bo destgirtin a Arî.

Deqisîn : j.tên.vi.Biçûkbûn,Lawazbûn.**To lessen.** يَصغُرُ، يَنحَلُ
Se yê min wê deqisî,ez nizanim boçî.
_ : n.j.verbal noun. **Smallness. weakness**. صِغر، نِحول
Deqisîn a se yî ji êşê bû.

Deqisandin : j.tê.vt. Lawazkirin. **To lessen.** يُضعِفُ
Çima we se yê min deqisand ji birsan? Ma giranî ye?
_ : n.j.verbal noun. **Weakness.** ضُعُفْ
Deqisandin a seyî ji birsan bû.

Dengdan: j.tê.vt. Bijartin, Dengê xu bexşîn. **To vote.** يُصَوِّتُ يَقتَرِحُ
Di helbijartinê de,ez çûm bo dengdanê.
_ : n.j.verbal noun. **Voting.** تَصويت، اِقتِراح .
Dengdan a kurdan di helbijartinê de cihê şanazîyê bû.

Dengvedan : j.tê.vt. Dengbihîstin. **To echo.** يُرَدِّدُ
Li nihal a gundî Gulê stiranek got nihalê dengveda.
_ : n.j.verbal noun. **Echo.** تَرديد، صَدى .
Dengvedan a nihal a gundî zelale.

Derbazbûn : j.tên.vi. Diser ra çûn. Têperbûn. **To cross.**يَجتازُ، يَعبُرُ
Nazê li celalî derbazbû.   Zînê li borrê rûbarî derbazbû.
_ : n.j.verbal noun.**crossing**. عُبور، اِجتِيا ز
Derbazbûn li borrê rûbaran sanahî ye.

Derbazkirin : j.tê.vt. Têperkirin, têra birin. **To cross.** يُعَبِّرُ
Şivanî pez li avê derbazkir.
_ : n.j.verbal noun. **Crossing.** عُبور .
Derbazkirina pezî katekê(saetekê)Kêşa.

Derbirrîn : j.tê.vt. Deranî ji dilê xu. **To make known.** يَكشِفُ، يَقِرُّ .
Şanazê derdê dilê xu derbirrî.
_ : n.j.verbal noun. **Making known.** كَشِف، اِقرار .
Derbirrîn a derdê dilî,mirovî tenadike ji ser gêjî yê.

Derbûn : j.tên.vi. Vebûn. **To open, To gush.** يَنفَتِحُ
Birîn derbû gelek khêm jêhat.
_ : n.j.verbal noun. **open, throwing out.** اِنفِتاح **.**
Derbûn a birînê cilên min pîskirin.

Derkirin:j.tê.vt. **1**.derxistin. **To throw out.** يَطرُدُ
2.Vekirin. **To open.** يَفتَحُ
1.Alanî du pale derkirin ji dirûn a genimî pêr.
2.**H**ekîmî qunêr a baskê Ri**h**anê derkir bi niştêrê.
_ :n.j.verbal noun. **Throwing out.** طرد . **Opening.** فَتح **.**
1.Derkirin a palan ji karî nanbirîn e.
2.Derkirin a birînê tenakirin a êşê ye.

Derhênan : j.tê.vt. Anînder,xak ji ser veda. **To take out.** يَستَخرِجُ
Gundîyekê komir ji nêzîk Şeranşê derhêna.
_ :n.j.verbal noun. **Taking out**. اِستِخراجْ .
Derhênan a komirî sûdekî mezin da Şeranşîyan.

Derizîn : jê.tên.vi. Kheliş în/ a hestîyan. **To be split.** يَنفَطِرُ .
Hestî yê diruîşî yê piyê Xanê derizî li kevtinê.Ban derizî ji serma.
_ : n.j.verbal noun. **Split.** ا نفِطارْ .
Derzîn a hestîyan ne wek şkestin a wan e.

Derizandin:j.tê.vt. Khelişandin/ a hestîyan. **To split.** **يُفطِّرُ** .
Min lingê Kewê derizand, bi givajtinê.
_ : n.j.verbal noun.**Split.** **إ نفِطار** .
Derizandin a hestîyan bi jan e.

Derînan :j.tê.vt. Derhênan. **To take out.** **يَستَخرِجُ** .
Gundîyan pênc barên komirê derînan ji kan a gundê Derginî.
_ : n.j.verbal noun. **Taking out.** **إستِخراج** .
Derînan a komirê ji kan a gundê Derginî asan e.

Derkevtin : j.tê.vt. Çûn bo derve. **To go out**. **يَخرُجُ** .
Serokê kombûnê ji kombûnê derkevt.
_ :n.j.verbal noun. **Going out.** **خُروجْ** .
Derkevtin a serokî ji kombûnê,kombûn Têkda.

Dermankirin:j.tê.vt. Kewandin, Tîmarkirin. **To treat.** **يُداوي** .
Noşdarî birîn a serbazî dermankir û girêda.
_ : n.j.verbal noun. **Treatment.** **تَداوي** .
Dermankirin a birînê noşdar pê rabû.

Dermalîkirin:j.tê.vt. Qelewkirin. **To fatten, To plump.** **يُسَمِّنُ**
Me pênc berx dermalîkirin bo qelyê.
_ :n.j.verbal noun. **Fattening, Plumping.** **تَسمين** .
Dermalîkirin a berxan wê bûyî hîbûn li Amêdîyê.

Destbiserdaînan:j.tê.vt. Dagîrkirin, bindestkirin. **To occupy, To take.** **يُسَيطِرُعلى، يَحتَلُّ**
Leşker ê hevpeymanan gehiştin mûsilê û destbiserdaînan .
_ :n.j.verbal noun. **Occupation, Take**
Destbiserdaînan a mûsilê gelek ne kêşa.

Destgirtin: j.tê.vt. **1**.Qerzdan. **To loan, to advance.** **يُسَلِّفُ، يُقرِضُ**
2.Zengînbûn.**To be or become rich.** **إغتنى، صا ر غَنيّاً**
1.Min pêncî dînar dan Kaweyî bi destgirtin.
2.Azad destgirtîye,ne pêdivêyî kesê ye.
_ :n.j.verbal nou. **Loan, advance.** **سُلفه ، قرض** .**Riches, wealth.** **ثَراء،غِنى**
1.Destgirtin a Kaweyî,Kawe ji tengavîyê deranî.
2.Destgirtin a Azadî ji kar ê noşdarîyê ye.

Destgirkirin:j.tê.vt. Xuaztin. **To Engage.** **يَخطُبُ** .
Cemşîdî Zînê destgirkir û paşî mehirkir (Marekir).
_ :n.j.verbal noun. **Engagement.** **خُطبه** .
Destgirkirin a Cemşîdî û Zînê dêbaban pêxoşbûn.

Destkêşan:j.tê.vt. Ji karîêxistin, Karjêstandin. **To cease.** **يَفصُلُ**
يَسَحبُ اليَد،
Serdar hat destkêşan,çiku pare dizîn.
_ :n.j.verbal noun. **Cease.** **فَصِلْ،سَحبُ اليَد** .
Destkêşan a Serdarî hevkarên wî tirsandin.

Destlêdan:j.tê.vt. Girtinek sivik.**To touch.** **يَلمُسُ** .
Serbaz gehişt çuînkî û destlêda.
_ :n.j.verbal noun. **Touching.** **لمَس**.
Bi destlêdan a Serbazî li çuînkî,Serbaz serkevt, bû yekem.

Destnîşankirin:j.tê.vt. Diyarkirin. **To specify.** **يُعَيِّنُ، يُؤَشِّرُ** .
Celadetî kiçikek bo xu destnîşankir li dîlanê.
_ :n.j.verbal noun. **Specification.** **تَعيين، تَاشير** .
Destnîşankirin a Celadetî bo kiçikê,xoş jêgirtin bû.

Destpêkirin : j. tê vt. Destavêtin karî. **To begin, To start.** **يَبدَؤُ** .
Te kengî destpêkir,tu cilan bidruî?
_ : n.j.verbal noun.**begining** .**بَدْء**
Destpêkirin a me bo cildrûnê,di cihê xu da bû.

Destruîvedan:j.tê.vt. destnivêjgirtin. **To perform the ritual ablution.** **يَتَوَضَأ**
Min destruîveda bo nivêj a nîvro.(Êvarî).
_ :n.j.verbal noun. **(performance of the ritual) ablution.** **وضوء**.
Destruîvedan a min bo çûn a mizgeftê bû.

Destsirîn:j.tê.vt. 1.Dest jê berdan. **discontinue.** **يَمتَنِعُ، يَكُفُّ** .
Nizarî destsirîn ji kirrîn a xanî ji kêm diravî
_ :n.j.verbal noun. **Discontinuation.** **اِمتِناع، كَفّ** .
Destsirîn a Nizarî ji kirrîn a xanî ji kêm diravî bû.

Destvekirin: j.tê.vt. Şerkirin. Bergirîkirin. **To defend, To protect.** **يُقاتِلُ، يُدا فِعُ**

Bijarî destvekirin û neyar perîşankirin û revîn.

_ :n.j.verbal noun.**Defense, protection.** **قِتال ، دِفاعْ** .

Destvekirin a Bijarî serferazî ya me bû.

Dexisîn : j.tên.vi. Lawazbûn. **To decay.** **يَذوي،يَذبُلْ** .

Saman dexisî ji qehran.

_ : n.j.verbal noun. **Decay.** **ذوي،ذ بول** .

Dexisîn a Samanî ji qehran çêbû.

Dexisandin: j.tê.vt. Lawazkirin. **To decay.** **يُذوي ،يَذبُل**.

Jinbabê Mehabad dexisand ji birsan.

_ :n.j.verbal noun. **Decay.** **ذبول، ذواء** .

Dexisandin a Mehabadê ji birsan bû.

Devjêberdan:j.tê.vt. Hêlan, Wazînan. **To give up.** **يَترُكُ**

Azadî wexernekir devjêberda.

_ :n.j.Verbal noun.**Giving up.** **تَرِكْ**

Devjêberdan a wexerkirinê karek başbû Azadî kirî.

Dêrandin: j.tê.vt. Av jê derkevtin. **To ooze, To sweat.** **يُرَشِّحُ** .

Denê me gelek avê didêrîne.

_ :n.j.verbal nou. **ooze, sweat.** **رَشَح ، تَرَشُّح** .

Dêrandin, denî kerx na k/e/it.

Diberxuraçûn: j.tên.vi. Xubiserûberkirin. **To make neat.** **يُهَندِمُ نفسَهُ**

Evîn diberxuraçû berî biçit şahîyê.

_ :n.j.Verbal noun.**neatness.** **هِندا مُ ا لنّفس**

Diberxuraçûn a Evînê bo şahîyê bû.

Diqdiqandin:J.tê.vt.Şadkirin, xurandin a sivik. **To tickle.** **يُدَغدِغُ**

Ez nivistî bûm kurê min binê piyê min diqdiqand.

_ :n.j.verbal noun. **Tickle.** **دَغدَغه** .

Diqdiqandin a binê piyê min,ez hişyarkirim ji xewê.

Diryan : j.tên.vi. Pijikîn, Zîvalbûn. **To tear.** **يَتَمَزَّقُ** .

Kirasê min yê nuî(nû)kevt kelemî dirya.

_ : n.j.verbal noun. **Tear.** **تَمزيق ، تَمزُّقْ** .

Diryan a kirasî ji bê pakî ya min bû.

Diryandin(dirandin) : j.tê.vt. Zîvalkirin. Pijikandin. **To tear.** يُمَزِّق
Deyk a min kirasê min yê kevin(diryand) dirand.
_ : n.j.verbal noun. **Tear.** تَمزيق .
Diryandin(dirandin) a kirasê kevin bo hin wica bû.

Direwkirin: j.tê.vt. virrkirin. **To lie.** يَكذُبُ .
Hejarî Direwkir,dema gotî ez noşdarim.
_ : n.j.verbal noun. **Lie.** كِذِبْ .
Direwkirin ne karê camêran e.

Dirêjbûn : j.tên.vi. 1.Hatin ser, pêveman. **To become long.** يَطولُ
2.Rakişan. **To lie down.** يَضطجِعُ
1. Spîndar zû dirêjdibe.
2.Beyar dirêjbû ser cihî û raza(nivist).
_ : n.j.verbal noun. **1.Length.** طولْ **2. Lying(down).** إضطِجاع
1.Dirêjbûn a spîndarê ji têr avî ye.
2.Dirêjbûn a Beyarî li ser cihî,bo razanê(nivstinê) bû.

Dirêjkirin : j.tê.vt. 1.Berdan ser, pêvehêlan. **To lengthen.** يُطوِّلُ، يُمِدُّ
2.Rakişandin.**To lie down.** يُضجِعُ ، يُمَدِّد
1. Min doşek dirêjkir da bibe qeysa textî.
2. Min xu dirêjkir ser cihî da ez binivim.
_ : n.j.verbal noun**. 1.Lengthening.** إطاله
2.Lying down. إضطِجاع
1.Dirêjkirin a doşekê hat kirin da textî bigrit.
2.Dirêjkirin a li ser cihî,ez nivandim.

Diserdaçûn: j.tên.vi. 1.Şaşbûn. **To make a mistake.** يَخطأ
Gulê qur,an dixuand diserdaçû.
_ :n.j.Verbal noun. **Mistake.** خَطأ
Diserdaçûn a xuandin a qur,anê asayî ye.

Dixudaavabûn:j.tên.vi.Qebebûn.**To be proud.** يَعتَدُّ بِنَفسهِ
Heval hejarbû;lê dixudaavabû.
_ :n.j.Verbal noun.**Pride,Selfimportance.** اِعتِداد با لنّفس
Dixudaavabûn a Hevalî ji zarokatîyê bû.

Diyarbûn: j.tên.vi. Eşkerabûn. **To appear.** يَظهَر ، يُبان .
Dema stêr a gulavêjê diyardibe şev honikdibe.(Hîndibe)
_ : n.j.verbal noun.**Appearance.** ظُهُور **.**
Diyarbûn a gulavêjê nîşan a seqa şkestinê ye.

Diyarkirin: j.tê.vt. Eşkerakirin. **To appear.** يُكشِفُ ، يُظهِرُ .
Dema stêr a gulavêjê xu diyarkir bizane seqa şkest.
_ :n.j.verbal noun. **Appearance.** ظِهور ، اِظهار .
Diyarkirin a behra her beşdarekê cihê dilxoşîyê bû.

Dizîn : j.tê.vt. Destdirêjkirin. **To steal.** يَسرُقُ .
Dirbazî pezek me dizî şevêdî.
_ : n.j.verbal noun.**Stealing.** سَرِقه .
Dizîn karê mirovê bêxêr e.

Dîtin : j.tê.vt. bînîn. **To see**. يَرى .
Min kiçikekî qelew dît li ser pirê evê spêdê.
_ : n.j.verbal noun. **See, Seeing.** رُؤية .
Dîtin a dildarê li nav rezî dilê min xoşkir.

Dotin : j.tê.vt. Şîr jê kêşan. **To milk.** يَحلُبُ .
Nazdarê çêl a zer dot duhî êvarî.
_ : n.j.verbal noun. **Milking.** حَلِبْ .
Dotin a çêl a zer,çend xoş e!

Drustbûn: j.tên.vi. Rastbûn. **To Adjust, to modify.** يَعتَدِلْ ، يَتَصَحَّح.
Nivîsîn bi pêveçûnê drustbû.
_ : n.j.verbal noun. **Modification.** تَعديل ، تَصحيح .
Drustbûn a nivîsînê Xunav pê rabû.

Drustkirin :j.tê.vt. Rastkirin**. To adjust, to modify.** يُعَدِّلُ ، يُصَحِّحُ **.**
Kê dîwarê we drustkir,Berhem?
_ : n.j.verbal noun. **Modification.** تَصحيح ، تَعديل **.**
Drustkirin a dîwarî Bengîn pê rabû.

Drûn : j. tê vt. **1**.perok kirin cilik. **To sew.** يُخَيِّطُ
2.Dexil birîn. **To harvest.** يَحصُدُ
1.Gulê kirasek bo Zînê drû(druî).
2.Azadî genim ê xu druî.
_ : n.j.Verbal noun. 1.**Sewing.** خِياطه **2.Harvesting.** حَصاد
1.Drûn a cilan bi mekînê bû.
2.Drûn a genimî pale pê rabûn.

Dûrbûn : j.tên.vi. Dûrkevtin. **To distance.** يَبعُدُ .
Ez sed mîla ji wî dûrim.
_ : n.j.verbal noun. **Distance.** بُعُد .
Dûrbûn a me ji hev ne ji mêje ye.

Dûrkirin : j. tê.vt. Dûrbirin. **To distance.** يُبَعِّد .
Gavanî kewal û dewar ji hev dûrkirin.
_ : n.j.verbal noun.**Distance.** اِبعاد .
Dûrkirin a kewal û d ewaran ji hev baş bû.

Dorpêçkirin:j.tê.vt. Gemarudan. **To blockade.** يُحاصِرُ
Leşkerî gund dorpêçkir.
_ :n.j.Verbal noun. **Blockade.** حِصارْ
Dorpêçkirin a gundî leşker pêrabû.

E

Enirandin: j.tê.vt. Torekirin, silkirin. **To bother.** **يُزعِجُ ، يُزَعِّلُ .**
Min kurê xu enirand,çiku min cil bo ne kirîn.
_ : n.j.verbal noun. **Bother.** **ا زعاج ، زَعَلْ .**
Enirandin a kurê min, ji ber ne kirîn a cilan bû.

Enirîn : j.tên.vi. Torebûn, Silbûn. **To bother.** **يَنزَعِجُ ، يَزعَلُ .**
Kur ê min enirî ji min,çiku min cil bo ne kirîn.
_ : n.j.verbal noun. **Bother.** **اِنزِعاج ، زَعَلْ .**
Enirîn a kurê min ne karek baş bû.

Eşkerabûn: j.tên.vi. Hat zanîn, diyarbûn. **To appear.** **يَظهَرُ ، يُبانُ**
Dizî eşkerabû,diz hat girtin.
_ : n.j.verbal noun. **Appearance.** **ظِهور ، بَيا ن .**
Eşkerabûn a dizîyê, diz da girtin.

Eşkerakirin: j.tê.vt. Dan zanîn, diyarkirin. **To appear**. **يُظهِرُ، يُبَيِّنُ**
Min şiya ez dizîyê eşkerabikim bi harîkarî ya polîsî.
_ : n.j.verbal noun. **Appearance.** **ظهور ، بَيا ن .**
Eşkerakirin a dizîyê polîs pê rabû.

Ê

Êşan : j.tên.vi. Jandan. **To pain, to hurt.** يَتَألّمُ .
Pê yê min (piyê min) diêşe, ji ber sotinê.
_ : n.j.verbal noun. **Pain,Hurt.** ألَمْ .
Ez xu li ber evê êşanê na girim.

Êşandin : j.tê.vt. Jankirin.**To pain,to hurt.** يُؤلِمُ .
Wî ez êşandim bi axavtin a req, îro.
_ : n.j.verbal noun. **Pain, hurt**. ألَمْ .
Êşandin a axavtinê nexoştire ji ya lêdanê.

Êxistin : j.tê.vt. **1**.Li erdê dan. **To fall down.** يوقِعُ
2.Ji ber xu kirin, Dakenîn. **To take off, To undress.** يَنزَعُ
1.Di binçenganê de Bijarî Şemal Êxist.
2.Min cilên xu êxistin bo ser şûştinê.
_ : n.j.verbal noun. 1.**Fall.** وُقوعْ .**2.Undress.** نَزعْ ، تَعَرّي .
1.Êxistin a Şemalî di binçenganê de bû.
2.Êxistin a cilan bo ser şûştinê bû.

Êxsîrbûn : j.tên.vi. Kevtin di destê neyarî de. **To capture.** يَتَأسّرُ .
Pênc ji me êxsîrbûn di şerî de.
_ : n.j.verbal noun. **Capture.** أسرْ .
Êxsîrbûn a pênc leşkerên me,ji kêm çekî yê bû.

Êxsîrkirin : j.tê vt. Girtin, bindestkirin.**To capture.** يُأسِرُ .
Îranîyan Dr.Mahir êxsîrkirin di şerî de.
_ : n.j.verbal noun. **Capture.** أسر ، إعتِقال .
Êxsîrkirin a Dr.Mahirî Yazde sala kêşa.

F

Falvekirin: j.tê.vt. Fincan xuandin. **To search for fortune.** يَقرَؤُ البَخت.
Falvekerê falekvekir bo Xunavê.
_ : n.j.verbal noun. **Fortune telling.** قِراءةُ البَخت .
Falvekirin karê falveker ên qereçin.

Fetisandin :j.tê.vt. mirandin. **To put to death, To muzzle.** يُميتُ
Mirîşk a Khurk çuîçikek xu fetisand pêr.
_ : n.j.verbal noun. **Muzzle, Muzzling.** أماتَ .
Fetisandin a çuîçikê ji lez û bez a mirîşk a khurk bû.

Fetisîn : j.tên.vi. Mirin. **To die.** يَموتُ .
Çuîçikek mirîşkê fetisî di bin wê de.
_ : n.j.verbal noun. **Die.** إماته، مَوتْ .
Fetisîn a çuîçikê Xanê pê êşa û kir giryî.

Fewtan : j.tên.vi. Neman. **To perish.** يَهلكُ .
Pênc mirîşkên Zînê fewtan bi êşê.
_ : n.j.verbal noun. **Doom..** هَلا كْ
Fewtan a mirîşk ên gundî bi êşê bû par.

Fewtandin: j.tê.vt. Mirandin. **To perish.** يُهلِكُ.
Êşê gelek mirîşk ên gundîyan fewtandin.
_ : n.j.verbal noun. **Doom.** هَلاك .
Fewtandin a mirîşk ên gundî ziyan gehand gundîyan.

Fêlkirin : j.tê vt. Xapandin. **To trick, To deceive.** يَخدعُ .
Mêrikê qereç fêlek mezin li Narînê kir.
_ : n.j.verbal noun. **Trick, Deceit.** خِداعْ .
Fêlkirin a cembazan di kirrîn û firotinê de ye.

Fêrbûn: j.tên.vi. Ser hilbûn, karzanîn. **To teach, to learn.** يَتَعَلَّمُ .
Perî fêrbû kurdî bixuînit û binivîsit.
_ : n.j.verbal noun. **Learning.** تَعَلُّم .
Fêrbûn a zarok ên jîr fêrkerî şaddike.

Fêrkirin : j.tê.vt. Nîşadan, Ser hilkirin. **To teach, to learn.** يُعَلِّمُ .
Min deh xort fêrkirin zimanê kurdî.
_ : n.j.verbal noun. **Teaching, learning.** تَعليم .
Fêrkirin a zarokan ne karek asan e.

Firehbûn : j.tên.vi. Gewrebûn. **To widen, To enlarge.** يَتَوَسَّعُ .
Pêlavên min firehbûn,Min avêtin.
_ :n.j.verbal noun. **Widening. enlargement.** تَوَسُّعْ .
Firehbûn a pêlavan ji terbûnê ye.

Firehkirin: j.tê.vt. Gewrekirin. **To widen, To enlarge.** يُوَسِّعُ .
Me çal a genimî firehkir,da gelekê bigir/e/it.
_ :n.j.verbal noun. **Widening, Enlargement.** تَوسيع .
Firehkirin a çalê karek başbû.

Firoştin : j.tê.vt. Guhorîn bi pare (dirav). **To sell.** يَبيعُ .
Avanî ga yê pîr firoşt(firot)bi pêncî dînara.
_ : n.j.verbal noun. **Selling.** بَيعْ .
Firoştin a ga yê pîr ji dest tengîyê bû.

Firandin:j.tê.vt. Hêla mel biç/e/it bilindîyê. **To fly.** يُطَيِّرُ .
Şivanî kotir a spî firand pêr êvarî bo xoşîyê.
_ :n.j.verbal noun. **Flying.** طَيَران .
Firandin a kotir a spî bo xoşîyê bû.
Firîn: j.tên.vi. Mel çû hewa. **To fly.** يَطيرُ .
Kewê min yê nêçîrê firî,ez kevtim xem a wî.
_ :n.j.verbal noun. **Flying.** طَيَران .
Firîn a kotiran bi rojê karek xoşe bo kotirbazan.

Fisandin : j.tê.vt. Ga, Çû ser. **To pollinote.** يُلَقِّحُ ، يُجامعُ .
Dîkilî mirîşk fisand.
_ :n.j.verbal noun. **Pollination.** تَلقيح ، جماع .
Fisandin a mirîşk a kund dîkilê qulingî pê rabû.

Fişandin : j.tê.vt. Ba jê berdan. **To empty.** يُفرِّغُ مِنَ الهواء .
Bizmarî tayir fişand.
_ :n.j.verbal noun. **Emptying.** تَفريغْ مِنَ الهواء .
Fişandin a tayirî, otombîl rawestand.

Fişan: j.tên.vi. Ba jê çûn. **To empty.** يَفرَغُ مِنَ الهواء .
Tayir fişa ji nişka ve.
_ :n.j.verbal noun. **Emptying.** فِروغ مِنَ الهَواء .
Fişan a tayirî ji nişka ve bû.

Fîkhandin(fîkandin): j.tê.vt. Deng jê anîn. **To whistle.** يُصَفِّرُ .
Barzan kurê min, ne fîkhîne, babê te nivistî ye!
_ :n.j.verbal noun. **Whistle, whistling.** صَفير .
Fîkhandin, nivistîyan hişyardikin.

Frêdan : j.tê.vt. Havêtin. **To throw.** يَرمي .
Me pêlavên kevin firêdan.
_ :n.j.verbal noun. **Throwing.** رَمي .
Frêdan a pêlavan, Kurê min pê rabû.

G

Gan : j.tê.vt. Çûn di berve, kutan. **To copulate.** يُجامِعُ ، يُواقِعُ .
Her mêrek jin a xu digê.
_ : n.j.verbal noun. **Copulation, Sleeping with.** جِماع ، مُواقعه .
Gan ên mêr û jinan bê gazinde ne.

Gandan : j.tê.vt. dehmen pîskirin. **To fornicate.** تُعاهِر ، تَزني .
Hin jinik hene bê şermin,ganadidin bo diravî(paran).
_ :n.j.verbal noun. **Fornication.** عُهر ، زنا .
Gandan bûye kar bo hin jinikan.

Gankirin:j.tê.vt. Kutan hev. **To fornicate with.** يَزني ، يُواقِعُ أنثى ,
Min dît zelamekê gandikir li rex dîwarê aşê avê pêr.
_ :n.j.verbal noun. **Fornication.** زنا ، مُواقعة أنثى .
Gankirin du corin: Lê û nelê. Helal û heram.

Gazindekirin: j.tê.vt. Gileyîkirin. **To admonish, To blame.** يَلومُ يُعاتِبُ
Camêrî gazindedikirin ji kurê xu bo deyka wî.
_ :n.j.verbal noun. **Admonition.** لَومْ ، عِتابْ .
Gazindekirin a mezinan ji zarokan,başî jê çêdibe.

Gazîkirin :j.tê.vt. bangkirin. **To call.** يُنادي .
Hindî min gazîkir,kesê bersiv neda.
_ : n.j.verbal noun. **Call.** نِداءْ .
Gazîkirin divê bi dengê bilind b/e/it,da bihê bihîstin.

Gehan :j.tên.vi. Grêdan, Gehiştin hev. **To connect, to join.** يَربُطُ ، يوصِلُ.
Herdu benik gehan hev bûn yek benik.
_ :n.j.verbal noun. **Connection, joining.** رَبط ، وَصِلْ .
Bi gehan a du benkan benikek dirêj çêbû.

Gehandin:j.tê.vt.Pêkve girêdan.**To connect,to join.** يُوَصِّل .
Karkeran herdu ser ên benkî gehandin hev.
_ :n.j.verbal noun. **Connection, joining**. تَوصيل .
Bi gehandin a herdu ser ên benkî,benik dirêj bû.

Gefkirin : j.tê.vt.Hereşekirin.**To threaten.** يُهَدِّدُ .
Mirov ên jîr gefannakin li kesê.
_ :n.j.verbalnoun. **Threat, Threatening.** تَهديد .
Gefkirin karê bê ziravan e.

Geflêkirin:j.tê.vt. Hereşelêkirin. **To menance.** يُهَدِّدْ **.**
Mîrxanî ez dam ber gefan ji çu jê nehatinî.
_ :n.j.verbal noun. **Menance.** تَهديد .
Cangîrî bi geflêkirinê kar ên xu birêve dibirin.

Gehi**ş**tin: j.tê.vt. **1**.Gihan. **To arrive.** يَصَلُ
2.hatin xuarin. **To ripe.** يَنضَجُ
1.Name gehişt berî du katan.
2.Tirî gehişt û me xuar.
_ :n.j.verbal noun. 1.**Arriving.** وصول **2.Riping.** نِضوج .
1.Gehiştin a bersivê xoş bû.
2.Gehiştin a tirî havîn xoşkir.

Gellviçandin: j.tê.vt. **1**.Givaştin. **To squeeze**. يَعصُرُ
2.Perixandin. **To scrub.** يَدعَكُ**.**
1.Memkên biçûk ne gellviçîn e!
2.Serê memkan bigellviçîn e xem nake.
_ :N.j.Verbal noun. **1**.**Squeezing**. عَصِر **2**.**Scrub**. دَعِك
1.Gellviçandin a memkên biçûk,memkan diêşîn e.
2.Gellviçandin a serê memkan xoşî yê çêdike.

Gemarbûn:j.tên.vi. Debaxbûn. **To tan.** يُدْبَغُ
Çermê gemarbûyî dikin pêlav.
_ : n.j.verbal noun. **Tanning.** دَبغ ، دِباغه .
Gemarbûn a çermî pêdivê ye bo kar pêkirinê.

Gemarkirin:j.tê.vt. Debaxkirin. **To tan.** يُدبَغُ .
Çerim dihê gemarkirin berî kar pêkirinê.
_ :n.j.verbal noun. **tanning.** دِباغه .
Gemarkirin a çermî, çermî bi hêz dik/e/it.

Gemargirtin: j.tê.vt. Debaxgirtin. **To get tanned.** يَندَبغُ .
Bi harîkarî ya mazyîan,çerim gemarêdigire.
_ :n.j.verbal noun. **Tannage.** دِباغ .
Gemargirtin a çermî ne asane.

Gemekirin: j.tê.vt. Yarîkirin. **To play.** يَلعَبُ .
Salarî û kurê xu gemekirin bi top a pêyî.
_ :n.j.verbal noun. **Play, playing.** لعِب .
gemekirin li gel mindalan xoşe bo deybaban.

Genîbûn : j.tên.vi. bêhin kevtê. **To stink, to decay.** يَجيفُ ، يَنتِنُ .
Xuarin li ber germa yê bimîne genî dib/e/it.
_ : n.j.verbal noun. **Stink, decay.** جيفه ، نتِن .
Genîbûn a xuarinê,ziyanek aborî ye.

Genîkirin:j.tê.vt. Hêlan bêhin bikevtê. **To stink, to decay.** يُجَيِّفُ.
Libaşûr a Iraqê masîyan genîdikin;paşî dixun.
_ : n.j.verbal noun. **stink, decay.** تفسُّخ ، جيفه
Genîkirin a masyan bitinê li başûr a Iraqê dihê kirin.

Geran : j.tê.vt. Şuîn dîtin, Seyran. **To wander about.** يَتَجَوَّلُ .
Lawê min,bigere da jiyê te dirêjbib/e/it!
_ :n.j.verbal noun. **Wandering about.** تَجَوّل .
Geran Jiyê mirovî dirêjdike û pişan firehdike.

Gerandin:j.tê.vt. Birin bo şuîn dîtinê. **To wander.** يُفسِّحُ ، يُجَوِّلُ .
Azad mêhvanan bigerîne li bajarî,da bibînin!
_ :n.j.verbal noun. **Wandering.** تَفسُّح ، تَجَوّل .
Gerandin a mêhvanan bo dîtin a bajarî bû.

Gerimbûn: j.tên.vi. Sermaçûn, Têhin a tavê girt. **To heat.** يَتَحَمّى .
Heker te gerimbû hin cilan dakene.
_ :n.j.verbal noun. **Heat.** حَماوه ، سِخونه.
Germbûn nîşan a tayê ye.(Ta-ê ye).

Gerimkirin: j.tê.vt. Danan ser agirî. Baş nixaftin. **To heat.** يُحَمّي ، يُسَخِّن.
Diyê Şîvê bo min gerimbike! Ez birsîme.
_ :n.j.verbalnoun. **Heat,** تَحمِيه ، تَسخين .
Germkirin a xuarin a sar pêdivê ye.

Geşbûn:j. tên.vi. Baş vebûn. **To open.** يَنفتِح .
Kulîlk bi avdanê geşdibin.
_ :n.j.verbal noun. **Open.** اِنفِتاح **.**
Geşbûn kulîlkê ciwandike.

Geşkirin:j.tê.vt. Baş vekirin.**To be opened.** يُنوِّر ، يُفتِّح .
Avdanê kulîlk geşkirin.
_ :n.j.verbal noun. **Open.** تَنوّر ، تَفتُّحْ **.**
Geşkirin ciwanîyê dide kulîlk û gulan.

Gevaztin: j.tê.vt. Xu di axê werdan. **To roll (in the dust)** يَتَمرَّغ في التُراب
Dema min hêstir berda,çû ser xîzî xu gevazt.
_ :n.j.verbalnoun. **Rolling (in the dust).** تَمَرُّغ في التراب .
Gevaztin çermê hêstrê pakdike.

Gevizîn:j.tên.vi. Di axê werdan. **To roll (in the dust).** يَتَمرَّغ
Min xîz da dor rikeh a kewî,da bigeviz/e/it.
_ :n.j.verbal noun. **Rolling (in the dust).** تَمَرُّغ في التراب .
Gevzîn, kewî paqijdike ji pilpilkan.

Gewrebûn:j.tên.vi. Mezinbûn. **To grow, To enlarge.** يَكبَرُ.
Zaro piç piç gewredibe.
_ :n.j.verbal noun. **Enlargement.** تكبير **.**
Gewrebûn a zarokan ne pêş çave.

Gewrekirin: j.tê.vt. Mezinkirin. **To enlarge, To grow.** يُكبِّر .
Heya Zînê kurê xu gewrekir,serê wê spî bû.
_ :n.j.verbal noun. **Enlargement.** تكبير .
Gewrekirin a zarokî deykê mandî dike.

Geztin : j.tê.vt. **1**.Leqlêdan. **To bite.** يَعُضُّ
2.zuîrandin. **To burn.** يَكوي
1.Pişîk a biçuîk til a min gezt.
2.Tavê ruîyê min gezt.
_ :n.j.verbal noun.1.**Biting.**عَضّ . 2.**burning.** حَرقْ ، كَوي .
1.Geztin a pişîkê til a min êşand.
2.Geztin a tavê ruîyê min sorkir.

Gêjbûn: j.tên.vi. Ser lê şêwan. **To giddy.** **يَدوخُ** .
Zaro gelek caran li dor stonê zivirî gêjbû.
_ :n.j.verbal noun. **Giddiness.** **دَوخه** .
Zaro kevt ji gêjbûnê.

Gêjkirin:j.tê.vt. Ser lê şêwandin. **To giddy.** **يُدَوِّخُ** .
Min zaro gêjkir, çiku min ew zivirand.
_ :n.j.verbal noun. **giddiness.** **دَوخه**.
Gêjkirin bi zivirandinê çê dibe.

Gêran : j.tê.vt. **1**.Bi rêvebir. **To run.** **يُديرُ**
2.Di serra bir. **To revolve.** **يُحَدِّ لُ** .
3.Da karî. **To operate.** **يُشَغِّلُ** .
1.Bijarî karê xu gêra wek dil bixaz/e/it.
2.Hesinî ban gêra bi bagurdanî.
3.Behzadî aş gêra bo genim hêranê.
_ :n.j.verbal noun.1.**Running.** **إدارە** 2.**Revolving.** **تَحديل** .
3.**operating.** **تَشغيل**
I.Gêran a karê Bijarî wek dilê wî çêbû.
2.Gêran a banî Hesin pê rabû.
3.Gêran a aşî Behzad pê rabû.

Gêsikkirin: j.tê.vt. Malîn. **To sweep.** **يَكنُسُ** .
Du karkera kholan hemî gêsikkirin duhî.
_ :n.j.verbal noun. **Sweeping.** **كَنِس** .
Gêsikkirin a kholanan heftîyê carekê dihê kirin.

Gihan: j.tên.vi. gehiştin. **To arrive att, to reach**. **يَصَلُ** .
Ez giham Evînê li Dihokê.
_ :n.j.verbalnoun. **Arrival, Reaching.** **وصول**
Gihan hev li biyanîstanê gelek xoşe.

Gijbûn : j.tên.vi. Bêser û berbûn. **To scatter.** **يَتَناثرُ، يَتَفَرَّقُ** .
Pirç(qij) a paqij zû gijdibe.
_ :n.j.verbal noun. **Scatter.** **تَناثُر، تَفَرُّقْ** .
Gijbûn a pirç a paqij bi livîn a bayî çêdibe.

Gijkirin :j.tê.vt. Bêser û berkirin. **To scatter.** **يَنثُرُ، يُفَرِّقُ** .
Hin kiçik pirç a serê xu gijdikin bo ciwanîyê.
_ :n.j.verbal noun. **Scatter.** **تَناثُر، تَفريق** .
Gijkirin a pirçê li bajar ên Efrîqîya mode ye.

Giranbûn: j.tên.vi.**1.**Qursbûn. **To become heavy. يَثقُلُ**.
2. Biha rabûn. **To become expensive. يَغلى الثَّمَن**
3.Zehmet bûn. **To become hard. يَصعَبُ للفهم**
1.Min xelekek asinî êxist gopalê xu da giranbibe.
2.Pêrar baran ne barî,genim giranbû.
3.Xuandin a Firensî giran e li kurê min.
_ :n.j.verbal noun. 1.**Heaviness ثِقلْ** .2.**High cost. غلاء الثَّمن**
3.**Hardness. صُعوبة** .
1.Granbûn a gopalî bo birêveçûnê xoşbû.
2.Giranbûn a genimî nan girankir.
3.Giranbûn a zimanê Firensî kurê min paşêxist.

Girankirin: j.tê.vt.1.Qurskirin.**To make heavy. يُثقِّلُ الوزن**.
2.Biha bilindkirin. **To make expensive. يُغلِّي الثَّمَن** .
3.Zehmetkirin. **To make hard. يُصعِّبُ الفهمَ** .
1.Min gopalê xu girankir da bo birêveçûnê xoşbib/e/it.
2.Şarevanî ya mûsil bihayê nanî girankir.
3.Zimanê Firensî, xuandin girankir li qotabîyan.
_ :n.j.verbal noun. 1.**Heaviness. ثِقلْ** **2.High cost. غلاءْ**
3.**Hardness. صُعوبة** .
1.Girankirin a gopalî birêveçûn xoşkir.
2. Girankirin a bihayê nanî gazinde peydakirin.
3.Girankirin a xuandinê, ji zimanê firensî çêbû.

Girbûn: j.tên.vi. mezinbûn, gewrebûn. **To swell, to enlarge. يَكبَرُ** .
Golik piç piç girdib/e/it.
_ :n.j.verbal noun. **Bigness, Largeness. كِبَرْ**.
Girbûn a golikî,golik anî(îna)ber firotinê.

Girewbûn: j.tên.vi. Mercbûn. **To bet, To wager. يُراهِنُ** .
Ew girewbû dinavber a min û Diyarî de,ne berêkanebû.
_ :n.j.verbal noun. **Bet, Wager. رهان.**
Diyarî girewbûn bir ji min.

Girewkirin: j.tê.vt. Merckirin. **To bet, to wager. يُراهِنُ** .
Nizarî û ferhadî girewkirin li ser destpêk a mazî çinînê.
_ :n.j.verbal noun. **Bet, wager. مُراهَنة** .
Di girewkirinê de Nizarî qazanckir(mêskir).

Girêdan: j.tê.vt. Bestin. **To bind, To tie.** يَربُطُ .
Kejê golik girêda li ber derê xanî.
_ :n.j.verbal noun. **Bind.** ربَط .
Girêdan a golikî Kejê pê rabû.

Girêlbûn: j.tên.vi. Livîn. **To roll.** يَتَدَحرَجُ .
Bagurdan girêlbû ji ser banî kevt xarê.
_ :n.j.verbal noun. **Roll.** دَحرَجة .
Girêlbûn a bagurdanî ji benik piçanê çêbû.

Girêlkirin: j.tê.vt. Livandin. **To roll.** يُدَحرجُ.
Bijarî bagurdan girêlkir.
_ :n.j.verbal noun. **Roll.** تَدَحرُج .
Girêlkirin a bagurdanî Bijar pê rabû.

Girkirin: j.tê.vt. Mezinkirin,gewrekirin. **To swell .** يُكَبِّرُ .
Şemalî bi dermalîkirinê,berxê xu girkir.
_ :n.j.verbal noun. **Swelling.** تَكبير .
Girkirin a berxî bi cehî(coyî)çêbû.

Girikkirin: j.tê.vt. Hevîr parçekirin bo nanî. **To lump.** يُكَتِّلُ .
Xecê hevîr kir girik bo nan çêkirinê.
_ :n.j.verbal nou. **Lumping.** تَكتيل .
Girikkirin a hevîrî Xecê pê rabû.

Girjbûn: j.tên.vi. Ser û çav têkçûn. **To frown.** يَعبَسُ .
Ser û çav ên Gulê girjbûn çiku zikêşê girt.
_ :n.j.verbal noun. **Frown, Frowning.** عَبَس ، عُبوس .
Girjbûn a ser û çavan ne bi destê mirovî ye.

Girjkirin: j.tê.vt. Ser û çav têkbirin. **To knit the brows.** يُعَبِّسُ .
Xanê çû bo mal a jinbabê,jinbabê ser û çav lê girjkirin.
_ :n.j.verbalnoun. **Kniting the brows.** عَبَس، تَعبيس .
Girjkirin a ser û çavan ne karek başe.

Girnijîn: j.tên.vi. Bişkurîn. **To smile.** يَبتَسِمُ .
Azad girnijî,dema mamê xu dîtî.
_ :n.j.verbal noun. **Smile.** إبتِسا م.
Girnijîn a Arî ji dilbû.

Girovirbûn: j.tên.vi. Xirrbûn. **To conglomerate. يَتَكَوَّرُ** .
Jijî ji tirsan grovirdibe da nehê nasîn.
_ :n.j.verbal noun. **Conglomerate. تَكَوِّر** .
Girovirbûn a jijî ji tirsan bû.

Girovirkirin: j.tê.vt.Xirrkirin. **To conglomerate. يُكَوِّرُ**.
Jijî ji tirsan xu grovirdike.
_ :n.j.verbalnoun. **Conglomerate. تَكَوِّر**.
Girovirkirin a gulolka benkî Kurdê pê rabû.

Girrgirtin: j.tê.vt. Rikgirtin. **To become fanatic. يَتَعَصَّبُ ، يَغتاظُ**.
Dema Aştî girrdigire dîndibe(şêtdibe).
_ :n.j.verbal noun. **Fanaticism. تَعَصُّب**.
Girrgirtin a Aştî Nesaxî ye.

Girrikkirin: j.tê.vt. Distarkirin. **To peel. يَهبُشُ ، يُقَشِّرُ**.
Cangîrî şultîk hemî girrikkir heftî ya dî(din).
_ :n.j.verbal noun. **Peel. هَبش، تَقشير** .
Girrikkirin a şultîkî bi sê roja pêkhat.

Girrtêberbûn: j.tên.vi. Xeyîdîn. **To lose one's temper. يَغضَبُ، يَغتاظُ**
Dema kewê min kewê sorik dîtî girrtêberbû.
_ :n.j.Verbal noun. **Anger, Rage. غَضَب، غيظ**
Girrtêberbûn a kewê min ji ber dîtin a kewê sorik bû.

Girtin: j.tê.vt. 1.Desttêweran. **To catch. يَمسَكُ**
2.Jiberkirin.**To Memorize يَحفَظُ الدَّرسَ** 3. Daêxistin.**To close. يَغلُقُ**
1.Polîsî dizek girt şevêdî.
2.Qotabî ders a xu girt.
3.Aram dergehî digire bi şevê.
_ :n.j.verbal noun. 1.**catch. مَسِكْ** .2.**Memorizing. حِفِظ**.
3.**Close. غَلق**
1.Girtin a dizî polîs pê rabû.
2.Ders girtin karê qotabîyê zîrek e.
3.Girtin a dergehî bi şevan pêdivê ye.

Giryan: j.tên.vi. Firmêsk (rondik) barîn. **To weep, to cry.** يَبكي.
Deyk a Salrî digirya,dema me dîtî.
_ :n.j.verbal noun. **Weeping, crying.** بُكاء.
Giryan a deyk a Salarî dil disotandin.

Giryandin: j.tê.vt. Firmêsk barandin. **To weep, To cry.** يُبَكّي.
Babê bi zillehekê kurê xu giryand.
_ :n.j.verbal nou. **Weeping, crying.** بُكاء.
Giryandin a zarokan dilê deybaban diêşînin.

Givaştin:j.tê.vt. Badan bo av jê çûnê. **To press.** يَعصُرُ.
Cilên ter bigivêşe da zuhabibin.
_ :n.j.verbal nou. **Pressing.** عَصِر.
Givaştin a cilên ter bo zuhakirinê ye

Gocbûn: j.tên.vi. Ne livîn a parçeyek leşî. **To paralyze.** يَنشَّلُ.
Qenco bişevê nivist, spêdê dîtin Goc e.
_ :n.j.verbal noun. **Paralyzation.** شَلَلْ.
Gocbûn, mirovî ji kardiêxe.

Gockirin: j.tê.vt. Ji kaskevtin a parçeyek leşî. **To become paralyzed.** يُشَلُّ
Şirenqeyek li destê berazî dan,dest lê gockirin.
_ :n.j.verbal noun. **Paralyzation**. شلل.
Gockirin a destê berazî, beraz da serjêkirin.

Gotin: j.tê.vt. Axavtin. **To say.** يَقولُ.
Comerdî vîya biçit bo aşî,babê wî gotê “Ne çe.”
_ :n.j.verbal noun. **Saying.** قول.
Gotin a babê Comerdî ne hêla Comerd biç/e/it bo aşî.

Guhaztin: j.tê.vt. Cihguhorîn, Ji cihbirin. **To transfer.** يَنقُلُ، يُحَوِّلُ.
Alanî mal a xu guhazt ji Sêmêlê bo Dihokê.
_ :n.j.verbal noun. **Transfer.** نَقل، تَحويل.
Guhaztin a malê Alan pê rabû.

Guhdan: j.tê.vt. bihîstin. **To listen to.** يَستَمِعُ**.**
Narînê guhda çîrokê şevadî.
_ :n.j.verbal noun. **Listenig.** اِستِماعْ.
Guhdan a çîrok ên kurdî, mindalan pê xoşe.

Guhişîn: j.tên.vi. Sersûrbûn. **To become absentminded.** يَذهَلُ .
Ez guhişîm,dema min bihîstî,ku Balo hat kuştin.
_ :n.j.verbal noun. **Absentmindedness.** ذِهول .
Guhişîn a min bihîstin a mirin a Baloyî bû.

Guhlêbûn: j.tên.vi. Bihîstin. **To listen.** يَسمَعُ .
Min guhlêbû te çi got duhî.
_ :n.j.verbal noun. **listening.** سَماع .
Guhlêbûn a min bo gotin a te bi min xoşbû.

Guhorîn: j.tê.vt. Yek dana cihê yê dî. **To change.** يُبَدِّلُ .
Cilên min pîsbûn, min guhorîn. Cilên te pîsin biguhore!
_ :n.j.verbal noun. **Changing, Change.** تَبديل .
Guhorîn a cilên pîs pêdivêye (pêwîste).

Gulîdan(gulîgirtin): j.tê.vt. Dangirtin. **To form ears.** يُسَنبِلُ الزَّرعُ.
Genimî heyv a pêncê gulîdan.
_ :n.j.verbal noun.**Ear.** سَنبَلَةُ الزَّرع .
Gulîdan a genimî di heyv a gulanê de ye.

Gumbûn: j.tên.vi. Bezirbûn. **To be lost.** يَفقُدُ ، يَضيعُ .
Gulê gumbû li Diyarbekrê par.
_ :n.j.verbal noun. **Loss.** فَقِد، ضِياع .
Gumbûn a Gulê du roja kêşa.

Gumkirin: j.tê.vt. Bezirkirin. **To lose.** يُفقِدُ ، يُضَيِّعُ .
Salarî deh dînar gumkirin li bazarî pêr.
_ :n.j.verbal noun. **Loss.** فَقِد ، ضِياعْ .
Gumkirin a deh dînara Salar gêjkir.

Guran: j.tê.vt. Kevilkirin. **To flay.** يَسلُخُ الجِلد .
Bizinek serjêkirin,pîstê wê guran bo meşk a avê.
Mihek serjêkirin,pistê wê guran kirin heban.
_ :n.j.verbal noun. **Flaying.** سَلخُ الجِلد .
Guran a Pezî karê gurankerane.

H

Hajêbûn: j.tên.vi. 1.Pêhesan. **To feel.** **يَشعُرُ**
2.Guhlêbûn. **To hear.يَسمَعُ**
1.Min hajêbû diz hatin di malê de.
2.Min haj dengê pê yên(piyên) dizî bû.
_ :n.j.verbal noun. **Feeling.** **حِسّ، شعور** .2.**Hearing.** **سَماع** .
1.Hajêbûn a min bo hatin a dizî ji zehfî ya dizî yê bû.
2.Hajêbûn a dengê pê yên dizî ez hişyarkirim.

Hajotin(Ajotin): j.tê.vt. Lê xurrîn, Serkêşan. **To lead, To guide.** **يَقودُ**
Bijarî otombîl hajot. Min du hêstir ên barkirî ajotin.
_ :n.j.verbal noun. **Leading, guiding.** **قِيادة**.
Hajotin a otombîlê ne asan e. Ajotin a hêstirê sanahî ye.

Hanbirin: j.tê.vt. Penabirin. **To resort to.** **يَستَنجِدُ ، يَلوذُ ، يَلتَجِئ** .
Beyar nesaxbû jin a wî hanbir bo babê wî bo harîkarîyê.
_ :n.j.verbal noun. **Resorting to.** **إستِنجاد ، مَلاذ ، اِلتِجاء**.
Hanbirin bo babê Beyarî karek başbû jina wî kirî.

Handan: j.tê.vt. harîkirin,(arîkirin). **To relieve, to help.** **يُعينُ ، يُنجِدُ**
Çeterî han a xu gehand min,min handa.
_ :n.j.verbal noun. **Relief, help.** **إعانة ، نَجدة** .
Handan a min bo Çeterî karek başbû.

Harîkirin(Arîkirin): j.tê.vt. Handan. **To help.** **يُساعِدُ** .
Azadî harîkarî ya kurê xu kir bo jin anînê.
_ :n.j.verbal noun. **Help.** **مُساعَدة** .
Harîkarî ya babê bo kurî karek baş e.

Hatin: j.tê.vt. Gehiştin. **To come.** يَأتي ، يَجيئ .
Kerwan hat ji Mêrdînê berî katekê.
_ :n.j.verbal noun. **Coming.** قُدوم ، مَجيئْ .
Hatin a zarokan dilê dêbaban geşkir.

Havêtin(avêtin): j.tê.vt. Firêdan. **To throw.** يَرمي .
Şadî hin cilên kevin havêtin pêr.
_ :n.j.verbal noun. **Throwing.** رَمي .
Havêtin a cil ên kevin karek ne başbû,diviya daban hejaran.

Hawî**ş**bûn: j.tên.vi. Giryan rawestandin. **To become silent.** يوقِفُ البُكاء
Kurê Gulê bi mêwîjan hawîşbû.
_ :n.j.verbal noun. **Silence.** ا يقافُ البُكاء .
Hawîşbûn a kurê Gulê bi hin mêwîjan hat kirin.

Hawî**ş**kirin: j.tê.vt. Bêdengkirin. **To silence.** يُسَكِّتُ .
Gulê kurê xu bi hin mêwîjan hawîşkir.
_ :n.j.verbal noun. **Silence.** سكوت .
Hawîşkirin a kurikî sanahîbû.

Hebûn: j.tê.vt.Xueyîbûn.**To have,to posses,to own.** يَملُكُ .
Min çêlek(mangayek) hebû bo şîrî,duhî mir/mirarbû/.
_ :n.j.verbal noun. **Have, Possession,** تَمَلُّكْ .
Hebûn ji nebûnê çêtir e.

Hefan: j.tên.vi.1.westan. **To tire.** يَتعَبُ
2.Hatin xuran. **To rub out.** يَنمَحي
1.Piyên min hefan ji geranê.
2.Piyên min hefan ji pêxuasî.
_ :n.j.verbal noun. 1.**Tiredness.** تَعَب .*2.***Rubbing out.** مَحو .
1.Hefan a piyên min ji geranê bû.
2.Hefan a piyên min ji pêxuasî yê bû.

Hefandin: j.tê.vt. 1.Westandin. **To become tired.** يُتعِبُ .
2.Jê hatin xuran. **To rubout.** يُمحي .
1.Ma ne bese geran,nê te pê yên min hefandin?
2.Pêxuasî yê pê yên min hefandin.

_ :n.j.verbal noun.1. **Tired. تَعَب** .2.**Rubbingout. مَحو** .
1.Hefandin a pê yên min ji geranê bû.
2.Hefandin a pê yên min ji pêxuasî yê bû.

Hejan: j.tên.vi.Livîn.**To shake,To Swing. يَهتَزّ** .
Heker dartuî heja,dê tuî werhin.
_ :n.j.verbal noun. **Shake. اِهتِزاز** .
Hejan a hêzkê li mindalî xoşhat.

Hejandin: j.tê.vt. Livandin. **To swing. يَهُزّ** .
Min dartuî hejand,da tuî biwerhin.
_ :n.j.verbal noun. **Swing. هَزّ** .
Bi hejandin a dartuî yê,tuî werhan.

Hejêkirin: j.tê.vt. Viyan. **To love. يَحُبّ** .
Min hejêkir berî ez bixuazim.
_ :n.j.verbal noun. **Love. حُبّ** .
Hejêkirin a Mem û Zînê ji dil bû.

Helatin: j.tê.vt. **To escape, To save oneself (from). يَنجو** .
Diz helat ji zîndanê berî sê roja.
_ :n.j.verbal noun.**Escape . نَجاة** .
Helatin a dizî polîs alozkir.

Helbirrîn: j.tên.vi. Jêvebûn, jêdûrbûn. **To sever, to sunder. يَنفَصِل ، يَبتَعِد**
Heker berx mezin bû,dê ji makê hê/t helbirrîn.
_ :n.j.verbal noun. Severance, **sunderance. اِنفصال ، اِبتِعاد** .
Helbirrîn a berxî ji makê karek asayî ye.

Helbirrandin: j.tê.vt. Jêdûrkirin, jêvekirin. **To sever, to sunder. يُفصِلُ، يُبعِدُ**
Şivanî berx ên sava helbirrandin ji makan.
_ :n.j.verbal noun. **Severance, Sunderance. فَصِل، اِبعاد** .
Helbirrandin a berx ên mezin ji makan karek asayî ye.

Helgîrsandin: j.tê.vt. Hilkirin. **To light. To catch fire. يُشعِلُ، يُطِيئُ**
Min çira helgîrsand da bib/e/it ronahî.
_ :n.j.verbal noun. **Lighting, Catching fire. أشعَل،أطاء** .
Helgîrsandin a lempe ya gewre(mezin)jor kir ronahî.

Helsan: j.tên.vi. 1.Rawestan. **To stand up.** يَنهَضُ
2.Hişyarbûn **To rise, To get up.** يَستَيقِظ.
1.Mamhosta hat jorê,qutabî helsan ser piyan.
2.Çikokê(saetê)heft cara lêda,ez helsam ji xewê.
_ :n.j.verbal noun. 1.**Standing up.** نِهوض .2.**Rising.** اِستيقاظ.
1.Helsan a qutabîyan dilê mamhostayî xoşkir.
2.Helsan a min ji xewê,karek baş bû.

Helsandin: j.tê.vt. 1.**To stand.** أنهَضَ .2.**To make rise.** أيقظ.
1.Zaro kevt min helsand ser piyan.
2.Zaro girya min diya wî helsand ji xewê.
_ :n.j.verbal noun. **Standing up.** اِنهاض .2.**Rising.** اِيقاظ.
1.Helsandin a zaroyî, ez pê rabûm.
2.Helsandin a diya zaroyî ji xewê, bab pê rabû.

Henasekêşan: j.tê.vt. Bêhinkêşan. **To breathe, to respire.** يَتَنفَّسُ
Mirov henasêdikêşe da bijît.
_ :n.j.verbal noun. **Breathing, respiration.** تَنفُّسْ.
Henasekêşan a kûr xûnê baş pakdike.

Herifîn: j.tên.vi. Kavilbûn. **To fall down, To become destroyed.** يَنهَدِمُ
Xanîyê Şenê herifî ji bîbelerzê.
_ :n.j.verbal noun. **Falling down.** اِنهدام.
Herifîn a xanî yê Şenê ji Bîbelerzê çêbû.

Herifandin: j.tê.vt. Kavilkirin. **To destroy.** يُهدِمُ.
Leşkerê Seddamî 4500 gund li kurdistanê herifandin.
_ :n.j.verbal noun. **Destruction.** تَهديم، هَدم.
Herifandin a xanyên 4500 gunda, leşkerê Seddamî pê rabû.

Herişandin:j.tê.vt.perçiqandin.**To crush.** يَسحُقُ.
Rezvanî hemî tirî herişand da bik/e/it doşav.
_ :n.j.verbal noun. **Crush.** سَحِق.
Herişandin a tirî rezvan pê rabû.

Herişîn : j. tên.vi. Perçiqîn. **To crush.** يَنسَحِقُ.
Selka tirî ji destê min kevt gelek jê herişî.
_ :n.j.verbal noun. **Crush.** اِنسحاق.
Herişîn a hin tirî ji bê pakî ya min bû.

Hestpêkirin: j.tê.vt. Pêhesan. **To feel, To sense.** يَحُسُّ، يَشعُرُ.
Dema pê yê min kevtî ser şîşê şkestî min hestpêkir, ku pê yê min birî.(ku şîşeyî pê yê min birî).
_ :n.j.verbal noun. **Feeling, Sense.** اِحسا س، شِعور.
Hestpêkirin a min, rast derçû.

Hestan: j.tên.vi. 1.Rawestan. **To stand up.** يَقِفُ
2.Repbûn. **To erect.** يَنتَصِبُ.
1.zaro hesta ser piyan.
2.Kêrî(kîrê) zaroyî hesta,çiku mîzî dehat.
_ :n.j.verbal noun.1.**standing up.** وُقوف. 2.**Erection.** اِنتِصا ب
1.Hestan a zaroyî li ser piyan dilê dêbaban xoşkir.
2.Hestanî kêrî zaroyî le ber ne mîztinî bû.

Hestandin: j.tê.vt. 1.Rawestandin. **To stand.** يُوَقِّفُ، يُنهِضُ.
2.Repkirin. **To erect.** يُوَتِّرُ، يُقوِّمُ.
1.Zaro kevt min hestand ser pêyan.
2.Kêrî zaroyî hesta, destî bo bird.
_ :n.j.verbal noun. 1.**Standing.** اِيقاف، اِنهاض .2.**Erection.** تَوَتُّر
1.Hestandin a zaroyî li ser piyan ez pê rabûm.
2.Hestandinî kêrî zaroyî zaro pêy rabû.

Hevgirtin: j.tê.vt. Yekgirtin. **To unite.** يَتَّحِدُ.
Kurd di tengavîyan de hevdigirin.
_ :n.j.verbal noun. **Union.** اِتِّحا د.
Hevgirtin a Kurdan di tengavîyan de,karek başe.

Hevîrkirin:j.tê.vt.Arşêlan (Ardşêlan). **To knead.** يَعجِنُ.
Gulê hevîrkir bo nan pehtinê(pêjtinê).
_ :n.j.verbal noun. **Batch.** عَجن.
Hevîrkirin û nan pehtin a Gulê serfirazî bû, bo malbat a wê.

Hewandin: j.tê.vt. Dakirin. **To bring in, To enter.** يُدخِلُ.
Şemal! Pezî bihewîn e govê,îşev sare!
_ :n.j.verbal noun. **Bringing in, Entering.** اِدخال.
Hewandin a pezî di govê de karek baş bû.

Hewarkirin: j.tê.vt. Harîkarî xuastin. **To call for help.** يَستَغيثُ.
Berevanî hewarkir bi dengekî bilind,dema dîtî agir berbû xanî.
_ :n.j.verbal noun. **Call for help.** اِستِغاثة.
Hewarkirin a Berevanî bo vemirandin a agirî bû.

Hewbûn:j.tên.vi. Besbûn, Tewawbûn. **To end, to finish.** يَنْتَهي
Kengî dê hewbuî ji xuandinê?
_ :n.j.verbal noun. **End, Finish.** نِهاية.
Ligel hewbûn a karî,em tenabûn.

Hewhan:j.tên.vi. Tenabûn. **To calm, To quieten.** يَهدَؤُ.
Seddam hat girtin gell hewha.
_ :n.j.verbal noun. **calm.** هدوء.
Hewhan a gellê Iraqê bi girtin a Seddamî çêbû.

Hewkirin:j.tê.vt. Beskirin, tewawkirin. **To end, to finish.** يُنهي.
Min xuandin hewkir, çiku serê min êşa.
_ :n.j.verbal noun. **End, finish**. نِهاية.
Hewkirin a xuandinê ji ber ser êşanê bû.

Heybûn:j.tên.vi.Heyîn. **To be found.** يَتَواجَدُ.
Ez Hebûm sal a 1924-ê û yek salî bûm.
_ :n.j.verbal noun.**Being,existence.** وجود.
Heybûn a her mirovekê ji deybabane.

Heyîbûn:j.tên.vi. Zengînbûn. **To become /rich/Wealthy.** يَغتَني.
Berî hatin a min bo Siwîdê, ez heyîbûm.
_ :n.j.verbal noun. **Rich, wealth.** إغتِناء.
Heyîbûn a min ji zîrekî ya min bû di karî de.

Heyîkirin: j.tê.vt. Zengînkirin. **To be/rich/wealth.** يُغني.
Karkirin a berdewam,ez heyîkirim.
_ :n.j.verbal noun. **Rich, wealth.** غِنى.
Heyîkirin a min ji malbatê bû.

Hezkirin: j.tê.vt. Viyan. **To wish, to desire.** يُريدُ، يَرغَبُ.
Min hezdikir ez te nasbikim.
_ :n.j.verbal noun. **wish, desire.** رَغبة.
Hezkirin a Bijarî ew bû,ku bib/e/it noşdarek gelek baş.

Hêlan: j.tê.vt. 1.Destjêberdan. **To leave.** يَترُكُ
2.delîvedan. **To allow.** يَسمَحُ
1.Min Zaxo hêla,ez hatim Siwîdê.
2.Min hêla kurê min wexerê bike.

_ :n.j.verbal noun.1.**Leaving.** **تَرك**

2.**Allowance, allowing.** **سَماح**

1.Hêlan a Zaxo biryar a min bû.

2.Hêlan a wexerkirin a kurê min biryarekî baş bû.

Hêlkirin: j.tê.vt. Xetkirin. **To line.** **يَخُطُّ**.

Min gorepan a topan a pêyî hêlkir.

_ :n.j.verbal noun. **Line.** **خَطّ، تَخطيط**.

Hêlkirin a gorepanê pêdivê bû.

Hêkkirin:j.tê.vt. Hêkderhatin. **To lay eggs.** **تَبيضُ**.

Mirîşk a kund hêkkir berî noke.

_ :n.j.verbal noun. **Laying eggs.** **وَضعُ البيض**.

Hêkkirin a her roj mirîşk ên likhorin pê radibin.

Hêminbûn: j.tên.vi. Piştrastbûn. **To feel safe. To secure.** **يَطمَئِنُّ**.

Dema nameya kur ê min hatî ez hêminbûm.

_ :n.j.verbalnoun. **Safety, security.** **اِطمِئنان**.

Hêminbûn a min bi hatin a nameyê bû ji kur ê min.

Hêminkirin: j.tê vt. Piştrastkirin. **To secure.** **يُطمئِنُ**.

Hatin a name ya kur ê min ez hêminkirim.

_ :n.j.verbal noun. **Security.** **اِطمِئنا ن. طمأ نة**

Hêminkirin a min, ji hatin a nameyê çêbû.

Hêran: j.tê.vt. Genim kirin ar/d. **To grill, to mill.** **يَطحَنُ**.

Sekvanî barek genimî hêra li aşê avê.

_ :n.j.verbal noun. **Grinding, Milling.** **طحِن**.

Hêran a genimî Sekvan pê rabû.

Hijmartin:j.tê.vt. Hisabkirin. **To count, To number.** **يَعُدُّ**.

Min pez hijmart,ne bûn sed.

_ :n.j.verbal noun. **Counting.** **عَدّ**

Hijmartin a pezî,ez pê rabûm.

Hilandin: j.tê.vt. 1.Revîn. **To be defeated.** **يَنهزِمُ**

2.Paşêxist. **To save.** **يَدَّخِر**

1.Rêgirî dît ez çekdarim, hiland ji tirsan.

2.Min hizar dînar hilandin bo paşroj a xu.

_ :n.j.verbal noun. 1.**defeating.** اِنهزام .2.**Saving.** اِدِّخار .
1.Hilandin a rêgirî,ji tirsa çekî bû.
2.Hilandin a hizar dînaran bo paşrojê bû.

Hilavêtin: j.tê.vt. 1.Vereşandin. **To vomit.** **يَتَقَيَّؤُ.**
2.Bilindkirin. **To push up.** **يَدفعُ للاعلا.**
1.Aştî gelek şîv xuar,ji ber hindê hilavêt.
2.Aramî coxîn hilavêt bi milhêbê genim ji khayê cuda kir.
_ :n.j.verbal noun. 1.**Vomiting.** **تَقَيُّئ** . 2.**Push up.** **يُعَلي** .
1.Hilavêtin a Aştî, ji xuarin a gelek bû.
2.Hilavêtin a coxînê bo cudakirin a genimî bû ji khayê.

Hilawîstin: j.tê.vt.daliqandin.**To hang.** **يُعَلِّقُ** .
Bêrîvanê meşk hilawîst bi darê ve.
_ :n.j.verbal noun. **Hanging.** **تَعليق** .
Hilawîstin a meşkê bi darê ve bo khanê bû.

Hilbijartin: j.tê.vt. Jêgirtin. **To select. To elect.** **يَنتَخِبُ، يَختارُ** .
Azad hat hilbijartin di dengdanê de.
_ :n.j.verbal noun. **Election.** **اِنتِخا ب** .
Hilbijartin a azadî bi pitirî ya dengan bû.

Hilbûn: j.tên.vi. Agir girtin. **To light.** **يَشتَعِلُ، يَظيؤُ** .
Lempe hilbû bi zilkek şixatê.
_ :n.j.verbal noun. **Light.** **اِظاءة** .
Hilbûn a lempê gelek ne kêşa.

Hildan: j.tê.vt. Bilindkirin. **To raise.** **يُعَلي، يَرفعُ** .
Gulê delinga xu hilda da pîs neb/e/it.
_ :n.j.verbalnoun. **Raising.** **تَعلية، رَفِع** .
Hildan a delingê, deling hêla paqij.

Hilêxistin: j.tê.vt. Destpêkirin. **To begin, To start.** **يَبدَؤُ**
Çolî şer li gundî hilêxist.
_ :n.j.Verbal noun.**Beginning,Start**. **بَدء**
Hilêxistin a şerî Çolî pê rabû.

Hilingivtin: j.tê.vt. Piyê wî bi tiştekê kevt. **To stumble.** **يَتَعَثَّر**
Narîn li derazînka dergehî hilingivt.
_ :n.j.verbal noun. **Stumble.** **تَعَثُّر** .
Hilingivtin a Narînê piyê wê êşand.

Hilînan: j.tê.vt. Paşêxistin. **To save, to spare.** يَدَّخِرُ، يُوَفِّرُ.
Diya Behzadî çar hêk hilînan bo wî.
_ :n.j.verbal noun. **Saving.** اِدّخار، تَوفير.
Hilînan a hêkan dilê Behzadî xoşkir.

Hilgirtin: J.tê.vt. 1.Hilînan. **To save.** يَدَّخِر
2.Li baweşkirin.**To carry, To bear.** يَحمِلُ.
1.Xanê du sêv hilgirtin bo kurê xu.
2.Kurê Xanê westa,Xanê ew hilgirt.
_ :n.j.verbal noun. 1.**Saving.** اِدّخار. **Carrying, bearing.** حَمِل.
1.Hilgirtin a sêvan,dilê kurê Xanê xoşkir.
2.Hilgirtin a kurî dilê daykê xoşkir.

Hilhewirîn: j.tên.vi. Jêkvebûn. **To crumble.** يَتَفَتَّتُ.
Goşt hilheweri ji kelînê.
_ :n.j.verbal noun. **Crumbling, Crumble.** تَفَتُّت.
Hilhewirîn a goştî suîcê khabanîyê bû.

Hilhewirandin: Jêkvekirin. **To crumble.** يُفَتِّتُ.
Khabanîyê goşt Hilhewirand bi kelandinê.
_ :n.j.verbal noun. **Crumbling, crumble.** تَفتيت.
Hilhewirandin a goştî bo herîsê bû.

Hilkevtin: j.tê.vt.çêbûn. **To happen, to occur.** يُصادِفُ، يَحدُثُ.
Bo me hilkevt,em wexerê bikin bo nerwîcê.
_ :n.j.verbal noun. **Happening, occurrence.** صُدفة، حَدَث.
Wexer a me bo Nerwîcê,hilkevtin bû.

Hilkêşan: j.tê.vt.1. Derînan. **To pull, To draw.** يَقلَعُ
2.Bilindkirin. **To raise.** يَسحَبُ للاعلى
1.Didansazî(didançêkerî) didanê(diranê)Nazê hilkêşa.
2.Xanê dewlik ji bîrê hilkêşa.
_ :n.j.verbal noun. 1.**Pulling.** قلع .2.**Raise.** رَفِع للاعلى.
1.Hilkêşan a didanî ji ber êşê bû.
2.Hilkêşan a dewlikê bo avê bû.

Hilkirin: j.tê.vt. 1.dagîrsandin. **To light.** يُظيئُ
2. kirin gilolk. **To make round**. يَدَوِّرُ، يُكَوِّرُ.
1.Min çira hilkir. 2.Besê benik hilkir.

_ :n.j.verbal noun.1.**Light.** إظاءة .2.**Make round.** تكوير .
1.hilkirin a çirayî ez pê rabûm.
2.Hilkirin a benkî Besê pê rabû.

Hilmaştin: j.tê.vt. Huçik paşvebirin. **To raise, To lift up.** يَرفعُ كُمّه
Qazê zend û bazin hilmaştin,rêving ên rêya kuştin.
_ :n.j.verbal noun. **Raising, lifting up.** رَفع .
Hilmaştin a huçkî zend û bazin diyarkirin.

Hilperastin: j.tê.vt. Paldan. **To lean on.** يَتَّكِئُ على .
Li dîwanxaneyan hilperastin kirête.
_ :n.j.verbal noun. **Leaning on.** إسناد، إتّكاء .
Hilperastin li malên biyanî karek şerme.

Hilperandin (helperand): j.tê.vt. Semapêdankirin. **To dance.** يُرَقّصُ.
Rêbazî hirç hilperand.
_ :n.j.verbal noun. **Dancing, dance.** رَقِصْ.
Hilperandin a hirçan karê delî ya ne.

Hilperîn(Helperîn): j.tên.vi. Semakirin. **To dance.** يَرقُصُ .
Nazdar li şahî ya pismamê xu hilperî.
_ :n.j.verbal noun. **Dancing,dance.** رَقِصْ .
Hilperîn a kurdî gelek rengin(corin).

Hilweran: j.tên.vi. Kevtin, berbûn. **To fall down.** يَتَساقط .
Payiz hat belg ên daran hilweran.
_ :n.j.verbal noun. **Falling down.** سِقوط .
Hilweran a belg ên daran di payizê de çêdib/e/it.

Hilwerandin: j.tê.vt. Daweşandin,**To fall down.** يُسقِطُ .
Me hin belig hilwerandin bo pezî.
_ :n.j.verbal noun. **falling down.** إسقاط .
Hilwerandin a belg ên daran bo alîk a pezî bû.

Hilweşan: j.tên.vi.Kevtin,berbûn.**To fall down,to collapse.** يَتَساقطُ
Kepir a rezî hilweşa ji nişka ve.
_ :n.j.verbal noun. **Falling down, Collapse.** سِقوط، إنـهيار .
Hilweşan a keprê ji babelîskê çêbû.

Hilweşandin: j.tê.vt. Têkdan. **To Collapse.** يُفَلِّشُ، يُزيلُ.
Tirî nema ,me kepir hilweşand.
_ :n.j.verbal noun. C**ollapse.** تَفليش، إزالة.
Hilweşandin a kepr a rezî, rezvan pê rabû.

Hinartin: j.tê.vt. Virêkirin, şandin. **To send.** يُرسِلُ.
Bengînî nameyek hinart bo babê xu.
_ :n.j.verbal noun. **Sending.** إرسال.
Hinartin a nameyê karek baş bû Bengînî kirî.

Hindabûn: j.tên.vi. Bezirbûn. **To lose.** يَفقُدُ، يَضيعُ.
Birayê Şemalî hindabû li Silêmanîyê par havînê.
_ :n.j.verbal noun. **Loss.** فَقِد، إضاعة.
Hindabûn a birayê Şemalî ji nexuendewarîyê bû.

Hindakirin: j.tê.vt. Bezirkirin. **To lose.** يُضَيِّعُ.
Besnayê dînarek hindakir duhî.
_ :n.j.verbal noun. **Loss.** تَضييع، فقِد.
Hindakirin a dînarî Besna gêjkir.

Hingavtin: j.tê.vt. Vêkevtin. **To hit (a target)** يُصيبُ الهَدَف.
Min bi yekem gulle nîşan hingavt.
_ :n.j.verbal noun. **Hit.** إصابَةُ الهَدَف.
Hingavtin a nîşanê ez dilxueşkirim.

Hinûn(hinuîn): j.tê.vt. Rengkirin bi axê. **To paint.** يُطَيِّنُ، يَصبُغُ
Gulê jor a nivistinê hinuî bi axispîkê.
_ :n.j.verbal noun. **Paint.** تَطيين، صَبغ.
Hinuîn a jor ên xanyan payîzê dihên kirin.

Hişkbûn: j.tên.vi. Teratî jê çûn. **To dry.** يَجُفُّ.
Darê ter li ber hetavê hişkdib/e/it.
_ :n.j.verbal noun. **dryness.** جَفاف.
Hişkbûn a darê ter gelek dikêşe.

Hişkkirin: j.tê.vt. Teratî jê birin. **To make dry.** يُجَفِّفُ.
Me gelek dar ên ter hişkkirin bo zivistanê.
_ :n.j.verbal noun. **dryness.** تَجفيف.
Hişkkirin a dar ên ter bo sotinê pêdivê ye.

Hiştin:j.tê.vt. Vehêlan. **To remain.** يُبقي.
Me gelek gûz û mêwîj hiştin bo zivistanê.
_ :n.j.verbal noun. **Remainder.** اِبقاء.
Hiştin a guîz û mêwîjan bo zivistanê karek başe.

Hişyarbûn: j.tên.vi. 1.Ji xew helsan. **To wake up.** يَستَيقِظ
2.agadarbûn.**To warn.** يُحَذِّر.
1.Heval iro zuî hişyarbû,ne wek herroj.
2.Hejar hişyar be ne kevî!
_ :n.j.verbal noun: 1.**Wake.** اِستيقاظ **2.Wariness.** حَذَر
1.Hişyarbûn a zuî mirovî jîrdike,saxlemdike û zengîndike.
2.Hişyarbûn mirovî diparêz e ji rûdanan.

Hişyarkirin: j.tê.vt. Xewa wî revandin. **To waken.** يوقِظ.
Nazê kurê xu hişyarkir da biç/e/it dibistanê.
_ :n.j.verbal noun. **Wakener.** ايقاظ.
Hişyarkirin a zarokan karê daykan e.

Hizirkirin: j.tê.vt. Fikirkirin. **To think.** يُفَكِّر.
Min hizirkir,ku ez diyarîyekê bo jina xu bikirrim.
_ :n.j.verbal noun. **Thinking.** تَفكير.
Hizirkirin a min bo diyarî kirrînê dilê jin a min xoşkir.

Hîbûn:j.tên.vi. Lêrahatin. **To gêt used to.** يَعتادُ.
Khendal hîbû çixare kêşanê.
_ :n.j.verbal noun**. Getting used to**. عادة .
Hîbûn a Khendalî bo çixare kêşanê,karek ne baş bû.

Hîkirin: j.tê.vt. Pêvekirin. **To make used to.** يُعَوِّدُ.
Hevalan ez hîkirim çixare kêşanê par.
_ :n.j.verbal noun. **Habituation, Accustoming.** تَعويد.
Hîkirin a min bo çixare kêşanê heval pê rabûn.

Hînbûn: j.tên.vi. 1.fênikbûn. **To cool.** يَبرُدُ
2.hîbûn. **To accustom to, To get used to.** يَعتادُ.
1.Bi baweşînkirinê jora me hînbû.
2.Ez hînbûm qehwevexuarinê.
_ :n.j.verbal noun**. 1.Coolness.** لا حار وَلا بارد
2.Accustoming. عادة، تَعَوّد
1.Hînbûn a jorê, baweşîn pê rabû.
2.Hînbûn a qehwevexuarinê ne başî bû min kirî.

Hînkirin: j.tê.vt. 1.Fênikkirin. **To make cold.** **يُبَرِّدُ**
2.**To accustom to.** **يُعَوِّد**
1. Baweşînê jor hînkir.
2.Aramî ez hînkirm çixarekêşanê.
_ :n.j.verbal noun. 1.**Cooling.** **تَبريد** 2.**Accustoming.** **تَعويد**.
1.Hînkirin a jorê dilê me xoşkir.
2.Hînkirin a çxarekêşanê ez alozkirim.

Hîvîkirin: j.tê.vt. Tikakirin. **To hope.** **يَتَرَجّى**.
Azadî hîvîkirin,ku bib/e/it endamê komele ya nivîskaran.
_ :n.j.verbal noun. **Hope.** **تَرَجّي ، رَجاء**.
Hîvîkirin a Azadî sergirt.

Hoşdarbûn: j.tên.vi. Agdarbûn, Zanîn. **To warn.** **يُنذَر، يُبَلَّغ**
Beyar hoşdarbû bo wexerê sube.
_ :n.j.verbal noun. **Warning**. **إنذار، تَبليغ**
Hoşdarbûnê hêla Beyar xu amadebikit bo wexerê.

Hoşdarkirin: j.tê.vt. Agadarkirin, Pêhesandin.**To warn.** **يُنذِرُ،يُعلِمُ**
Hevalî Beyar hoşdarkir bo wexerê.
_ :n.j.verbal noun. **Warning.** **إنذار**
Hoşdarkirinê hêla Beyar xu amadebik/e/it.

Hulisandin: j.tê.vt. Xilîskandin, tehisandin. **To slide.** **يُزَحلِقُ**.
Salarî xu hulisand li ser befrê.
_ :n.j.verbal noun. **Slide, sliding.** **تَزَحلُق**.
Hulisandin a li ser befrê xoşe bo mindalan.

Hulisîn: j.tên.vi. Tehisîn, Xilîskîn. **To slide.** **يَتَزَحلَقْ**.
Şehbaz hulisî li ser befrê lingê wî derizî.
_ :n.j.verbal noun. **Slide, sliding.** **تَزَحلُق**.
Hulisîn a Şehbazî, ew gelek êşand.

Husûn (husuîn): j.tê.vt. 1.**Hulîkirin.** **To polish.** **يَصقُلُ**
2.Tîjkirin. **To sharpen.** **يَحِدُّ، يَشحَذ**.
1.Xecê binê xanî hunî bi ax sorê û paşî husû(husuî).
2.Min kêrik husuî bi hesanî da tîjbib/e/it.
_ :n.j.verbal noun. 1.**Polishing.** **صَقلْ،** .2.**Sharpening.** **شَحذ**.
1.Husuîn a binê xanî Xecê pê rabû.
2.Husuîn a kêrkê ez pê rabûm.

Hûrbûn(huîrbûn): j.tên.vi. Parçebûn. **To crumble.** يَتَفَتَّتُ.

Perdax ji destê min kevt hûrbû(huîrbû).

_ :n.j.verbal noun. **Crumbling.** تَفَتُّتْ.

Hûrbûn a perdaxî ji berbûnê bû ji destê min.

Hûrkirin(Huîrkirin): j.tê.vt. Parçekirin. **To crumble.** يُفَتِّتُ.

Zemê nan hûrkir (huîrkir) bo nav nîskê.

_ :n.j.verbal noun. **Crumbling.** تَفتيت.

Hûrkirin a nanî di nîskê de nîsik xoşkir.

Î

Înan(Anîn): j.t.vt. Hênan. **To bring. يَجلُبُ** .

Min dînarek îna bo te. Min diyarîyek îna bo jin a te.

_ :n.j.verbal noun. **Bringing. جَلِب، اِحضا ر** .

Înan a diyarîyê karek başbû min kirî.

J

Jandan: j.tê.vt. gelek êşan. **To hurt, to pain.** يَتَأَلَّمُ، يَتَوَجَّعُ
Heker qunêrê janda,divêt bihê derkirin.
_ :n.j.verbal noun. **Hurt, pain.** أَلَمْ، وَجَعْ .
Jandan a qunêrê, mirov xu li bernagir/e/it.

Jankirin: j.tê.vt. Gelek êşan. **To cause pain.** يُؤْلِم، يوجِعُ .
Brînê da bin,lewma jankir. Brîn xewinî,lewma jankir.
_ :n.j.verbal noun. **Pain.** ألَم شَدَ يد .
Jankirin a birînê, ji xewinînê çêbû.

Jaravkirin: j.tê.vt. Av lêkirin, Bi avê şûştin. **To rinse. To wash.** يَشطفُ
Zînê aman şûştin; paşî jaravkirin.
_ :n.j.verbalnoun. **Rinsing, Washing.** شَطِفْ، غَسِلْ
Jaravkirinê aman paqijkirin.

Jarbûn: j.tên.vi.Perîşanbûn.**To become poor, to need.** يَعتازُ .
Dirawsê min ji bê karîyê jarbû.
_ :n.j.verbal noun. **Poverty,need.** عَوَز، فِقر، حاجة .
Jarbûnê dirawsê min nesaxkir.

Jarkirin: j.tê.vt. Perîşankirin. **To lack.** إعتِياز .
Bê karîyê gelek kes jarkirin.
_ :n.j.verbal noun. **Lack.** عَوَز .
Jarkirin a gelek kesa, ji bê karî ye.

Jehirdan: j.tê.vt.Zehirdan.**To poison.** **يُسَمِّمُ .**
Nazê hewya xu jehirda, pê mir.
_ :n.j.verbal noun. **Poisoning.** تَسَمُّم .
Jahirdan a mirovan karê bê mejîyan e.

Jehirkirin: j.tê.vt. zehirkirin. **To be poisont.** يَتَسَمَّم.
Pêxasekê kanî ya gundî jehirkir.
_ :n.j.verbal noun. **Poisoning.** تَسَمُّم.
Jehirkin a kanîyan ne karê mirovan e.

Jengîbûn: j.tên.vi. Zengîbûn. **To rust.** يَتَصَدَّؤُ.
Şîşkên asinî hemû jengîbûn li ber baranê.
_ :n.j.verbal noun. **rust**. تَصَدُّءْ.
Jengîbûn a asinî ji ber barîn a baranê bû.

Jengîgirtin: j.tê.vt. Zengîgirtin. **To be rusty.** يَتَصَدَّؤُ **.**
Salar, şîşkên jengîgirtî ne kire!
_ :n.j.verbal noun. **Rusty.** تَصَدُّؤْ **.**
Jengîgirtin a şîşkan bihayê wan kêmdike.

Jenîn: j.Tê.vt. Hejan. **To vibrate.** يَتَرَدَّدُ، يَهتَزُّ.
Pembîjen bi jihê pembî dijene.
_ :n.j.verbal noun. **Vibration.** اِهتِزا ز.
Jenîn a pembî bo nivîn çêkirinê ye.

Jêbirin: j.tê.vt. 1.dorandin. **To make lose,** يُخَسِّرُ
2.Nehêla. **To rub out.** يَمحُ
1.Min û Bijarî perkanê kir,min pênc dînar jêbirin
2.Min navê xu li ser destê xu nivîsî;paşî min jêbir.
_ :n.j.verbal noun. 1.**Loss.** خَسارة **.** 2.**Rubbing out.** مَحُ.
1.Jêbirin a pênc dînara ji Bijarî xoşbû.
2.Jêbirin a nivîsînê ji destî,dest paqijbû.

Jêçûn: j.tê.vt.1.Dorandin.**To lose.** يَخسَرُ 2.Jêbirin. **To remove.** يُزيلُ
1.gulê dînarek jêçû,ser lê gêjbû.
2.Piçek kiz kevt ser huçkê min,bi şûştinê jêçû.
_ :n.j.verbal noun.1.**loss.**خسا رة. 2.**Removal.** إزالة.
1.Jêçûn a paran ser pê gêjdib/e/it.
2.Jêçûn a kizî ji cilkan,dil pê xoşdib/e/it.

Jêgeztin: j.tê.vt. Hat êşandin, Dilman. **To be impressed.** يَتَأ ثَرُ
Cangîrî gotinek got Arî, Arî jêgezt.
_ :n.j.Verbal noun. **Being impressed.** تَأَثُر
Jêgeztin a Arî ji Cangîrî ji ber gotinekê bû.

Jêhelçûn: j.tên.vi. Bi ser kevt. **To climb. يَصعَدُ**.
Ez jêhelçûm bi çiyayî ve ta ez gehiştim Şeranşê.
_ :n.j.verbalnoun. **Climb. صعود**.
Jêhelçûn bi çiyayî ve bi piyan ne sanahî ye.

Jêkêşan: j.tê.vt. Jê derînan. **To draw. يَسحَبُ**
Ez çûm bo banqê, min sed dînar jêkêşan.
_ :n.j.Verbal noun. **Drawing. سَحِبْ**
Jêkêşan a sed dînara ji banqê bo kirrîn a cilan bû.

Jêkirin:j.tê.vt. Birrîn. **To cut, يَقطَعُ**.
Jijî kurî ya marî jêkir.
_ :n.j.verbal noun. **Cut. قطعْ**.
Jêkirin a kurî ya marî jijî pê rabû.

Jêkpejalebûn: j.tên.vi. Belavbûn. **To scatter. تفرَّقوا**
Gundî jêkpejalebûn ji tirsa bayê jehrî.
_ :n.j.Verbal noun. **Scattering. تفرُّقْ**
Jêkpejalebûn a gundîyan ji tirsa bayê jehrî bû.

Jêman: j.tê.vt. Li paş man. **To inherit, To leave behind. يَترُكُ إرثاً**
Hazim beg mir,bîst û du gund jêman.
_ :n.j.verbal noun. **Inheritance. إرثْ**.
Jêman a Hazim begê gund û erd bûn.

Jêrdestbûn: j.tên.vi.Bindestbûn. **To submit to, To yield. يَخضَعُ ل**
Sûrîya sal a 1940 jêrdestbû bo Firense.
_ :n.j.verbal noun. **Yield. خِضوع**.
Jêrdesbûn a Sûrîya bo Firense piştî şerê cîhanê yê yekê bû.

Jêrdestkirin: j.tê.vt. Bindestkirin. **To yield. يُخضِعُ ل.**
Inglîzî Erdun jêrdestkir piştî ,Usmanlî şkestin.
_ :n.j.verbal noun. **Yield. خِضوع**.
Jêrdestkirin a Erdunê sal a 1918-ê destpêkir.

Jêvebûn: j.tên.vi.1. Pêve neman. **To separate From. يَنفصِلُ عَنَ**.
2.Hêlan. **To abandon, To give up. يَتَخَلّى عَنَ**.
1. Nîvek kurî ya(duîv ê) marî jêvebû.
2.Ez hevalê Alanî bûm,lê piştî devgirtinekê ez jêvebûm.

_ :n.j.verbal noun. 1.**Separation.** **اِنفِصال** . 2.**Giving up.** **تَخَلّي عَن**
1. Jêvebûn a nîvek kurî ya marî ji jijî çêbû.
2. jêvebûn a min ji Alanî piştî devgirtinê çêbû.

Jêvekirin: j.tê.vt. Birrîn. **To cut up,** **يَفصِلُ، يَقطَعُ** .
Jijî bostek ji duîv ê marî jêvekir.
_ :n.j.verbal noun. **Cutting, Cutting off.** **فَصِل، قَطِع** .
Jêvekirin a bostek ji duîvê marî jijî pê rabû.

Jiberkirin: j.tê.vt. Xuandin a bê pirtok. **To memorize.** **يَحفظ** .
Qutabî wane(ders) jiberkir.
_ :n.j.verbal noun. **Memorizing.** **حِفِظ** .
jiberkirin a Wane yê zîrekî ye.

Jibîrêçûn: j.tên.vi. Na hê bîrê. **To forget.** **لا يَتَذَكَّر، يَنسى** .
Zînê çû mala heval a xu jibîrêçû silav bike wê.
_ :n.j.verbal noun. **Forgetting.** **نِسيان** .
Derdê jibîrçûnê Pîr a Nizarî girt li pîrîyê.

Jibîrkirin: j.tê.vt. Nema li bîrê. **To forget.** **يَنسى** .
Nerîman çû bo Elemaniya û heval jibîrkirin.
_ :n.j.verbal noun. **Forgetting.** **نِسيان، نَسي** .
Jibîrkirin a hevalan nesaxî ye.

Jihişçûn: j.tên.vi. Ageh ji xu nema. **To faint.** **يُغمى عَلَيه** .
Dema Hejarî babê xu dîtî,ji hişçû.
_ :n.j.verbal noun. **Faint.** **إغماء** .
Jihişçûn a Hejarî bêyî destê wî bû.

Jinavbirin: j.tê.vt. Çu jê nehêlan, hemû kuştin. **To annihilate.**
يُهلِكُ، يُبيدُ.
Kitikekê di jorekê de, deh mişik jinavbirin.
_ :n.j.verbal noun. **Annihilation.** **اِبادة** .
Jinavbirin a mişkan kitik pê rabû.

Jinînan(jinanîn): j.tê.vt. Şuîkir. **To marry.** **يَتَزَوَّجُ** .
Şemalî jinîna û ji malbabê derçû.
_ :n.j.verbal noun. **Marriage.** **زَواج** .
Jinînan a Şemalî dilê dêbab ên wî xoşkirin.

Jinmarekirin: j.tê.vt. Jin û mêr lêk helalkirin. **To contract a marriage. يَعقِدُ قِرانا**
Heker tu jinê bînî , dê çî dadgehê bo jinmarekirinê.
_ :n.j.verbal noun. **Contraction of marriage. عَقدُ قِران** .
Jinmarekirin a Şemalî li dadgehê bû.

Jinxuaztin: j.tê.vt. gote babê, kiça xu bide min! **To get engaged to. يَخطبُ فتاتا**
Babê Hevalî jinxuazt bo wî.
_ :n.j.verbal noun. **Engagement. خُطوبة، خُطبة** .
Jinxuaztin a Hevalî roj a Şembîyê bû.

Jirengdîtin: j.tê.vt. Biservedîtin. **To be suitable for. يَليقُ، يُلائمُ**
Şemalî kiça xu da Dildarî,çiku jirengdît.
_ :n.j.Verbal noun**. Suitable**. **لائق، كُفُوْ**
Jirengdîtinê hêla Şemal kiça xu bid/e/it Dildarî.

Jirêbirin: j.tê.vt. Xapandin. **To deceive, To cheat. يَخدَعُ** .
Guhdarî Zêrevan Jirêbir û pênc dînar jê çeqandin.
_ :n.j.verbal noun. **Deception, Cheating. خِداعْ** .
Jirêbirin a Zêrevanî Guhdar pê rabû.

Jirêderkevtin: J.tê.vt. Rê berdan bi şaşî. **To deviate from. يَنحَرفُ عَن الطريق**
Şemendefer (tirên) Ji rêderkevt û wergera.
_ :n.j.verbal noun. **Deviation. اِنحِراف عن الطريق** .
Jirêderkevtin a tirênê, tirên wergerand

Jivandan: J.tê.vt. Demek diyarkirin bo gehiştin hev .**To promise. يَعِدُ**
Azadî û Aramî jivandan biçin bo Amedê serê mangê.
_ :n.j.verbal noun.**promise. وَعدْ** .
Jivandan a Azadî û Aramî bi cih(cî) hat.

Jiyan: j.tên.vi. 1.Dimînin sax. **To live. يَعيشُ،يَحيى**
2. Akincîbûn. **To reside in. To dwell. يُقيمُ، يَسكُنُ** .
1.Ez dixum da bijîm.
2.Bijar dijît li zaxoyê.

_ :n.j.verbal noun. **1.Living, life.** عَيشْ، حَياة .2.**Dwelling**. سَكَن
1.Jiyan a zarok ên sava li ser şîrî ye.
2.Jiyan a Bijarî li zaxoyê ye.

Jiyandin: j.tê.vt. Ne hêlan bimrit. **To animate. To bring to life.** يُحيي
Kejê nîv mirî bû noşdarî jiyand ve.
_ :n.j.verbal noun. **Animation.** إِحياء .
Jiyandin a Kejê noşdar pê rabû.

Jîrbûn: j.tên.vi. Zîrekbûn. **To be□ome □ntelligent.** يَصبَحُ ذَكياً*i*
gi□a yên Nizarî he□û jîrbûn.
_ :n.j.verbal noun. **Intelligence.** ذكاءْ .
Jîrbûn a birayên Nizarî ji dêbaba ne.

Jîrkirin: j.tê.vt. Zîrekkirin. **To be intelligent.** يَجعَلونَه ذكياً .
Cangîr bi perwerdekirinê jîrkirin.
_ :n.j.verbal noun. **intelligence, Cleverness.** ذكاء .
Jîrkirin a Cangîrî bi perwerdekirinê bû.

Jordabirin: j.tê.vt. Birin bo serewe. **To go up.** يَصعدُ
Hejarî kurê xu jordabir heya serê Çiyê(çiyayî).
_ :n.j.verbal noun. **Going up**. صُعود
Jordabirin a kurikî bo serê çiyayî karek başbû.

Jordaçûn: j.tên.vi. jêhelçûn. **To climb.** يَصعَدُ .
Barzan jordaçû heta serê çiyayî.
_ :n.j.verbal noun. **Climb.** صِعودْ .
Jordaçûn a Barzanî bo serê çiyayî bo xoşîyê bû.

Jordahatin: j.tên.vi. Serevrazbûn. **To go up.** يَأتي للاعلى، يَصعَدُ .
Narîn li serê zuîrî bû,Babê wê jî jordahat nik wê.
_ :n.j.verbal noun. **Going up.** صِعود .
Jordahatin a babê Narînê bo nik wê dilê wê xoşkir.`

K

Kan: J.tê.vt. 1. Hejandin. **To shake.** يَخُضُّ
2.henasekêşan. **To breathe.** يَتَنَفَّسُ
1.Sînemê meşk ka.
2. Se dirêjkiri ye dikê/t.
_ :n.j.verbal noun: 1.**Shake.** خَضّْ 2.**Breathing.** تَنَفُّس.
1.Kan a meşkê Sînem pê rabû.
2.Kan a seyî ji westanê bû.

Karkirin: j.tê,vt. Îşkirin. **To work.** يَشتَغِلُ.
Pênc pala li rezê Alanî karkirin.
_ :n.j.verbal noun. **Working.** شُغلْ.
Karkirin a palan du roja kêşa.

Karzan: j.têvt. Îşzan. **To descern.** يَفهَمُ في الشُّغل.
Hemû hosta karzan in.
_ :n.j.verbal noun. **Discerning.** فهيمٌ في الشُّغل.
Karzan a kar girtin bo karkeran.

Kelandin: j.tê.vt. Xavînî jê birin, hêk amadekirin bo xwarinê. **To boil.** يُغلي.
Me hin hêk kelandin bo mêhvanan vê spêdê.
_ :n.j.verbal noun. **Boil, boiling.** غَليان، غلي.
Kelandin a hêkan, em serferazkirin ligel mêhvanan.

Kelîn: j.tên.vi. Ji xavînî kevtin, amadebûn bo xwarinê. **To boil.** يَغلي.
Agir xoş bû hêk zû kelîn.
_ :n.j.verbal noun. **Boil, Boiling.** غَليا ن، غلي.
Kelîn a hêkan gelek ne kêşa.

Kenandin: j.tê.vt. Hêlan bikenin. **To laugh. يُضَحِّكُ**.
Gotin ên xoş em kenandin.
_ :n.j.verbal noun. **Laugh, laughing. ضِحكَة، ضِحِكْ**.
Kenandin a me ji dil bû.

Kenîn: j.tên.vi. Xoşî ya xu diyarkirin bi dengî. **To laugh. يَضحَكُ**.
Ez kenîm,dema Perîyê zerzerkî min vekirî.
_ :n.j.verbal noun. **Laugh, Laughing. ضِحِكْ**.
Kenîn a min li Perîyê xoş hat.

Kesergirtin: j.tê.vt. Diltengbûn. **To grieve. يَحزَنُ، يَغُمُّ**.
Dema min Şemal dîtî kesrgirtî ye,dilê min pê ve ma.
_ :n.j.verbal noun. **Grief.** *Ghamm.* **حُزن، غَمّ.**
Kesergirtin a Şemalî ji desttengî ya wî bû.

Keskbûn: j.tên.vi. Sewzbûn. **To green, To become green. يَخضَرُّ**
Bihar hat, baran barîn, zemîn keskbû.
_ :n.j.verbal noun. **Green, Greenness. خُضرة، اِخضِرار**.
Keskbûn a zemînê dilê me geşkir.

Keskkirin: j.tê.vt. Sewzkirin. **To green, To make green. يَلَوِّنُ بالاخضَر**
Behzadî hemî kursîk ên xu keskkirin.
_ :n.j.verbal noun.**Greenness. تلوين باللون الاخضَر**.
Keskkirin a hemî kursîka, pêşniyara jin a Behzadî bû.

Kevtin: j.tê.vt. Berbûn. **To fall (down). يَقَعُ، يَسقُطُ**.
Nesrîn hilingivt û kevt lê ne êşa.
_ :n.j.verbal noun. **Fall, Falling (down). وقوع، سِقوط**.
Kevtin a Nesrînê ji hilingivtinê bû.

Kezaxtin: j.tê.vt. Qelemkirin. **To clip, To lop. يَشذُبُ، يُقَلِّمُ**.
Min pale girtin da mêwan bikezêxin.
_ :n.j.verbal noun. **Clip, Lop. شَذِب، تَقليم**.
Kezaxtin a rez ê tirî sê roja kêşa.

Kêmbûn: j.tên.vi. Jê çûn. **To become less, To decrease. يَنقُصُ**.
Havînan av ên celalan kêmdibin.
_ :n.j.verbal noun. **Decrease. نَقصْ.**
Kêmbûn a av ên celalan ji kêm baranî ye .

Kêmkirin:j.tê.vt. Jê birin. **To decrease. يُنَقِّص.**
Azadî çay vexuarin kêmkir.
_ :n.j.verbal noun. **Decrease. نَقِص**.
Kêmkirin a ça vexuarinê, Azadî sûd jê dît.

Kêşan: J.tê.vt. **1**.Sengandin. **To weight. يَزِنُ**
2.Raxuşan. **To draw. يَسحَبُ**
1.Nehroyî xu kêşa derkevt 70-ê kîlo.
2.Avanî ne şiya darî hilgir/e/it,kêşa ta malê.
_ :n.j.verbal noun. **1.Weighing. وَزن** .**2.Drawing. سَحِب، سَحِل**.
1.Kêşanê Nehro piştrast kir.
2.Avanî bi kêşanê dar gehand malê.

Kifkirin: J.tê.vt. kilmîş firêdan. **To blow ones nose. يَمخَط**.
Şenê kifneke erdê kirête! Şenê kifke nav destesirê!
_ :n.j.verbal noun**. (Nasal) Mucus. مَخط، مِخاط.**
Kifkirin a ser erdê kirête.

Kirêkirin: J.tê.vt. Wergirtin/çûn navê/ bi pare. **To rent out, to hire out. يُوَجِّر**.
Hevalî xanîyê Aramî kirêkir bo salekê.
_ :n.j.verbal noun. **Renting out. Hiring out. تَأجير**.
Kirêkirin a xanî ji ne çarî bû.

Kirin : j.tê.vt. Pêkanîn a karekê,. **To do, To act. يَفعَلُ**.
Merdan çû bo mizgeftê nivêj a êvarî kir.
_ : n.j.verbal noun. **Doing, Acting. فِعِل**.
Kirin a nivêjê li mizgeftê karek başe.

Kirrîn: j.tê.vt. Dirav dan pê, wergirtin bi pare. **To buy, To purchase. يَشتَري**.
Nizarî otombîlek kirrî bo kurê xu.
_ : n.j.verbal noun. **Buying, Purchasing.شِراء**.
Kirrîn a otombîlê dilê kurê Nizarî xoşkir.

Kirrkirin: j.tê.vt. Mittkirin, Bêdengkirin. **To silence. يُسَكِّتُ**
Deykê zaro kirrkir,çiku qîjqîjdikir.
_ :n.j.Verbal noun. **Silencing. إسكات**
Bi kirrkirin a zaroyî qîjqîj nema.

Kişkirin:j.tê.vt. Derkirin, derêxistin. **To expel.** يَطرُدُ للطيور
Me mirîşk kişkirin ji bersifkê.
_ :n.j.Verbal noun. **Expulsion.** طرد للطيور
Bi kişkirin a mirîşkan ji bersifkê,bersifk ma xawên.

Kizbûn: j.tên.vi. Lawazbûn. **To weaken, To fail.** يَضعُفُ.
Zarok ji kêm xuarinî kizbû.
_ :n.j.verbal noun. **Weakness, Failing.** ضُعُف.
Kizbûn a zarokî ji kêm xuarinî bû.

Kizkirin: j.tê.vt. Lawazkirin. **To weaken.** يُضَعِّفُ.
Kêm xuarinîyê Cangîr kizkir.
_ :n.j.verbal noun. **Weakening.** ضُعُف ، تَضعيف.
Kizkirin ji kêm xuarinîyê ye.

Koçkirin:j.tê.vt. Barkirin, Çûn. **To depart, To go.** يَرحَلُ
Deh mal hatin koçkirin ji gundê Bêzihê.
_ :n.j.verbal noun. **Departure.** رَحيل
Koçkirin a deh mala jiber neyaretîyê bû.

Kokkirin:j.tê.vt. Xemilandin. **To adorn.** يُزَيِّن
Berbûkîyan bûk kokkirin bo guhaztinê.
_ :n.j.Verbal noun. **Adornment.** تَزيين
Bi kokkirin a bûkê dilê zavayî xoşbû.

Kolan: j.tê.vt. Kûrkirin, zevî xoşkirin. **To dig, To excavate.** يَحفُرُ.
Me rez kola bo gundor çandinê.
_ :n.j.verbal noun. **Digging, Excavation.** حَفِر ،تَنقيب.
Kolanê xak xoşkir bo çandinê.

Kombûn: j.tên.vi. Hatin rex hev, Vecivîn. **To gather, To meet.** يَجتَمِعُ
Komele ya nivîskaran roj a pêncî Nisanê kombû.
_ :n.j.verbal noun. **Gathering, Meeting.** اِجتِماع.
Kombûn a nivîskaran bo zanîn a rewşa aborîyê bû.

Komkirin: j.tê.vt. Civandin. **To gather, to meet.** يُجَمِّع.
Me gundî komkirin bo helbijartin a gizîrî.
_ :n.j.verbal noun. **Gathering, Meeting**. تَجميع.
Di komkirin a gundîyan de gizîr hat helbijartin.

Korebûn: j.tên.vi. Çav lê tarîbûn. **To lose one's sight.** يَفقِدُ البَصَر، يَعمى.
Çavek Cangîrî korebû bi xurîkan.
_ :n.j.verbal noun. **Blind.** فقدُ البَصَر، عَمى
Korebûn a çav ê Cangîrî ji xurîkan çêbû.

Korekirin: j.tê.vt. Çav lê tarîkirin. **To blind.** يُعَمّي، يُفقِدُ البَصَر .
Xurîkan çavek Cangîrî korekir.
_ :n.j.verbal noun. **Blind.** عَمى .
Korekirin a çavek cangîrî ji xurîkan çêbû.

Kudandin: j.tê.vt. Lezkirin di çûnê da. **To hurry.** يَسرُع الخُطى
Lezgînî kudand rêyê, di çûnê da bo gundî.
_ :n.j.Verbal noun**. Hurrying.** تَعجيل،إسراع في الخُطى
Lezgîn zû gehişt gundî, bi kudandinê.

Kunbûn: j.tên.vi. Qulbûn. **To hole, To punch.** يَنثقِبُ .
Binê pêlav a Armancî kunbû.
_ :n.j.verbal noun. **Hole, punch.** ثُقب .
Kunbûn a binê pêlavê gore ya Armancî terkir.

Kunkirin: j.tê.vt.Qulkirin.**To hole, To punch.** يُثقِبُ .
Mişkî heban kunkir bi khotinê.
_ :n.j.verbal noun. **Hole, punch.** ثُقب .
Kunkirin a guhên Zemruîdê noşdar pê rabû.

Kunkunbûn: j.tên.vi. Qulqulbûn. **To bore holes in.** يَنثقِبُ مِراراً
Binê pêlav a kurê min kunkunbû, min havêt(avêt).
_ :n.j.verbal noun. **Boring**. كَثرَةُ الثقوب.
Saxkirin a Erdewanî ji nesaxîyê, karek başbû.

Sebirkêşan: j.tê.vt. Xu ragirtin, Aramkêşan. **To take patience**. يَتَحَمَّلُ
Behram derkirin ji karî;lê sebirkêşa.
_ :n.j.verbal noun. **Patience**. تَحَمُّلْ .
Sebirkêşan a Behramî ew ji nesaxîyan parazt.

Sebirkirin: j.tê.vt. Xu libergirtin. **To be Patient.** يَتَحَمَّلُ .
Arî sebirkir heta gehişt daxuaz a xu.
_ :n.j.verbal noun. **Patience, Endurance**. تَحَمُّلْ .
Sebirkirin a Arî karek baş bû.

Sehobûn: j.tên.vi. Sehwebûn, Şaşbûn. **To err, To make a mistake.** يَتَوَهَّمُ ، يَسهى ، يَخطؤُ
Min viya ez biçim bo malê;lê ez sehobûm, ez çûm bo bazarî.
_ :n.j.verbal noun. **Error, Mistake**. تَوَهُّم ، خَطأ .
Sehobûn baş bû bo min,çiku min şîr kirrî.

Sehokirin: j.tê.vt. Şaşkirin. **To be wrong**. يُوَهِّمُ، يُخطِئُ .
Ez da çim bo Sêmêlê min sehokir ez çûm bo Dihokê.
_ :n.j.verbal noun. **Wrong, incorrect**. تَوَهُّم، خَطأ .
Sehokirinê ne hêla ez biçim bo Sêmêlê.

Semakirin: j.tê.vt. Dawetkirin, Helperkandin. **To dance**. يَرقُصُ .
Me li gundî semakir heya nîv a şevê.
_ :n.j.verbal noun. **Dancing**. رَقِص .
Bi semakirinê tenduristî ya mirovî başdib/e/it.

Sengandin: j.tê.vt. Kêşan. **To weight**. يُثَقِّلُ، يَزِنُ .
Zêringirî guhar sengandin, derçûn du giram.
_ :n.j.verbal noun. **Weight, Heaviness**. ثُقْلْ، وَزَن .
Sengandinê biha da zanîn.

Seradan: j.tê.vt. Serveçûn. **To visit, To pay a visit**. يَزورُ .
Gulê bêje seradan ne bêje seredan.
_ :n.j.verbalnoun. **Visit**. زيارة .
Seradan a nesaxan pêdivê ye.

Serlêberdan: j.tê.vt. Paşguhîêxistin. **To neglect, To omit**. يُهمِلُ .
Serdarî hevalê xu serlêberda,çiku direwker bû.
_ :n.j.verbal noun. **Neglect**. إهمال .
Serlêberdan a heval ên ne baş pêwîst e.

Serbestbûn: j.tên.vi. Ji bin destîyê derçûn. **To be independent.** يَستَقِلُّ, يَنالُ الاِستِقلال .
Miletê kurd nêzîke serbestbib/e/it.
_ :n.j.verbal noun. **Independence**. اِستِقلال
Serbestbûn a miletê kurd daxuaza hemû kurda ne

Serbestkirin: j.tê.vt. derçûn ji bindestîyê. **To become independent.** يَمنَحُ الاِستِقلال
Inglîzî Pakistan serbestkir di çerx a 21-ê de.
_ :n.j.verbal noun. **Independence**. مَنحُ الاِستِقلال، اِستِقلال .
Serbestkirin a Pakistanê di çerx a 21-ê de bû.

Serbilindbûn: j.tên.vi. Serberzbûn. **To rise high, To raise**. يَتَرَفَّعُ،يَتَسامى
Em serbilindin bi naskirin a Serok Barzanî.
_ :n.j.verbal noun. **Raise.** تَسامي، تَرَفُّع .
Serbilindbûn a me bi naskirin a Serok Barzanî bû.

Serbilindkirin: j.tê.vt. Serberzkirin. **To raise**. يَرفعُ شَأنَه .
Hevaletî ya we em serbilindkirin.
_ :n.j.verbal noun. **Raise**. رَفعُ الشَّأن .
Serbilindkirin a me ji xuandinê çêbû.

Serbirrîn: j.tê.vt. Serjêkirin, Mirandin. **To murder**. يَذبَحُ .
Serjêkerê pezî deh berx serbirrîn bo cejnê.
_ :n.j.verbal noun. **Murdering**. ذَبحْ .
Serbirrîn a pezî bo goştî bû.

Serferazbûn: j.tên.vi. Azadbûn. **To liberate from**. يَتَحَرَّرُ .
Piştî serhildan a sal a 1991-ê kurd serferazbûn.
_ :n.j.verbal noun. **Liberty**. **تَحَرُّرْ .**
Serferazbûnê kurd bo pêşvebirin.

Serferazkirin: j.tê.vt. Azadkirin. **To become liberated**. **يُحَرِّرُ .**
Barzanîyê nemir kurd serferazkirin.
_ :n.j.verbal noun. **Liberation**. تَحرير .
Serferazkirin a kurdan, kurd pêşvebirin.

Sergêjbûn: j.tên.vi. Serxoşbûn. **To be giddy**. يَدوخ .
Qehreman sergêjbû,dema mey vexuarî.
_ :n.j.verbal noun. **Giddiness**. **دوخة .**
Sergêjbûn a Qehremanî ji vexuarin a meyê çêbû.

Sergêjkirin: j.tê.vt. Serxoşkirin. **To giddy**. يُدَوِّخ .
Hevalan babê Segvanî sergêjkirin bi meyê.
_ :n.j.verbal noun. **Giddiness**. دوخة .
Sergêjkirin a babê Segvanî heval pêrabûn

Serhejandin: j.tê.vt. Gotin ne! **To refuse**. **يَرفُض .**
Gotin Danî were şîvê bixu!Danî serhejand.
_ :n.j.verbal noun. **Refusal**. رَفِض .
Bi serhejandnê zanîn Danî ne birsî ye.

Serhilbûn: j.tên.vi. Dîtin bo car a yekê. **To discover**. يَكتَشِفُ .
Řojhelat û rojava ya Emrîka derya ne;Kolombos ê gemîvan di geranekê de serhilbû bo yekem car.
_ :n.j.verbal noun. **Discovering**. اِكتِشاف .
Serhilbûn a Emrîka, Kiristof kolombos pêrabû.

Serhildan: j.tê.vt. Raperîn. **To move suddenly and rapidly.** يَنطَلِق،يَنتَفِضْ
Cemawerê Ranyayê, serhildan di sêyî adar a 1991-ê de.
_ :n.j.verbal noun. **Uprising**. اِنتِفاضة، ثورة .
Serhildanê kurdistan azadkir.

Serincdan: j.tê.vt. **1**.Kuîr lê nêrrîn. **To examine carefully**. يُدَقِّقُ
2.Dîtin,Bînîn. **To observe**. يُشاهِد .
1.Pirtûk hat serincdan,berî çapkirinê.
2.Arî vîya peykerê Barzanî yê nemir serincbide.
_ :n.j.verbal noun.1.**Inspection.** تَدقيق **.2.Observing**. مُشاهَدة
1.Pûtê bidin serincdan a pirtûkê!
2.Serincdan a Arî bo peykerî lê xoşhat.

Serjêkirin: j.tê.vt. Serbirrîn. **To slay, To slaughter**. يَذبَحُ .
Darî berxek da serjêkirin bo mêhvanan.
_ :n.j.verbal noun. **Slaying, Slaughtering**. ذَبح .
Serjêkirin a berxî dilê mêhvanan xoşkir.

Serkevtin: j.tê.vt. Derçûn, bidestvehatin. **To succeed, To pass an examination.** يفوزُ، يَنجَحُ.
Azad di berêkaneyê de serkevt. Arî di taqîkirinê de serkevt.
_ :n.j.verbal noun. **Success, Prosperity**. فوز، نَجاح .
Serkevtin xoş e di berêkaneyê de û di taqîkirinê de.

Serkêşan: j.tê.vt. Ajotin. **To lead, To drive**. يَقودُ .
Danî suyar e li kerî û deyk a wî serîdikêşe .
_ :n.j.verbal noun. **Lead, Driving**. قِيادة .
Serkêşan a kerî asan e.

Serlêşêwan: j.tê.vt. Nizanîn çibikin, man heyrî. **To hesitate**. يَتَرَدَّدُ، يَحتارُ
Beyar di bersivdan a pirsekê de serlêşêwa.
_ :n.j.verbal noun. **Hesitation**. تَرَدُّد، حيرة .
Serlêşêwan a Beyarî ji ber ne zanîn a bersivê bû.

Serlêtêkçûn: j.tên.vi. Ma heyrî. **To be confused**. يَرتَبِكُ .
Nizarê şagird serlêtêkçû di taqîkirinê de.
_ :n.j.verbal noun.**Confusion.** اِرتِباك **.**
Serlêtêkçûn a Nizarî ji ber ne nivistinê bû.

Serlêtêkdan: j.tê.vt. Gêjkirin. **To confuse**. يُربِكُ، يُحَيِّرُ .
Sîrwan, mamê te, pîr e, serîlêtêknede!
_ :n.j.verbal noun. **Confusing**. اِرباك .
Serlêtêkdan a mamê Sîrwanî,Sîrwanî egerek pê hebû.

Serlêxuran: j.tê.vt. Wîstin, Viyan. **To desire**. يَشتاقُ، يَرغَبُ .
Dîdarî serlêxura hespek kirrî.
_ :n.j.verbal noun. **Desire**. اِشتِياق، رَغبة .
Serlêxuranê hêla Dîdar hespî bikirr/e/it.

Sermagirtin: j.tê.vt. Persîvgirtin. **To be cold, To chill.**' يَزكُمُ، يَبرُدُ
Pesar mangê carekê sermadigir/e/it.
_ :n.j.verbal noun. **Chill**. زُكام، بَرد
Sermagirtin mirovî diêxe nav nivînan.

Sernişîvbûn: j.tên.vi. Serserkîwergeran. **To upset**. **يَنقلبُ رَأساً عَلى عَقِب**
Min kilk a pişîkê bilindkir pişîk sernişîvbû.
_ :n.j.verbal noun. **Upset**. **اِنقِلا ب رَأساً عَلى عَقِب** .
Bi sernişîvbûn a pişîkê,pişîkê newnewkir.

Sernişîvkirin: j.tê.vt. Pêbilindkirin. **To overturn**. **يُقلِبُ رَأساً عَلى عَقِب**
Arî khurî ya kitkê girt û kitik sernişîvkir.
_ :n.j.verbal noun. **Overturn. قلبٌ عَلى عقِب**
Bi sernişîvkirinê, kitikê newnewkir.

Sernixûnbûn: j.tên.vi. wergeran li ser devî. **To overturn. يَنقِلبُ عَلى فوهَتِهِ**
Qepaxk a qazanê sernixûnbû.
_ :n.j.verbal noun. **Overturn**. **قلبٌ عَلى فوهَتِهِ** .
Bi sernixûnbûn a qepaxkê,qepaxk pîsbû.

Sernixûnkirin: j.tê.vt. wergerandin. **To overturn. يَقلُبُ رَأساً عَلى فوهَتِهِ**
Min qepaxk rakir û sernixûnkir.
_ :n.j.verbal noun. **Overturn. قلبٌ رَأساً عَلى فوهَتِهِ** .
Sernixûnkirin a qapaxkê ez pêrabûm.

Serpoşîn: j.tê.vt. Sergirêdan. **To cover (the head). يُغطِّي الرأس** .
Xunavê Serpoşî bi kulavek zêrkirî.
_ :n.j.verbal noun. **Cover (of the head**). **غِطاءُ الرأس** .
Serpoşîn a Xunavê gelek jêdihat.

Serrastbûn: j.tên.vi. Bawerîhatin. **To peace of**. **يَطمَئِنُّ** .
Ez serrastbûm ku Şivanî direw nekir.
_ :n.j.verbal noun. **Peace, Heartsease**. **اِطمِئنان** .
Serrastbûn a min, Şivan ji ber çav ên min ne êxist.

Serrastkirin: j.tê.vt. Bawerîkirin. **To assure**. **يُطمئِنُ** .
Min Dilêr serrastkir,ku ez dê jinê bo wî xuazim.
_ :n.j.verbal noun. **Assurance**. **اِطمِئنان** .
Serrastkirinê dilê Dilêrî xoşkir.

Serşorbûn: j.tên.vi. Şerimkirin. **To Be ashamed**. يَنخَجِلُ .
Gulê serşorbû ji ber direw a wê kirî.
_ :n.j.verbal noun. **Shame**. خَجَلْ .
Heftîyekê gulê ji malê dernekevt ji ber serşorbûnê.

Serşorkirin: j.tê.vt. Dan şermê. **To Shame**. يَخجَلُ .
Direwê Gulê serşorkir.
_ :n.j.verbal noun. **Shame, Shyness**. خَجَلْ .
Serşorkirinê Gulê nesaxkir.

Serşûştin: j.tê.vt. Ser bi av û sabûnê paqijkirin. **To bath.** يَستَحِمُّ .
Zînê serşûşt da biçit seyranê.
_ :n.j.verbal noun. **Bathing**. إستِحمام .
Serşûştinê Zînê ciwankir.

Sertêçûn: j.tên.vi. Mirin. **To die**. يَموتُ، يَهلكُ .
Xemoyî sertêçû di rêgirîyê de.
_ :n.j.verbal noun. **Death**. مَوت، هَلاك .
Sertêçûn a Xemoyî di rêgirîyê de bû.

Serûbinkirin: j.tê.vt. Wergêran. **To turn over.** يَقلُبُ
Gulê nan serûbinkir li ser sêhlê da bihê birajtin.
_ :n.j.Verbal noun. **Turning over.** قَلب، تَقليب
Serûbinkirin a nanî li ser sêhlê ji ber birajtinê bû.

Serveçûn: j.tên.vi. Seradan. **To pay a visit to**. يَزورُ .
Aram vegera ji wexerê, Danî serveçû bo silavkirinê.
_ :n.j.verbal noun. **Visitation**. زيارة .
Serveçûn a Danî dilê Aramî xoşkir.

Servehatin: j.tên.vi. Çûn nik. **To frequent**. يَتَرَدَّدُ على .
Gizîrê gundî gelek mêhvan servedihên.
_ :n.j.verbal noun. **Frequentation**. تَرَدُّد على .
Servehatin a mêhvanan Gizîr hejarkirin.

Serxoşbûn: j.tên.vi. Ereq vexuarin, Sergêjbûn. **To be drunk**. يَسكَرُ.
Şemdîn serxoşbû li şahîyê şevêdî.
_ :n.j.verbal noun. **Drunkenness**. سُكْرْ .
Şerxoşbûnê Şemdîn nivand şevadî.

Serxoşkirin: j.tê.vt. Ereq danê, Gêjkirin. **To intoxicate**. يُسَكِّرُ .
Hevalan Bengîn serxoşkir li şahîyê pêr.
_ :n.j.verbal noun. **Intoxication**. سُكْرٌ .
Bi serxoşkirinê Bengînî hilavêt.

Sewzbûn: j.tên.vi. Keskbûn. **To become green**. يَخضَرُّ .
Baran barîn zemîn sewzbû.
_ :n.j.verbal noun. **Verdancy**. إخضِرار .
Sewzbûnê dîmen ciwankirin.

Sewzkirin: j.tê.vt. Keskkirin. **To become verdant**. يُلَوِّنُ بالاخضَر .
Barîn a baranan zemîn sewzkir.
_ :n.j.verbal noun. **Verdancy**. إخضِرار .
Bi sewzkirin a zemînê seyran mişebûn.

Seyrkirin: j.tê.vt. Nêrrîn, Temaşekirin. **To look at,To see**. يَنظُرُ إلى
Baş seyrbike hespî! berî tu bikirrî.
_ :n.j.verbal noun. **Looking, Seeing**. نَظر، تَبَصُّرْ .
Bi baş seyrkirinê min hesp kirrî.

Silavkirin: j.tê.vt. Silawkirdin. **To salute, To greet**. يُسَلِّمُ عَلى .
Min Behroz dît di rê de û min silavkir ê.
_ :n.j.verbal noun. **Salutation, Greeting.** سَلامٌ عَلى .
Silavkirin li dîwanxanan karek baş e.

Silav vedan: j.tê.vt. Silawwedan.1.**To return greeting**. يَرُدُّ السَّلام
2.Nivêj tewawkirin. **To finish the prayer**. يُنهي الصَّلاة
1.Danî silavkir Arî,Arî silav veda.
2.Darî nivêjkir û silavveda.
_ :n.j.verbal noun.1.**Return greeting** .رَدُّ السَّلا م
2.**Ending the prayer.** إنهاءُ الصَّلاة
1.Silav vedan pêdivê ye.
2.Silav vedan a nivêjê fer e.

Silbûn: j.tên.vi. Torebûn. **To dispute**. يَتَنازَعُ، يَتَخاصَمُ .
Lezgîn û jin a xu silbûn ji hev.
_ :n.j.verbal noun. **Dispute**. نِزاع، خِصام .
Silbûn karê zarokan e.

Silkirin: j.tê.vt. Torekirin. **To dispute**. يُنازعُ، يُخاصِمُ.
Omêdî hevalê xu silkir.
_ :n.j.verbal noun. **Dispute**. نِزاعْ، خِصام.
Silkirin a hevalî ne başî ye.

Simtin: j.tê.vt. Kunkirin. **To punch, to hole, To bore**. يَثقُبُ.
Salarî dîwar simt da borî ya avê têra bib/e/it.
_ :n.j.verbal noun. **Punching, Boring**. ثُقْبْ.
Simtin a dîwarî Salar pêrabû.

Sirrêbirin: j.tê.vt. 1.Qefilîn, Qerisîn. **To freeze.**يَنجَمِدُ
2.mirin. **To die.** يَموتُ
1.Rêvingê şevê, sirrêbir û kevt xestexanê
2.Kulîlk ên rezî sirrêbirin.
_ :n.j.verbal noun.1.**Freeze.**إنجماد .2.**Death.** مَوتْ.
1.Sirrêbirinê rêving gelek êşand.
2.Sirrêbirinê kulîk ne hêlan.

Sistbûn: j.tên.vi. Şilbûn: **To loosen, To relax**. يَرتَخي.
Teng a kurtanê hêstirê sistbû û barê wê kevt.
_ :n.j.verbal noun. **Looseness**. اِرتِخاءْ.
Kevtin a barî ji sistbûn a teng a kurtanî bû.

Sistkirin: j.tê.vt. Şilkirin. **To relax**. يُرخي.
Min teng a kurtanê kerî sistkir.
_ :n.j.verbal noun. **Relaxation**. اِرخاء، تَرَخّي.
Bi sistkirin a teng a kurtanî,kurtan kevt(berbû).

Sizabûn: j.tên.vi. Cezabûn. **To be punished**. يَتَجازى.
Gurî sizabû,çiku av rişt ber derê malê.
_ :n.j.verbal noun. **Punishment**. جَزاء.
Sizabûn a Gurî ji ber av rijtinê bû.

Sizadan: j.tê.vt. Cezadan. **To punish**. يُجازي، يُعاقِب.
Dadgehê Gurî sizada ji ber av rijtinê.
_ :n.j.verbal noun. **Punishment**. جَزاء، عِقابْ.
Sizadan li Gurî ne xoş hat.

Sizakirin: j.tê.vt. Cizakirin. **To Punish**. يَجزي .
Xemo hat sizakirin du cara evê heftîyê.
_ :n.j.verbal noun. **Punishment**. جَزاء، عِقابْ .
Bi sizakirinê Xemo pêveneçû.

Sirîn: j.tê.vi. Jêbirin. **To wipe, To rub, To clean.** يَمحي، يَمسَحُ .
Alanî Textê reş sirî.
_ :n.j.verbal noun. **Wiping, Rubbing, Cleaning**. مَحو، مَسِح .
Sirîn a textê reş Alan pêrabû.

Sîrdan: j.tê.vt. Pivdan. **To incite**. يُحَرِّضُ عَلى .
Behzadî Arî sîrda da şerê Sîrwanî bik/e/it.
_ :n.j.verbal noun. **Incitement**. تَحريض .
Sîrdanê Arî da Qutan bi destê Sîrwanî.

Sîsbûn: j.tên.vi. Spîvebûn. **To turn white**. يَبيَضُّ .
Kelgameş sîsbû ji ber lawazbûnê.
_ :n.j.verbal noun. **Whitening**. إبيضاضْ .
Sîsbûn a rengê Kelgamêşî ji kêm xuînîyê bû.

Sîskirin: j.tê.vt. Spîvekirin. **To whiten**. يُبَيِّضُ .
Kêm xuînîyê rengê Kelgamêşî sîskir.
_ :n.j.verbal noun. **Whitening**. تَبييضْ .
Sîskirinê rengê Kelgamêşî kirêtkir.

Solkirin: j.tê.vt. Nalkirin. **To shoe a horse**. يَنعُلُ .
Pîtanê solker hêstir a me solkir.
_ :n.j.verbal noun. **Horseshoe**. تَنعيلْ .
Solkirinê sim ên hêstrê paraztin ji xuranê.

Sondxuarin: j.tê.vt. Navê Xudê înan. **To swear**. يَحلِفُ .
Dizî li pêş dadwerî sondxuar,ku bizin nedizî ye.
_ :n.j.verbalnoun. **Swearing.** حِلِف .
Sondxuarinê diz ji dadkirinê qurtarkir.

Sorbûn: j.tên.vt. Renglêsorbû. **To become red**. يَحمَرُّ .
Ruî yên Beyarî sorbûn ji şerman.
_ :n.j.verbal noun. **Redness**. إحمِرار .
Sorbûn a ruîyan nîşan a şermê ye.

Sorkirin: j.tê.vt. Rengkirin bi sorî. **To redden**. يُحَمِّرُ.
Gulê kirasê xu sorkir.
_ :n.j.verbal noun. **Redness**. إحمِرار.
Bi sorkirinê kirasê Gulê ciwan bû.

Sotin: j.tê.vt. Agirberdanê. **To burn**.. يَحتَرِقُ، يُحرِقُ
Panzînxane ya Koyê hat sotin. Min gûfang(guîfang) sot.
_ :n.j.verbal noun. **Burning**. حَرْق.
Sotinê ziyanekî mezin gehand panzînxaneyê.

Spîbûn: j.tên.vi. Sîsbûn. **To whiten**. يَبيَضُّ.
Rengê Avanî spîbû Ji tirsan.
_ :n.j.verbal noun. **Whitening**.تَبييض، بَياض.
Spîbûn a rengê Avanî ji tirsan bû.

Spîkirin: j.tê.vt. Sîskirin. **To whiten**. يُبَيِّضُ.
Amanspîkerî aman spîkirin.
_ :n.j.verbal noun. **Whitening**.تَبييض.
Spîkirinê aman nuîkirin.

Standin: j.tê.vt. 1.Wergirtin bizorî. **To overcome.** يَأخُذُ بالقُوَّة
2.Dagîrkirin**. To take by force.** يَحتَلُّ.
1.Rêgirî tifek a Şemalî jê stand.
2.leşkerî sal a 1991-ê di meh a adarê de kerkûk stand.
_ :n.j.verbal noun.1.**Overcome**. إستِحواذ عَلى .2.**Capture**. إحتِلال
1.Standin a tifek a Şemalî,Şemal gêjkir.
2.Standin a Kerkûkê dilê kurdan xoşkir.

Strangotin: j.tê.vt. Strîn. **To sing**. يُغَنّي.
Erdewanî strangotin li Zaxoyê ji êvarî heta nîv a şevê.
_ :n.j.verbal noun. **Singing.** غِناءْ.
Bi strangotinê Zaxoyî li Erdewanî kombûn.

Stirîn: j.tên.vt. Strangotin. **To sing**. يُغَنّي.
Eyas stirî ji êvarî heya nîv a şevê.
_ :n.j.verbaênoun. **Singing**. غِناءْ.
Stirîn a Eyasî dilê guhdaran xoşkir.

Sunetkirin: j.t.vt. Çermikê kîrî birrîn. **To circumcise**. يُختِنْ .
Sunetker zarokan sunetdik/e/it.
_ :n.j.verbal noun. **Circumcision**. خِتان .
Sunetkirin paqijî ye,pêdivê ye bo zarokan.

Supaskirin: j.tê.vt. Malavakirin. **To thank**. يَشكُرُ .
Azadî mêhvandarî bo Botanî kir,Botanî ew supaskir.
_ :n.j.verbal noun. **Thank**. شُكُر .
Supaskirinê Azad dil xoşkir.

Suyarbûn: j.tên.vi. Çûn têda/ serpişt a dewaran. **To ride**. يَركَبُ .
Azad suyarbû li otomobîlê. Danî suyarbû li hêştirê.
_ :n.j.verbal noun. **Ride**. رُكوبْ .
Suyarbûn a hêştirê li Danî xoşhat. Suyarbûn li tirênê xoşe.

Suyarkirin: j.tê.vt. Danan li ser pişt a dewaran. **To ride,** يُرَكِّبْ عَلى
Botanî, Danî suyarkir li hêştirê. Azadî, Dîlan suyarkir li tirênê.
_ :n.j.verbal noun. **Ride**. ركوبْ .
Suyarkirin li hêştirê li Danî xoşhat. Suyarkirin li tirênê, Dîlanî pêxobû.

Sûzdan: j.tên.vi. Jivandan. **To promise.** يَتَعَهَّدُ، يَعِدُ
Min sûzda Şirînê,ez çîrokê bo wê binivîsim.
_ :n.j.verbal noun. **Promise.** وَعِد، عَهِدْ
Min sûzdan bicih anî ligel Şirînê.

Ş

Şabaşdan: j.tê.vt. Pare kirin diyarî. **To donate**. يَهبُ نِقوداً .
Hemî dawetîyan şabaşdan.
_ :n.j.verbal noun. **Donation**. مِنحَة، هِبة .
Şabaşdan hîbûn e li dawetan.

Şabaşwergirtin: j.tê.vt. Diyarî wergirtin. **To take donation**. يَأخُذُ الهِبة
Zirnabêjî şabaşwergirtin li dawetê.
_ :n.j.verbal noun. **Taking donation**. أخذُ الهبة .
Şabaşwergirtin li dawetan zirnabêj pêradib/e/it.

Şahbûn: j.tên.vi. Lêxoşhatin. **To be glad at**. يَسُرُّ، يَفرَحُ .
Nizar şahbû bi derçûn a kurê xu.
_ :n.j.verbal noun. **Gladness**. سرور، فَرَحْ .
Şahbûn a Nizarî bi derçûn a kurê wî bû.

Şahkirin: j.tê.vt. Dilxoşkirin. **To gladden, To cheer**. يُفرِّحُ .
Min kurê xu şahkir bi kirrîn a otombîlekê.
_ :n.j.verbal noun. **Gladness, Happiness**. سرور، فَرَحْ .
Şahkirinê kurê min handa bo xuandinê.

Şahîkirin: j.tê.vt. Semakirin, Dawetkirin. **To dance**. يَرقصُ .
Xortan şahîkir ji êvarî heta nîv a şevê.
_ :n.j.verbal noun. **Dancing**. رَقِصْ .
Şahîkirin werzişe,bo tenduristîyê başe.

Şandin: j.tê.vt. Hinartin, Nardin. **To send**. يَرسِلُ .
Biskê nameyek şand bo mamê xu.
_ :n.j.verbal noun. **Sending**. إرسال .
Şandin a nameyê dilê mamê Biskê xoşkir.

Şarandin: j.tê.vt. Gerimkirin. **To Become hot, To heat. يُحَمّي** .
Gulê tenûr şarand. Xecê dawet şarand. Sêvê axavtin şarand.
_ :n.j.verbal noun. **Warmth, Hotness. حَماوة** .
Şarandin a tenûrê nan zû da birajtin. Şarandinê dawet xoşkir.

Şaşbûn: j.tên.vi. Helebûn. **To mistake. يُخطوْ** .
Ez şaşbûm di xuandin a inglîzî de.
_ :n.j.verbal noun. **Mistake, error. خَطأ** .
Şaşbûnê ez dam şermê.

Şaşkirin: j.tê.vt. Helekirin. **To mistake. يَخطوْ** .
Min hin şaşî kirin di taqîkirinê de.
_ :n.j.verbal noun. **Mistake. خَطأ** .
Şaşkirinê ez paşxistim di taqîkirinê de.

Şehkirin: j.tê.vt. Şanekirin. **To comb, To card. يُمَشّط** .
Min serê xu şehkir li ber xudîkê(awêneyê).
_ :n.j.verbal noun. **Combing, Carding. تَمشيط** .
Şehkirin a pirçê ez lawkirim.

Şehitandin: j.tê.vt. Çirmisandin. **To fade, To wither. يَذبُل** .
Dest lêdanê fiçik şehitandin.
_ :n.j.verbal noun. **Withering. ذِبول** .
Berhem kêm dibe bi şehitandin a fiçikan.

Şehitîn: j.tên.vi. Çirmisîn. **To fade, To wither. يَذبُل** .
Gelek fiçik şehitîn û hatin avêtin îsal.
_ :n.j.verbal noun. **Withering. ذِبول** .
Şehitîn a fiçkan verêj kêmkir.

Şelalkirin: j.tê.vt. **1.**dirûn bi destî. **To sew by hand. يُخَيِّط باليَد**
2.Kêmkirin, Ji ber hev deranîn. **To diminish. يُقلّل، يُنَقّص**
1.Besê kirasê xu şelalkir;paşî da ber mekînê.
2.Rezvanî spîndar şelalkirin.
_ :n.j.verbal noun.1.**Sewing by hand. خِياطة باليَد**
2.**Diminution. تَقليل، إنقاص**
1.Şelalkirnê drûn bi mekînê asankir.
2.Şelalkirin a spîndaran rezvan pêrabû.

Şelandin: j.tê.vt. Rûtkirin. **1.To rob**. يَسلبُ
2.Ruîskirin. **To take off (clothes).** يَنزَعُ الملابس .
1.Rêgirî Adem şeland.
2.Min xu şeland da xu bişûm.
_ :n.j.verbal noun.1.**Robbing.** سَلِبْ .**2.Taking off.** نَزعُ الملابس
1.Şelandinê Adem jarkir.
2.Şelandin bo ser şûştinê bû.

Şemitandin: j.tê.vt. Tehisandin. **To Slide**. يُزلِقُ .
Tîvilê gundorî piyê min şemitand.
_ :n.j.verbalnoun. **Slide**. زَلَقْ .
Şemitandinê ez êxistim û cil ên min pîsbûn.

Şemitîn: j.tên.vi. Tehisîn. **To slide**. يَنزَلِقُ .
Piyê min şemitî ;lê ez ne kevtim.
_ :n.j.verbal noun. **Slide**. إنزلاقْ .
Şemitînê ez ne êxistim,çiku min xu bi darê ve girt.

Şenekirin: j.tê.vt. Dan bayî bi milhêban. **To winnow**. يَذري .
Bextiyarî coxîn şenekir û genim da rexekê.
_ :n.j.verbalnoun. **Winnow**. تَذرية .
Şenekirin a coxînê genim cudakir ji khayê.

Şepirzebûn: j.tên.vi. Bêserûberbûn. **To jumble**. يَرتَبكُ .
Cangîr şepirzebû li Wanê ji bê diravî.
_ :n.j.verbal noun. **Jumble**. إرباك .
Şepirzebûnê jiyan a Cangîrî ne xoşkir.

Şepirzekirin: j.tê.vt. Bêserûberkirin. **To jumble**. يُربكُ .
Oxerkirin a Lezgînî,ez şepirzekirim li Amedê.
_ :n.j.verbalnoun. **jumble**. إرباك .
Şepirzekirinê ez gêjkirim.

Şeqlêdan: j.t.vt. pêlêdan, teplêdan. **To kick, To slap**. يَصفعُ ، يَركُلُ
Dema Bijarî Gurgîn dîtî, Sê şeqlêdan.
_ :n.j.verbal noun. **Kick, Slap**. صَفعْ ، رَكلْ .
Şeqlêdanê Gurgîn êşand.

Şeqtêhildan: j.tê.vt. Pêhinlêdan. **To kick**. يَركُلُ بالقَدَمْ .
Dema Kovanî Beko dîtî, Şeqtêhildan.
_ :n.j.verbal noun. **Kick**. رَكل بالقدَم .
Şeqtêhildanê Beko Gêjkir.

Şermizarbûn: j.tên.vi. Serlêşêwan. **To blush**. يَخجَلُ ، يَستَحي .
Pesar şermizarbû ligel mêhvanan.
_ :n.j.verbal noun. **Blush**. اِستِحاءْ، خَجَلْ .
Şermizarbûn a Pesarî ligel mêhvanan,Pesar êşand.

Şermizarkirin: j.tê.vt. Dan Şermê. **To shame, To blush**. يُخَجِّلُ يُسَحّي.
Jin a Guhdarî,guhdar şermizarkir ligel mêhvanan.
_ :n.j.verbal noun. **Shame, Blush**. خَجَلْ، اِستِحاء .
Şermizarkirinê dilê Guhdarî ne xoşkir.

Şewitandin: J.tê.vt. Sotin. **To burn**. يُحرقُ .
Agirî du xanî şewitandin li gundî.
_ :n.j.verbal noun. **Burn**. حَرقْ .
Şewitandinê hin gundî hêlan bê xanî.

Şewqdan: j.tê.vt. Ronahîdan. **To light**. يُظيئُ .
Stêr a gulavêjê her sal 15-î tebaxê şewqdid/e/it.
_ :n.j.verbal noun. **Lighting.** إظاءة .
Bi şewqdan a gulavêjê şev fênik dibin.

Şêlan: j.tê.vt. **1**.Xuarin tawandin. **To digest food**. يَهضُمُ
2.Tawandin. **To desolve.** .يُذيبُ
3.Perixandin. **To massage**. يَدلُكُ .
1.Ûr bi çar Katan (se,etan) xuarinê dişêl/e/it.
2.Xecê mast şêla, bû dew(mast aw).
3.deyk a min pişt a min şêla ez tenabûm.
_ :n.j.verbal noun. 1.**Digestion.** هَضم .2.**Desolve.** إذابة .
3.**Rubbing.** دَلكْ، تَدليك
1.Şêlan a xuarinê di ûrî de çêdib/e/it.
2.Şêlan a mastî ligel avê mast ruhinkir.
3.Şêlan a piştê,pişt tenakir.

Şêtbûn: j.tên.vi. Dînbûn. **To become mad**. يَجُنّ .
Mercê tebê girt û şêtbû.
_ :n.j.verbal noun. **Mad**. جنون .
Şêtbûn a Mercê ji tebê çêbû.

Şêtkirin: j.tê.vt. Dînkirin. **To mad, To cause madness**. يُجَنِّنُ .
Mindalan Xanzê şêtkir.
_ :n.j.verbal noun. **Mad**. جنون .
Şêtkirin a Xanzê ji mindalan çêbû.

Şilbûn: j.tên.vi. **1**.Terbûn. **To wet**. يَتَبَلَّلُ .**2**.sistbûn. **To loosen**. يَرتَخي
1.Baran barî,ez şilbûm.
2.Teng a kurtanê kerî şilbû,barê wî kevt.
_ :n.j.verbal noun. 1.**Wetness**. بَلَلْ .2.**Looseness**. إرتِخاء .
1.Şilbûn a min ji barîn a baranê bû.
2.Barê kerî kevt ji ber şilbûn a tengê.

Şilkirin: j.tê.vt. **1**.Terkirin. **To wet.** يُبَلِّلُ .**2**.Sistkirin. **To relax**. يُرخي
1.Baranê ez şilkirim.
2.gevaztin a hêstirê teng şilkir.
_ :n.j.verbal noun.1.**Wetness**. بَلَلْ .2.**Relaxation**. إرتِخاء .
1.Şilkirinê persîv îna min.
2.Şilkirinê kurtan da êxistin.

Şikbirin: j.tê.vt. Gumanbirin. **To doubt**. يَشُكُّ .
Min şikbirin,ku Serhing sîxurîyê dike.
_ :n.j.verbal noun. **Doubt.** شَكّ .
Şikbirin a min di cihê xu da bû.

Şilqan: j.tên.vi. Kan**. To shake, To agitate**. يَنرَجُّ، يَنخَضُّ .
Mast di meşkê de şilqa.
_ :n.j.verbal noun. **Shaking, Agitation**. رَجّ، خَضّ .
Şilqanê mast kir nîvişk(kere).

Şilqandin: j.tê.vt. Kan. **To shake, To agitate**. يَرُجُّ، يَخُضُّ .
Mast hat şilqandin, bû nîvişk.
_ :n.j.verbalnoun. **Shaking, Agitation**. رَجّ، خَضّ .
Bi şilqandin a mastî nîvişk çêbû.

Şirîqandin: j.tê.vt. Qîjandin. **To noise, To cry**. يَصيحُ، يَصرُخُ .
Dema Lawînî mar dîtî şirîqand.
_ :n.j.verbalnoun. **Noise, Cry**. صِياح، صُراخ .
Şirîqandin a Lawînî heval hişyarkirin.

Şirînbûn: j.tên.vi. Ciwanbûn. **To sweeten**. يَحلوْ .
Sînem şirîndib/e/it roj bo rojê.
_ :n.j.verbal noun. **Sweet, Sweetness**. حَلاوة، حِلو .
Şirînbûn a Sînemê ji çav ên wê yên geşin.

Şrînkirin: j.tê.vt. Qendtêkirn. **To Sweeten**. يُحَلّي بالسُّكَر .
Aramî çay gelek şirînkir,nehat vexuarin.
_ :n.j.verbalnoun. **Sweet**. حِلوْ .
Şirînkirin a gelek ne başe bo tenduristîyê.

Şirovekirin: J.tê.vt. Ravekirin. **To explain, To make clear**. يَشرَحُ ، يُفَسِّرُ
Fêrkerî wane şirovekir bo fêrkeran.
_ :n.j.verbal noun. **Explanation**. شَرَحْ، تَفسير .
Şirovekirinê wane asankir bo fêrkeran.

Şirrbûn: j.tên.vi. Dirhan. **To tear**. يَتَمَزَّقُ .
Kirasê Xanzê şirrbibû,milê wê diyarbû.
_ :n.j.verbal noun. **Tear**. تَمَزُّقْ .
Şirrbûn a kirasî,Kiras da avêtin.

Şirrkirin: j.tê.vt. dirandin. **To tear**. يُمَزِّقُ .
Kelemî kiras ê Xanzê şirrkir.
_ :n.j.verbal noun.**Tear.**تَمزيقْ .
Kiras ên şirrkirî dihên avêtin.

Şiyan: j.tên.tê.v.i.t. Karîn. Tiwanan. **Can, To be able to** يَقدَرُ، يَتَمَكَّنُ.
Min şiya ez name ya siwîdî bixuînim. Ez dişêm te bibînim.
_ :n.j.verbal noun. **Ability, Possibility**. قُدرة، تَمَكُّن .
Şiyan a Azadî ji jîrî ya wî ye.

Şîkirin: j.tê.vt. Peyv nasîn di ristande. **To parse, To analyze.** يُعربُ
Fêrkerê rêzimanê sê rist(hevok) şîkirin bo fêrkeran.
_ :n.j.verbal noun. **parsing, Analyses**. إعراب، تَحليل .
Rêzimanzan şîkirinê baş dizanin.

Şînbûn: j.tên.vi. **1**.Zîldan, Riwan. **To grow**..**يَنمو**
2.Ximbûn. **To blue**. **يَزرَقّ**
1.Me tovê gulberojan çand şînbûn.
2.kirasê Qentarê şînbû,dema min dîtî.
_ :n.j.verbal noun. 1.**Growing**. **نمو** .2.**To turn blue**. **زرقة** .
1.Şînbûn a tovê gulberojan dilê rezvanî xoşkir.
2.Şînbûn a kirasê Qentarê ji ber behîyê bû.

Şînkirin: j.tê.vt. Bi reng ê şîn ximkirin. **To make blue**. **يُلوِّنُ بالازرَق**
Qentarê hemû cilên xu şînkirin.
_ :n.j.verbal noun. **Blue**. **تَلوين بالازرق** .
Şînkirin a cilan Bawe(hîbûne) li gund ên deştê.

Şîrdan: j.tê.vt. Memikmêjtin. **To suck**. **يَرضَعُ** .
Nazê kurê xu yê sava şîrda.
_ :n.j.verbal noun. **Suck, Sucking**. **رضاعة** .
Şîrdan a zarok ên sava kar ê deykan e.

Şîrdoşîn: j.tê.vt. Şîr ji memkî derînan. **To milk**. **يَحلُبُ** .
Min bêrîvan dît, şîrdidoşî ji bizinê.
_ :n.j.verbal noun. **Milking**. **حَلبْ** .
Şîrdoşîn karê bêrîvanane.

Şkandin: j.tê.vt. **1**.Parçekirin. **To break**. **يُكسِرُ**
2.Rojîşkandin. **To eat** . **يَفطُرُ**
1.Min perdax şkand.
2.Alanî rojîşkand pêr.
_ :n.j.verbal noun. 1.**Breaking**. **كَسرْ** .2.**breaking fast**. **اِفطار** .
1.Şkandin a perdaxî ez pêrabûm.
2.Rojîşkandin Alan pêrabû.

Şkestin: j.tên.vi. Parçebûn. **To break.** **يَنكَسِرُ** .
Perdax şkest,çiku ji destê min kevt.
_ :n.j.verbal noun. **Breaking**. **اِنكِسار** .
Şkestin a perdaxî bêyî destê min bû.

Şorbûn: j.tên.vi. Dadelan. **To hang down**, **To dangle**. **يَتَدَلّى** .
Dewlik şorbû di bîrê de.
_ :n.j.verbal noun**. Hanging down Dangle**. **تَدَلّي** .
Şorbûn a dewlikê di bîrê de,bêyî dest ê Xecê bû.

Şorişgêran: j.tê.vt. Şergêran. **To revolt against**. يَثورُ .
Miletê kurd 14 sala şorişgêra dijî rijêma iraqê.
_ :n.j.verbal noun**. Revolutionary, Revolutionist**. ثائر، ثورة .
Şorişgêranê kurdistan rizgarkir ji bindestîyê.

Şorkirin: j.tê.vt. dadilandin. **To dangle**. يُدلّي .
Berhemî dewlik şorkir di bîrê de.
_ :n.j.verbal noun. **Dangle**. تَدَلّي .
Şorkirin a dewlikê di bîrê de Berhem pêrabû.

Şûkirin: j.tên.vi. Mêrkirin. Şuîkirin. **To marry, To wed**. يَتَزَوّج .
Nazdarê şûkir,wê pîrozb/e/it.
_ :n.j.verbal noun. **Marriage, Wedding**. زَواج .
Şuîkirin a Nazdarê li hemîyan xoşhat.

Şûnkevtin: j.tê.vt. Li peykevtin. **To follow up**. يَتَعَقَّبُ .
Diz revî, Hêja şuînkevit heta Bêtasê.
_ :n.j.verbal noun. **Go after, Following**. تَعَقُّب .
Şuînkevtin a Hêjayî diz da girtin.

Şûştin: j.tê.vt. Paqijkirin bi av û sabûnê. **To wash**. يَغسِلُ .
Deyk a Nemamê cil şûştin bi cilşûyê.
_ :n.j.verbal noun. **Wash**. غسِل .
Şûştin a cilan karê jinikan e.

T

Tagirtin: j.tê.vt. **1**.Leş gerimbûn. **To sicken**. يَمرَضُ، يَتَحَمّى
2.Lagirtin. **To side with**. يَنحازُ .
1.Min Gulê bir bo xestexanê, çiku tagirtî bû.
2.Kurd li derevey welatî tayê hevdu digirin.
_ :n.j.verbal noun.1.**Sickness**. مَرَض،حُمّى .2.**Favoritism.** اِنحِياز
1.Tagirtin a Gulê ji persîvê bû.
2.Tagirtin ji xuînê ye.

Talankirin: j.tê.vt. Rûtkirin. **To steal**, **To rob**. يَسرُقُ، يَسلُبُ
Leşkerê Seddamî gund ên kurdan talankirin.
_ :n.j.verbal noun. **Robbing**. سَرِقة، سَلبْ .
Talankirin a gundan,gundî handan bo pêşmergatîyê.

Tamkirin: j.t.vt. Çêjtin. **To taste**. يَذوقُ .
Min tamkir xuarinê, genî bû .
_ :n.j.verbal noun. **Tast**. مَذاق .
Tamkirinê hêla ez xuarinê birêjim.

Tapokirin: j.tê.vt. Hat nivîsîn. **To register in land register**. يُسَجِّلُ العِقار
Şamîranê zevî ya xu tapokir.
_ :n.j.verbal noun. **Land register**. تَسجيلُ العِقار .
Bi tapokirinê zevî ya Şamîranê kevt ser navê wê.

Taqîkirin: j.tê.vt. Jêpirsîn, Sehkirin. **To test, To try**. يُجَرِّبُ، يَختَبِرُ
Min xu taqîkir bo taqîkirinê.
Pêlavê taqîbike paşî bikirre.

_ :n.j.verbal noun. **Test, Trial**. تَجربة، إختِبار .
Bi taqîkirinê min amadeyî tewawkir û ez li kolîgê hatim
Pesindkirin.
Bi taqîkirinê min pêlav kirrî.

Tarîbûn: j.tên.vi. Bû be şev, Roj çû ava. **To darken**. يَظلمُ .
Dinya zû tarîdib/e/it li zivistanê. Lempe vemirî jor tarîbû.
_ :n.j.verbal noun. **Darkness**. ظلام .
Tarîbûnê em dakirin di malan de.

Tarîkirin: j.tê.vt. Şevdahatin, Ronahîneman. **To darken**. يُظلّم .
Deyk a min jor tarîkir,da em binivin.
_ :n.j.verbalnoun. **Darkness**. ظلام .
Tarîkirinê ne hêla em hev bibînin.

Tawandin: j.tê.vt. Şêlan, Helandin. **To dissolve**, **To melt**. يُذيبُ .
Şekirê bi tawîne di çayê de . Xuwê di avê de hat tawandin.
_ :n.j.verbal noun. **Dissolving, Melting**. إذابة .
Bi tawandin a şekirê çay şirîn bû.

Tawdan: j.tê.vt. Handan. **To encourage, To incite**. يُشَجّعُ .
Firensîyan tîm a topapêyî tawdan li purtuxalê.
_ :n.j.verbal noun. **Encouragement, Incitation**. تشجيع .
Tawdanê hêla Yewnanî serbikevin di berêkaneyê de.

Tazîbûn: j.tên.vi. Ruîsbûn. **To uncloth, To disrobe**. يَتَعَرّى .
Ez tazîbûm,dema te ez dîtim.
_ :n.j.verbal noun. **Unclothing, Disrobement**. تَعرية .
Bi tazîbûnê persîvê Şivan girt.

Tazîkirin: j.tê.vt. Ruîskirin. **To disrobe**. يُعَرّي .
Avdelî xu tazîkir da serê xu bişût.
_ :n.j.verbal noun. **Disrobement**. تَعرية .
Bi tazîkirinê/ ser dihê şûştin/meleyî dihê kirin.

Tehisandin: j.tê.vt. Helxilîskandin. **To slip**. يُزَلّقُ .
Celal hat bestin Ji serma,Arî xu liser tehisand.
_ :n.j.verbal noun. **Slip**. زَلَقْ .
Tehisandinê Arî êxist pişt a wî êşa.

Tehisîn: j.tên.vi. Helxilîskan. **To slip**. يَنزَلِقُ .
Aram tehisî liser befrê û kevt destê wî êşa.
_ :n.j.verbal noun. **Slip**. زَلَقْ .
Tehisînê Aram gelek êşand.

Temaşekirin: j.tê.vt. Nêrrîn, Seyrkirin.**To see, To look at.** يَنظُرُ إلى
Alan baş xanî temaşebike berî tu bikirrî.
_ :n.j.verbal noun. **Seeing, Looking at**. ألنَظَرٌ إلى
Zaro çûn bo tamaşekirin a hirçê.

Tenabûn: j.tên.vi. **1**.Mitbûn. **To calm**. يَهدَأ
2.Arambûn. **To rest**. يَرتاحُ
1.Êşa piyê Darî tenabû.
2.Darî çar roja tenabû ji karî.
_ :n.j.verbal noun. **1**.**Calm.** هدوء .**2**.**Rest**. راحة.
1.Darî piştî tenabûn a êşê xew lê kevt.
2.Darî piştî çar roj ên tenabûnê vegera ser karê xu.

Tenakirin: j.tê.vt. **1**.Mitkirin. **To calm**. يُهَدِّئ
2.Aramkirin. **To rest.** يُرَيِّحُ
1.Noşdarî Darî tanakir bi dermanî.
2.Cejn a newrozê Darî tenakir ji karî.
_ :n.j.verbal noun. 1.**Calm**. هدوء 2.**Rest**. راحة .
1.Tenakirin a Darî ji êşê, noşdar pêrabû.
2.Tenakirin a Darî ji karî, hatin a Cejn a newrozê bû.

Tengavbûn: j.tên.vi. Bêhinçikbûn. **To become annoyed.** يَنزَعِجُ
Hello tengavbû, dema babê wî hatî girtin.
_ :n.j.verbal noun. **Annoyance.** إنزعاج
Tengavbûnê Hello nesaxkir.

Tengavkirin: j.tê.vt. Bêhinçikkirin. **To annoy.** يُزعِجُ
Hişyarî babê xu tengavkir da jinê bo bîn/e/it.
_ :n.j.verbal noun. **Annoyance.** إزعاج
Tengavkirinê hêla Babê Hişyarî jinê bo wî bînit.

Tengbûn: j.tên.vi. Ji firehî kevtin. **To narrow.** يَضيقُ
Kiras ê min bi şûştinê tengbû.
_ :n.j.verbalnoun. **Narrowness.** ضِيق
Tengbûnê kiras da havêtin.

Tengkirin: j.tê.vt. Ji firehî existin. **To narrow.** يُضَيِّقُ
Ciwanê kirasê Arî yê fireh tengkir ji navtengê.
_ :n.j.verbal noun. **Narrowness.**، تَضييق
Tengkirinê kiras qaydekir bo Arî.

Tengsistîkirin: j.tê.vt. Bêpakîkirin, Dan piştguhî. **To delay.** يُهمِلُ
Bijarî tengsistîkirin bo çûn a Misrê.
_ :n.j.Verbal noun. **Delaying.** إهمال
Tengsistîkirinê Bijar aramkir(tenakir).

Tepeserkirin: j.tê.vt. Riswakirin. **To degrade**. يُذِلُّ ، يُهينُ .
Bilind mirovê jar tepeserneke çuca!
_ :n.j.verbal noun. **Degrade**. إذلال، إهانة .
Tepeserkirin a jaran karek ne başe.

Tepisandin: j.tê.vt. Vemirandin. **To abate, To put out**. يُخَمِّدُ .
Agir berbû xanîyekê li gundî; gundîyan agir tepisand.
_ :n.j.verbal noun. **Putting down**. إخماد .
Tepisandin a agirî gundî pêrabûn.

Tepisîn: j.tên.vi. Vemirîn. **To abate, To go out**. يَخمُدُ .
Agir tepisî,dema xanî hatî sotin .
_ :n.j.verbal noun. **Putting down**. إخماد .
Tepisîn a agirî bê harîkarî çêbû.

Teqandin: j.tê.vt. Peqandin. **To fling, To explode**. يُطلِقُ، يُفجِّرُ .
Pezî gelek mîn teqandin. Şivanî tifek teqand.
_ :n.j.verbal noun. **Flinging, Explosion**. إطلاق، تَفجير .
Teqandina mînan pez pêrabû. Teqandina tifekê Şivan pêrabû.

Teqîn: j.tên.vi. Peqîn. **To explode**. يَنفَجِرُ .
Mînek teqî bizinek kuşt.
_ :n.j.verbal noun. **Explosion.** إنفِجار .
Teqîn a mînê bizin kuşt.

Terabûn: j.tên.vi. Belavbûn. **To scatter**. يَتَبَعثَرُ، يَتَفرَّقُ .
Gundî yên germîyanê terabûn Di enfal a Seddamî de.
_ :n.j.verbal noun. **Scatter, Scattering**. تَبَعثُر، تَفرُّق .
Terabûn a gundîyan ji Tirsê bû.

Terakirin: j.tê.vt. Belavkirin. **To scatter**. يُبَعثِرُ يُفرِّقُ.
Serbaz ên Seddamî gundî yên germîyanê terakirin.
_ :n.j.verbal noun. **Scatter, Scattering**. تَبَعثُر، تَفريق.
Di terakirinê de gelek gundî mirin.

Terbûn: j.tên.vi. Şilbûn. **To dampen, To moisten**. يَبتَلُّ.
Cil ên min terbûn bi barîn a baranê.
_ :n.j.verbal noun. **Damp, Moist**. رَطِب، مُبتَلّ.
Bi terbûn a cilan min sarbû. Terbûnê cil dan guhorîn.

Terkirin: j.tê.vt. Şilkirin. **To dampen, To moisten**. يُبَلِّلُ ، يُرَطِّبُ.
Barîn a baranê cil terkirin.
_ :n.j.verbal noun. **Damp, moisture**. رَطب، رُطوبة.
Terkirinê cil dan êxistin.

Terxankirin: j.tê.vt. Bijartin, Jêgirtin. **To prefer to, To favour.** يُفضِّلُ، يَختارُ
Armancî hespê boz terxankir.
_ :n.j.verbal noun. **Preference (to). favouring.** تَفضيل، إختِيار.
Terxankirin a hespê boz Armanc pêrabû.

Tewşlêdan: j.tê.vt. Rexnegirtin. **To Fault, To blame**. يُعيبُ، يَنتَقِدُ
Luqman nivîskar e, şaşîyan dike;Aramî tewşlêdan.
_ :n.j.verbal noun. **Fault, Blame**. تَعييب، اِنتِقاد.
Bi tewşlêdanê,şaşî yên Luqmanî kêmbûn.

Teyisandin: j.tê.vt. Biriqadin. **To shine**. يُلَمِّعُ.
Guharê bazinê xu teyisand.
_ :n.j.verbal noun. **Shine, Shining**. لَمَعان.
Teyisandinê teysteysok dan dîtin bi şevê.

Teyisîn: j.tên.vi. Biriqîn. **To shine**. يَلمَعُ.
Stêr diteyisin bi şevê.
_ :n.j.verbal noun. **Shine, Shining**. لَمَعان.
Teyisîn a stêran bi şevê ciwanî ye.

Tezandin: j.tê.vt. Sarkirin. **To cool**. يُبَرِّدُ.
Gozik ê nû av tezand bo vexuarinê.
_ :n.j.verbal noun. **Coolness**. برودة، تَبريد.
Tezandin a tezîkerê zûtir e, ji ya gozk ê nû.

Tezîn: j.tên.vi. Sarbûn. **To become cold**. يَبرَدُ .
Av a rûbaran diteze zivistanan, havînan gerim dibe.
_:n.j.verbalnoun. **Coldness**. برودة .
Tezîn a av a rûbaran di zivistanan de karek asayî ye.

Têalandin: j.tê.vt. Têwerandin. **To wrap, To surround**. يَلُفُّ .
Gulê, evê serbistê bigire û benkî têbialîne!
_ :n.j.verbal noun. **Wrapping, Surround**. لَفّ .
Têalandin a benkî li ser serbistê Gulê pêrabû.

Têberbûn: j.tên.vi. **1**.Pêwerhatin. **To attack**. يَنقضُّ على
2.Agirgirtin. **To catch fire**. يَحتَرِقُ .
1.Se têberbûn Arî li gundî ;Arî revî.
2.Behzadî binkê çixarê avêt nav tanî agir têberbû.
_ :n.j.verbal noun. 1.**Attack**. اِنقِضاض 2.**Catching fire**. إحتِراق
1.Têberbûn a seyan hêla Arî birev/e/it.
2.Têberbûn a agirî tan da sotin.

Têberdan: j.tê.vt. Çupênekirin. **To pay no attention to**. يُهمِلُ .
Karek baş bidest min kevt;lê min têberda.
_ :n.j.verbal noun. **Inattention**. إهمال .
Têberdan a min bo karî ji nezanînê bû.

Têbirin: j.tê.vt. **1**.Bê pakî girtin. **To neglect, To omit**. يُهمِلُ، يَغفُلُ
2.Dan kuştin. **To extirpate, To kill.** يَقضي على
1.Çima te kirrîn a rezî têbir Dara?
2.Ma ne gunehbû we Qenco têbir?
_ :n.j.verbal noun. 1.**Neglect, Omission**. إهمال، إغفال
2.**Extirpation.** قضاءٌ على
1.Têbirin a Darayî bo kirrîn a rezî ne başî bû.
2.Bi têbirin a Qencoyî, jin a wî bû bîjin.

Têçûn: j.tên.vi. **1**.Neman. **To perish**. يَهلُكُ .2.Jêçûn. **To leak**. يَتَسَرَّبُ
1.Zinar çû bo dizîyê;lê têçû.
2.Me denek kirrî û tijî av kir;lê hemû av têçû.
_ :n.j.verbal noun. **Perdition**. هَلا ك .2.**Leakage**. تَسَرُّب .
1.Têçûn a Zinarî ji çavzilî bû.
2.Têçûn a avê ji kevnatîya meşkê bû.

Têgehandin: j.tê.vt. Ruhinkirin. **To understand**. يُفَهِّمُ .
Fêrkerî şagird têgehandin.
_ :n.j.verbal noun. **Understanding.** فهم، تفهيم .
Têgehandinê,şagird jîrkirin û pêşvebirin.

Têgehiştin: j.tên.vi. Halîbûn. **To understand**. يَتَفَهَّم .
Fêrkerî wate ruhinkir û şagird têgehiştin.
_ :n.j.verbal noun. **Understanding**. تَفَهُّم .
Têgehiştinê şagird pêşvebirin.

Têheldan: j.tê.vt. Şeqlêdan. **To beat, To hit**. يَضرُبُ .
Cangîrî diz girt û têhelda û bir bo polîsxanê.
_ :n.j.verbal noun. **Beating, Hitting**. ضَرب .
Têheldan a dizî karek ne baş bû Cangîrî kirî.

Têhilînan: j.tê.vt. Kirin têda. **To dip**. يَغمِسُ .
Firavîn a me avgoştbû,me nan têhilîna û me xuar.
_ :n.j.verbal noun. **Dipping**. غمِس .
Têhilînan a nanî di avgoştê de xoşe.

Têhusîn: j.tê.vt. Pêve înanûbirin. **To rub**. يَحُكُّ .
Evî berzîvî bigre û çeqoyê têbihusî da tîj bib/e/it.
_ :n.j.verbal noun. **Rubbing**. حَكّ .
Têhusîn bi berzîvî ve çeqo da tîjkirin.

Têgoşan: j.tê.vt. Xebatkirin. **To strive**. يُناضِلُ .
Kurd têgoşan bo mafwergirtinê.
_ :n.j.verbal noun. **Striving**. نِضال .
Têgoşan a kurdan ji dil bû.

Têgoşîn: j.tê.vt. Xebatkirin. **To battle**. يُكافِحُ .
Kurd têgoşîn bo fidralizmê.
_ :n.j.verbal noun. **Battle**. كِفاح .
Têgoşîn karê dilsojan e, bo welatê parçekirî

Têkalan (têkalhan): j.tên.vi. Lêk hatin badan. **To surround**. يَلتَفُّ
Dafk û pêdafk têkalan ne hatin vedan.
_ :n.j.verbal noun. **Surrounding.** اِلتِفاف.
Têkalan a dafkan nêçîr paşêxist.

Têkalandin: j.tê.vt. Lêk badan. **To convolve**. يَلُفُّ .
Me werîs têkalandin.
_ :n.j.verbal noun. **Convolution**. إلتِفاف، لَفّ .
Têkalandin a werîsan ez pêrabûm.

Têkalizandin: j.tê.vt. Di nav êkra birin. **To become complex.** يُعَقِّد
Sûsik kevt dafkan û dafk têkalizandin.
_ :n.j.verbal noun. **Complexity**. تَعقيد .
Bi têkalizandinê dafik têkçûn.

Têkalizîn: j.tên.vi. Di nav êkra çûn. **To be complex**. يَتَعَقَّد .
Dafik têkalizîn di tuîrkî de.
_ :n.j.verbal noun**. Complexity**. عُقدة .
Têkalizînê dafik têkbirin.

Têkbirin: j.tê.vt. Ji kar êxistin. **To leave without work**. يُعَطِّلُ .
Hizir ên Alanî hatin têkbirin.
_ :n.j.verbal noun. **Breakdown.** عَطل .
Têkbirin a hizir ên Alanî birayê wî pêrabû.

Têkçûn: j.tên.vi. **1**.Neman. **To wreck**. يَنهَدِمُ
2.Jêksilbûn. **To quarrel.** يَتَخاصَم
1.Di enfalan de 4500 gund têkçûn.
2.Salar û Semyan têkçûn li ser kelepuîrtî.
_ :n.j.Verbal noun.1.**Wreck.** هَدِم **2.Quarrel.** نِزاع ، خصام
1.Têkçûn a kheştîyê ji peqîn a narincokekê çêbû.
2.Têkçûn a Şemalî û Hevalî liser hin diravî(paran)bû.

Têkdan: j.tê.vt. **1**.Kavilkirin. **To sabotage**. يُخَرِّبُ
2.Puîçkirin. **To cancel**. يَلغي
1.Kolkê mirîşkan hat têkdan.
2.komel a delalê kombûn a serê salê têkda.
_ :n.j.verbal noun. **1.Sabotaged**.خَرا ب .**2.Cancellation**. إلغاء
1.Têkdan a kolkê mirîşkan ji ber bêhnê bû.
2.Têkdan a kombûnê ji ber sermayê bû.

Têkhilkêşan: j.tê.vt. Di nav hevra birin. **To knit**. يَتَشابَكُ .
Bîrkerî(cilçêkerî) dav ên reng reng têkhilkêşan.
_ :n.j.verbal noun. **Knitting**. تَشابُك .
Têkhilkêşan a davan bo çêkirin a şel û şepkan bû.

Têkirin: j.tê.vt. Kirin têda, Dagirtin. **To pour**. يَصُبُّ .
Çayçêkerî sê çay têkirin bo mêhvanan.
_ :n.j.verbal noun. **Pouring**. صَبّ.
Têkirin a çayê asan e.

Têkvedan: j.tê.vt. **1**.Belavkirin. **To disarrange.** يُبَعثِر
2.Livandin. **To move.** يُحَرِّك
3.Berdanhev. **To incite**. يُحَرِّض .
1.Me belg ên puîngî têkvedan li ber hetavê da hişkbibin.
2.Me çay têkveda da şekir bitawêt.
3.Ba,isîyan gundî têkvedan da lêkbikevin.
_ :n.j.verbal noun. **1**.**Disarrangement**. بَعثرة
2.**Movement.** تَحريك
3.**Incitement**. تَحريض .
1.Bi têkvedanê belg ên puîngî hişkbûn li ber hetavê.
2.Bi têkvedan a çayê şekir tawa.
3.Bi têkvedanê gundî berbûn hev.

Tênan: j.tê.vt.1.Kutan. **To make love to. To copulate with.** يُجامِعُ
Ker çû ser makerê û têna.
_ :n.j.Verbal noun. **Copulation, Lovemaking, Sex.** جِماع
Bi tênanê zaro çêdibin.

Têperbûn: j.tên.vi. Jêkborîn. **To pass, To overreach**. يَتَخَطّى .
Avan têperbû di berêkane ya melevanî yê da.
_ :n.j.verbal noun. **Pass, Overreaching**. تَخَطّي .
Têperbûn a Avanî ji zîrekî ya wî bû.

Têperkirin: j.tê.vt. Jê borîn. **To pass, To overreach**. يُخَطّي،
يُجاوِزُ.
Otombîl a Şivanî Avan têperkir di rêkê de.
_ :n.j.verbal noun. **Pass, Overreaching**. تَخَطّي، تَجاوز .
Bi têperkirinê em zûtir gehiştin.

Têrabirin: j.tê.vt. Di /binra/navra/ çûn. **To get through, To let pass**. يُمَرِّرُ
Kivanê serkevtinê di rêkê de bû، Şoferî em têrabirin.
_ :n.j.verbal noun. **Getting through, Letting pass.** تَمرير
Bi têrabirin a di bin kivanê serkevtinê ra، me pê xoşbû .

Têraçûn: j.tên.vi. Di/ binra/navra/ çûn. **To pass**. يُمَرُّ .
Pir di rêk a qazan de bû qaz têraçûn.
_ :n.j.verbal noun. **Passing, Pasage**. مرور .
Têraçûn a bin pirê rêk a qazan kurtkir.

Têrahatin: j.tên.vi. Di navra vegeran. **To come through**. يَمُرُّ مِن .
Devê kuna rîvî tengbû;rîvî şiya têrabihê.
_ :n.j.verbal noun. **comming through**. مرور من .
Tengbûnê hin pûrtê rîvî werand bi têrahatinê.

Têrakirin: j.tê.vt. Birin navda. **To enter, To insert**. يولِج، يُدخِل .
Çerim stûrbû,pînedozî dirêşk têrakir da kunbib/e/it.
_ :n.j.verbal noun. **Enterance, Insertion**. ئيلاج، ندخال .
Têrakirin a dirêşkê çerim kunkir.

Têrkirin : j.tê.vt. Xuarin danê. **To satisfy.** يُشَبِّعُ، أشبَع
Me mêhvan ên birsî têrkirin .
_ :n.j. Verbal noun. **Satisfaction.** إشباع
Têrkirinê dilê mêhvanan xoşkir.

Têteşqilîn: j.tê.vt. Hevdu dîtin a bê jivan. **To meet by chance.** يَلتَقي بالصُدفة
Şivan û Segvan têkteşqilîn li Amedê.
_ :n.j.Verbal noun. **Meeting by chance**. لِقاء بالصُدفة
Têkteşqilîn a Şivanî û Segvanî li Amedê xoşbû.

Têwerandin: j.tê.vt. Têpêçan. **To wrap up, To furl**. يَلُفُّ .
Arî sarbû deyk a wî bermalk têwerand.
_ :n.j.verbal noun. **Wrapping (up), Furl**. لَفّ .
Arî Bitêwerandin a bermalkê gerimbû.

Tifkirin: j.tê.vt. Tif ji devê xu deranî. **To spit**. يَبصُقُ .
Azadî tifkir,çiku bahîvek tal(tehil)xuar.
_ :n.j.verbal noun. **Spitting**. بَصقْ .
Tifkirin li ser zemînê ne karek başe.

Tijîbûn: j.tên.vi. Pirrbûn. **To fill**. يَمتَلئُ .
Gulê av kir denî ta tijîbû.
_ :n.j.verbal noun. **Fill**. إمتِلاء .
Bi tijîbûn a denî,em ne mayin bê av.

Tijîkirin: j.tê.vt.Pirrkirin. **To fill**. يَملؤ .
Nazê mesîn tijîkir bo destnivêjê.
_ :n.j.verbal noun. **Fill**. ملئ .
Bi tijîkirin a mesînî destnivêj hat girtin.

Tikakirin: j.tê.vt. Hîvîkirin, Paranewe. **To hope**. يَرجو .
Banê tikakir ji deyk a xu, da bihêlit biçit bo seyranê.
_ :n.j.verbal noun. **Hope**. رَجاء .
Tikakirin a Banê sergirt û deyk a wê hêla.

Tingijîn: j.tê.vt. Girrgirtin, xeyidîn. **To be irritated by.** يَغتا ظ،
Seddam bi standin a Bexda tingijî û revî.
_ :n.j.Verbal noun. **Irritation.** غضَب ، غيظ
Tingijîn a Seddamî û revîn a wî ji ber standin a Bexdayê bû.

Tiraşîn: j.tê.vt. Kurkirin. **To shave**. يَحلُق .
Hinkes herroj rih ên xu ditiraşin.
_ :n.j.verbal noun. **Shaving, Shave**. حِلاقة .
Tiraşîn a rihan baqijî ye.

Tirkirin: j.tê.vt. Ba yên dengdar ji zikî derhatin. **To break wind**. يَضرُط
Pîremêrekê tirkir li dîwanxanê şerm a wî hat.
_ :n.j.verbal noun. **Breaking wind**. ضَرطة، ضِراط .
Tirkirin li turkîya ne şerm e.

Tirsan: j.tên.vi. Bizdan, Toqan. **To frighten**. يَرعَبُ، يَخافُ .
Aram ji hirçê tirsa.
_ :n.j.verbal noun. **Fright**. رُعِبْ، خَوفْ .
Tirsan ji hirçê karê zaroka ne.

Tirsandin: j.tê.vt. Bizdandin, toqandin. **To fright**. يُخَوِّفُ .
Hirçê Aram tirsand,dema nikveçûyî.
_ :n.j.verbal noun. **Fright**. خَوفْ .
Tirsandin a Aramî ji hirçê ne karek başbû.

Tiwanîn: j.tên.vi. Şiyan, Kharîn. **Can, To be able to**. يَتَمَكَّنُ .
Dîlanî tiwanî bi ser çiyayî bikev/e/it.
_ :n.j.verbal noun. **Ability, Possibility**. تَمَكُّنْ، إمكان .
Tiwanîn a Dîlanî bo kirrîn a Otombîlekê xoşbû.

Tîjbûn: j.tên.vi. Xoşbirrbûn. **To sharpen**. يَنشَحِذُ، يَصبَحُ حاداً .
Çeqo hat çerixkirin baş tîjbû.
_ :n.j.verbal noun. **Sharpener**. حادّ، شَحِذ .
Bi tîjbûn a çeqoyê Nesrîn dilxoşbû.

Tîjkirin: j.tê.vt. Xoşbirrkirin. **To sharp**. يَشحَذُ، يَحُدُّ .
Çerraxî çeqo tîjkir.
_ :n.j.verbal noun. **Sharpener**. شَحِذ، حَدّ
Tîjkirin a çeqoyê,çeqo nuîkir.

Tîmarkirin: j.tê.vt. Dermankirin. **To treat**. يُداوي .
Birîndar hatin tîmarkirin li xestexaneyê.
_ :n.j.verbal noun. **Treat**. تَداوي .
Tîmarkirinê birîndar saxkirin.

Tîrbûn: j.tên.vi. Av jê çûn. **To thicken**. يَكثفُ .
Mast di tuîrkî de tîrbû.
_ :n.j.verbal noun. **Thickening**. تكثيف .
Tîrbûnê mast xoşkir bo xuarinê.

Tîrkirin: j.tê.vt. Av jê birin. **To thicken**. يُكَثِّفُ .
Tuîrkî mast tîrkir.
_ :n.j.verbal noun. **Thickening**. تكثيف .
Bi tîrkirinê mast kêm bû.

Topandin: j.tê.vt. Mirandin. **To die, To perish.** يُهلِكُ، يُمَوِّتُ .
Nazenînê çîçelok topand.
_ :n.j.verrbal noun. **Death.** مَوتْ .
Topandin a çîçelokê Nazenîn Êşand.

Topîn: j.tên.vi.Mirin. **To die, To perish**. يَهلَكُ، يَموتُ .
Hêstir di kevrî de kevt û topî.
_ :n.j.verbal noun. **Death**. مَوتْ .
Topîn a hêstirê ziyanek mezin bû.

Toqandin: j.tê.vt. Tirsandin. **To frighten**. يُخَوِّفُ .
Teqekirin a şevê gundî toqandin.
_ :n.j.verbal noun. **Fear, fright**. تَخويفْ، خَوفْ .
Toqandinê xew a gundîyan têkda.

Toqîn: j.tên.vi. Tirsan. **To fright**. يَخافُ .
Zaro toqîn ji dengê topan.
_ :n.j.verbal noun. **Fear, Fright**. خَوفْ .
Toqînê zaro nesaxkirin.

Torebûn: j.tên.vi. Silbûn, Êcizbûn, Têkçûn. **To rage, To become angry**. يَغضَبُ
Fêrkerî li qotabî heytand,qotabî torebû.
_ :n.j.verbal noun. **Rage, Anger**. غَضَبْ .
Torebûn a qotabî ne karek başbû.

Torekirin: j.tê.vt. Silkirin, Êcizkirin, Têkbirin. **To seethe**. يُغيضُ .
Dan û standinê segvan torekir.
_ :n.j.verbal noun. **Seethe**. إغاضة .
Torekirinê Segvan bê dengkir.

Tundbûn: j.tên.vi. Azabûn. **To strengthen**. يَتَقوّى .
Bi werzişkirinê leş tunddib/e/it.
_ :n.j.verbal noun. **Strengthening.** تَقوية .
Bi tundbûn a leşî; Ciwanê pila yekem wergirt.

Tundgirtin: j.tê.vt. başgirtin. **To grasp, To grip**. يَمسَكُ بقُوّة .
Zozan destê min tundbigire, da tu ne kevî!
_ :n.j.verbal noun. **Grasping, Gripping**. مَسِك بقُوّة .
Tundgirtin a destî hêla Zozan ne kev/e/it.

Tundkirin: j.tê.vt. Azakirin. **To strengthen**. يُقوّي .
Werzişkirinê leşê min tundkir.
_ :n.j.verbal noun. **Strengthening**. تَقوية .
Tundkirin a leşî hêla ez pila yekem bistînim.

Tûlstandin: j.tê.vt. Heyfstandin. **To retaliate, To revenge**. يَثأرُ .
Merdanî Behroz quta û tûlaxustand.
_ :n.j.verbal noun. **Retaliation**. ثأر .
Tûlstandin ne karek pêşkevtî ye.

Tûlvekirin: k.tê.vt. Heyfvekirin. **To revenge**. يَثأرُ .
Cemşîdî tûlvekir ji Cangîrî.
_ :n.j.verbal noun. **Revenge**. ثأر .
Tûlvekirin karek paşkevtî ye.

Tûmarkirin: j.tê.vt. Êxistin ser kasêtê. **To record**. يُسَجِّلُ
Bilindî stran ên Erdewanî tûmarkirin.
_ :n.j.verbal noun. **Record**. تَسجيل
Tûmarkirin a stiranan karek baş e.

Tûşbûn: j.tên.vi. Pêvebûn. **To suffer**. يَبتَلي .
Min gelek werziş kir û ez tûşbûm neşêm bihêlim.
_ :n.j.verbal noun. **Suffering**. إبتِلاء .
Tûşbûn a werzişkirinê qazanc gehand min.

Tûşkirin: j.tê.vt. Pêvekirin. **To afflict**. يُبلي .
Eyasî qumar nîşa min da ez tûşkirim.
_ :n.j.verbalnoun. **Afflication**. بَلاء، بَلوى .
Tûşkirin a min bi fêrbûn a qumarê, Eyas pêrabû.

Û

Ûtûkirin (Ûtîkirin): j.tê.vt. Rastkirin. **To iron**. يَكوي المَلابس .

Ûtûkerî kirasê Danî ûtûkir.

_ :n.j.verbal noun. **Ironer**. كَوي .

Ûtûkirin, cilan ciwan dik/e/it.

V

Vajîbûn: j.tên.vi. Wergeran. **To reverse, To invert**. **يَعكُسُ ، يَقلُبُ وَجهاً لِبَطن**.
Çît vajîdibe û dihê duruîn.
_ :n.j.verbal noun. **Reverse, Invert**. **مَعكوس،مَقلوب** .
Bi vajîbûnê kiras hat duruînê.

Vajîkirin: j.tê.vt. Wergerandin. **To revrse, To invert**. **يُعكِسُ، يُقلِبُ**
Xecê şepik vajîkir û duruî.
_ :n.j.verbal noun. **Reverse, Invert**. **مَعكوس، مَقلوب** .
Min şepik vajîkirî liberkir(Kir berxu).

Valabûn: j.tên.vi. Çu di navda nema. **To empty**. **يَفرُغُ** .
Gozikî av dêrand û valabû.
_ :n.j.verbal noun. **Empty**. **إفراغ** .
Valabûn a gozikî ji dêrandinê çêbû.

Valakirin: j.tê.vt. Çu têda ne hêlan. **To empty, To discharge**. **يُفَرِّغُ**
Me xanî valakir da em bihunîn(Rengbikin).
_ :n.j.verbal noun. **Empty, Discharge**. **تَفريغ** .
Valakirinê kar sanahîkir.

Vebûn: j.tên.vi. Kiranewe. **To open**. **يَنفَتِحُ** .
Min dergeh palda vebû. Pijkoja gulê vebû. Pijkoj vebû.
_ :n.j.verbal noun. **Open**. **إنفِتاح** .
Bi vebûn a pijkojê gul bi rewşkevt.

Vebirrîn: j.tê.vt. **1**.Pêkhatin. **To agree.** يُتَّفِقُ

2.rawestandin. **To stop, To cease.** يوقِفُ .

1.Azadî û Alanî bazar vebrrîn li ser xanî.

2.Dîlanî otombîl ne kirrî û bazar hat vebirrîn.

_ :n.j.verbal noun. 1.**Agreement**. إِتِّفاق .2.**Cease**. إيقاف، إنقِطاع

1.Vebirrîn a bazarî liser xanî zuî çêbû.

2.Vebirrîn a bazarê otombîlê Ji Dîlanî çêbû.

Veciniqandin: j.tê.vt. Tirsandin. **To frighten, To startle**.يَجفُلُ، يَفزُّ

Marî hêstir veciniqand.

_ :n.j.verbal noun. **Fright, Startle**. جفول، فزّ .

Veciniqandin a hêstirê barê wê da êxistin.

Veciniqîn: j.tên.vi. **Tirsan**. يَنجَفِلُ، يَنفزُّ .

Hêstir veciniqî û barê wê kevt.

_ :n.j.verbal noun. **Fright, Startle**. جفول، فزّ .

Veciniqînê barê hêstirê da êxistin.

Veçirîn: j.tê.vt. Jêkvebûn. **To be teased**. يَندُفُ، يَنفُشُ .

Şirînê hirî veçirî bo balîfê.

_ :n.j.verbal noun. **Tease**. نَدِفْ، نَفِشْ .

Veçirînê hirî amadekir bo pirrkirin a balîfê.

Vedan: j.tê.vt. **1**.Danan. **To set up**. يَنصُبُ

2.Dan alekê. **To isolate, To put aside.** يُعزِلُ، يُبعِدُ .

1.Me çadir veda li seyranê. Me kêl vedan bo kêlanê.

2.Me cil ên pîs vedan bo şûştinê.

_ :n.j.verbal noun. 1.**Set up**.نَصِبْ .2.**Isolation**. عَزِلْ، إبعادْ .

1.Vedan a çadirê em ji baranê paraztin.

2.Vedan a cil ên pîs bo şûştinê bûn.

Vegeran: j.tên.vi. Zivirîn. **To return**. يَرجَعُ .

Cotyar vegera bo malê.

_ :n.j.verbal noun. **Return**. رجوعْ .

Vegeran a cotyarî bo malê ji ber barîn a baranê bû.

Vegerandin: j.tê.vt. Zivirandin. **To return**. يُرَجِّعُ .

Şivanî pez vegerand bo gundî.

_ :n.j.verbal noun. **Return**. رجوعْ .

Vegerandin a pezî bo firotinê bû.

Vegêran: j.tê.vt. **1**.Gotve. **To tell.** يَقُصُّ، يروي .
2.Pêknehatin. **To restore.** يُعيدُ
1.Dapîrê çîrok vegêra bo nevîyê xu.
2.Dijwarî hesp vegêra,çiku leng bû.

Vegirtin: j.tê.vt. **1**.Kirin kilozî. **To pickle.** يَكبُسُ
2.Ji avê derînan. **To grasp, To grab**. يَلقفُ .
1. Xanê sîr vegirtin bo jajî û penîrî.
2.Zaro da xendiqit, Pîtanî vegirt.
_ :n.j.verbal noun. 1.**pickle.** كَبسْ .2.**Grasp, Grab**. لَقِف .
1.Vegirtin a sîran Xanê pêrabû.
2.vegirtin a zaroyî Pîtan pêrabû.

Veguhaztin: j.tê.vt. Cih lê guhorîn. **To transfer**. يَنقُلُ ، يُحَوِّلُ .
Zozan hat veguhaztin ji Dihokê bo Amêdîyê.
_ :n.j.verbal noun. **Transfer**. تَحويل،نَقِلْ .
Veguhaztin daxuaz a Zozanê bû.

Veguran: J.tê.vt. Kevilkirin. **To Skin**. يَسلُخُ .
Dirbazî du berx veguran.
_ :n.j.verbal noun. **Skinning**. سَلِخْ .
Veguran karê Dirbazî ye.

Vehandin: j.tê.vt. **1**.Helbest nivîsîn. **To poetize**. يَنضُمُ
2.Pêvekir. **To string.** يَسلُكُ
1.Bêkesî sê helbest vehandin.
2.Narînê tizbî vehandin.
_ :n.j.verbal noun. 1.**Poetizing**. نَضِمْ .2.**Stringing**. تَسليكْ .
1.Vehandin a helbestan Bêkes pêrabû.
2.Vehandin a tizbîyan Narîn pêrabû.

Vehejan: j.tên.vi. Lerizîn. **To shake, To vibrate**. يَتَرَدَّدُ، يَهتَزُّ
Di bagurrê(Hurrê) de dirext vehejan.
_ :n.j.verbal noun. **Shake, vibration**. تَرَدُّد، إهتِزاز .
Di vehejanê de du dirext şkestin.

Vehejandin: Lerizandin. **To shake, To vibrate**. يُهِزُّ .
Bagurrê dirext vehejandin.
_ :n.j.verbal noun. **Shake, Vibration**. إهتِزاز .
Vehejandin dijwar bû, hin dirext şkandin.

Vehesan: j.tên.vi. **1**.Kelîn. **To mature, To ripen**. يَنضُجُ
2.Hulîbûn,losbûn. **To smooth**. يَملُسُ .
1.Birinc vehesa. Savar vehesa. Girar vehesa. Nîsk vehesa
2.Binê jorê vehesa. Dîwar vehesa.
_ :n.j.verbal noun. 1.**Maturity, Ripeness**. نِضوج
2.**Smooth**. مَلِسْ
1.vehesanê birinc xoşkir.Vehesanê savar xoşkir.
2.Vehesanê dîwar ciwankir.

Vehesandin: j.tê.vt. **1**.Kelandin. **To mature, To ripen**. يُنضِجُ
2.Hulîkirin. **To smooth**. يُملِّسُ .
1.Kabanîyê birinc baş vehesand.
2.Hunînkerê dîwar baş vehesand.
_ :n.j.verbal noun. 1.**Maturity, Ripeness**. نِضوجْ
2.**Smooth. تَمليسْ.**
1.Vehesandin a gelek(zêde)şîv nexoşkir.
2.vehesandin a gelek dîwar kir xudîk.

Vehewan: j.tên.vi. Hatin malê. **To gather**. يَدخُلونَ الدّار .
Ajel hemî vehewan. kewal hemî vehewan.
_ :n.j.verbal noun. **Gather**. دِخول الدّار .
vehewan a ajelî ji ber barîn a baranê bû.

Vehewandin: j.tê.vt. Kirin di malê de. **To fetch**. يُدخِلوهُم في الدّار .
Şivanî ajel vehewand.
_ :n.j.verbal noun. **Fetch, gather**. إدخالُهُم في الدّار .
Vehewandin a ajelî şivan pêrabû.

Vejenîn: j.tê.vt. Velerzîn. **To vibrate.** يَتَرَدَّدُ، يَهتَزُّ .
Kivan vejenî û pembî jêkvekir.
_ :n.j.verbal noun. **Vibration**. تَرَدُّد، إهتِزاز .
Bi vejenîn a kivanî pembî jêkvebû.

Vekê**ş**an: j.tê.vt. Kêşan. **To pull**. يَسحَبُ .
Yarîkeran werîs vekêşa.
_ :n.j.verbal noun. **Pull, Pulling**. سَحِبْ .
Tîpa (B)Werîs vekêşan bir(qazanckir).

Vekirin: j.tê.vt. Kiranewe. **To open**. يَفتَحُ .
Dizî dergeh bi kilîlê vekir.
_ :n.j.verbal noun. **Open**. فتْح .
Vekirin a dergehî bi kilîlê bû.

Vekolîn: j.tê.vt. Lêgeran. **To look for, To search for**. يَبحَثُ، يَنَقِّبُ
Mirîşkê xak vekolî bo kirman. Polîsî tuîrk vekolî.
_ :n.j.verbal noun. **Looking for. searching for**. بَحِثْ، تَنقيب.
Bi vekolîn a tuîrkî polîsî debanceyek dît.

Vekuştin: j.tê.vt. Serjêkirin. **To slay**. يَذبَحُ .
Xebatî berxek vekuşt bo mêhvandarîyê.
_ :n.j.verbal noun. **Slaying.** ذَبحْ .
Vekuştin a berxî bo mêhvandarîyê bû.

Veman: j.tê.vt. Man lipaş. **To be late. To delay**. يَتَأخَّرُ .
Kerwanê Sêrtê vema li Mêrdînê.
_ :n.j.verbal noun. **delay**. تَأخُّرْ .
Veman a kerwanî ji ber lêkolînê bû.

Vemirandin: j.tê.vt. Kujanewe. **To put out, To extinguish.** يُطفِئ
Azadî fener vemirand.
_ :n.j.verbal noun. **putting out**. **Extinguisher**. إطفاء ، مَطفئ
Vemirandin a fenerê ji ber nivistinê bû.

Venan: j.tê.vt. Vedan, Danan. **To Set up**. **To raise**. يَنصُبُ .
Mindalan kêl venan bo kêlanê (kêluvêlanê).
_ :n.j.verbal noun. **Setting up, Raising**. نَصِبْ .
Venan a kêlan Adem pêrabû.

Veperîn: j.tên.vi. Belavbûn. **To scatter**. يَتَبَعثَرُ .
Berxî xu hejand çipik ên avê jê veperîn.
_ :n.j.verbal noun. **Scatter**. بَعثَرة .
Veperîn a çipik ên avê ji berxî‹ ji ber şûştinê bû.

Veperandin: j.tê.vt. Belavkirin. **To scatter**. يُبَعثِرُ .
Toz hat veperandin ji mirîşkê,dema çeng ên xu hejandin.
_ :n.j.verbal noun. **scatter**. بَعثَرة .
Veperandin a tozê ji çeng ên mirîşkê ji ber hejandinê bû.

Veqetan: j.tên.vi. Jêk dûrbûn. **To disperse**. يَتَشَتَّتُ، يَتَفَرَّقُ
Kerwan veqetan ji hev ji ber rêgiran.
_ :n.j.verbal noun. **Dispersion**. تَشَتُّتْ، فِراق .
Veqetan a kerwanî ji hev, ji ber rêgiran bû.

Veqetandin: j.tê.vt. Jêk dûrkevtin. **To disperse**. يُشَتِّتُ، يُفَرِّقُ
Kerwanî xu veqetand ji hev ji ber rêgiran.
_ :n.j.verbal noun. **Dispersion**. تَشتيت، تَفريق .
veqetandin a kerwanî ji Tirsan bû.

Verenîn: j.tê.vt. Jêbirin. **To rub**. يَحُكُّ .
Besê binverenk verenî ji qazanê.
_ :n.j.verbal noun. **Rub**. حَكْ .
Verenînê, binê qazanê baqijkir ji binverenkê.

Veresan: j.tên.vi. Vebûn. **To Escape**. يَفلِتُ .
Hêstir a bi singî ve girêdayî veresa. Hesp veresa.
_ :n.j.verbal noun. **Escape**. فَلتان .
Veresan a hêstirê ji vebûn a werîsî bû.

Veresandin: j.tê.vt. **1**.Vekirin. **To escape**. يُفلِتُ
2.Avik berdan. **To masturbate.** يَستَمني .
1.Hêstirê xu veresand ji singî.
2.Şemalî veresand bi destî,dema bû pazde salî.
_ :n.j.verbal noun.1.**Escape.** فَلتان **. 2.Masturbation.** إستِمناء
1.Veresandin a hêstirê ji piçan a werîsî bû.
2.Veresandin a Şemalî ji baliqbûnê bû.

Vereşan: j.tên.vi. Hilavêtin. **To vomit**. يَتَقَيّؤُ .
Şadî vereşa,dema av vexuarî.
_ :n.j.verbal noun. **Vomit**. قَيئْ، تَقَيُّؤْ .
Vereşan a Şadî ji nesaxîyê bû.

Vereşandin: j.tê.vt. Hilavêtin. **To vomit**. يُقَيِّئُ .
Nalî xu vereşand bi tilê(tiblê).
_ :n.j.verbal noun. **Vomit**. تَقَيُّؤْ .
Vereşandinê Nalî nesaxkir.

Verevîn: J.tên.vi. Çûn, Belavbûn. **To scatter**. يَتَفَرَّقُ .
Mêhvan verevîn ji dîwanxanê.
_ :n.j.verbal noun. **Scatter**. تَفَرُّقْ .
Verevîn a mêhvanan ji ber direngî ya şevê bû.

Verevandin: j.tê.vt. Belavkirin. **To scatter**. يُفَرِّقُ .
Lêkkevtinê mêhvan verevandin.
_ :n.j.verbal noun. **Scatter**. تَفريق .
Verevandin a mêhvanan ji lêkkevtinê çêbû.

Verûçkandin: j.tê.vt. Per jêvekirin. **To pluck out**. يُنتِفُ .
Nazdarê mamirk ên serjêkirî verûçkandin.
_ :n.j.verbal noun. **Pluck out**. نَتِفْ .
Verûçkandinê mamirk dan firotin.

Veşartin: j.tê.vt. şardinewe. **To hide**. يُخفي .
Gulê diravê xu veşart li malê.
_ :n.j.verbal noun. **Hiding**. إخفاء .
Veşartinê dirav da paraztin ji dizan.

Veşebikîn: j.tên.vi. Vehejan. **To stagger**. يَتَرَنَّحُ .
Metîn veşebikî û kevt,dema rabû ser pêyan,.
_ :n.j.verbal noun. **Stagger**. تَرَنُّحْ .
Veşebikînê Metîn êxist.

Veşebikandin: j.tê.vt. Vehejandin. **To stragger**. يُرَنِّحُ .
Bagurrê, Hêja veşebikand û êxist.
_ :n.j.verbal noun. **Stragger**. تَرَنُّحْ .
Veşebikandin a Hêjayî ji bagurrê çêbû.

Veşelandin: j.tê.vt. Cil êxistin. **To Undress**. يَنزَعُ المَلا بس .
Zinarî xu veşeland bo ser şûştinê.
_ :n.j.verbal noun. **Undress**. نَزعُ المَلا بس .
Veşelandin a Zinarî di serşûyê de bû.

Veweşan: j.tên.vi. Velivîn. **To move, To shake**. يَتَحَرَّكُ .
Belg ên dirextan veweşan bi livîn a bayî.
_ :n.j.verbal noun. **Move, Shake.** حرَكة .
Veweşan a belgan ji livîn a bayî çêbû.

Veweşandin: j.tê.vt. Velivandin. **To move, To shake**. يُحَرِّكُ .
Livîn a bayî belg ên dirextan veweşandin.
_ :n.j.verbal noun. **Move, Shake**. تَحريك .
Veweşandinê gelek çiqil şkandin û belg werandin.

Vewijartin: j.tê.vt. Pakkirin. **To purify**. يُنَقِّي .
Jinikan genim vewijart.
_ :n.j.verbal noun. **Purify**. تَنقية .
Vewijartinê bihayê genimî bilind kir.

Vexuandin: j.tê.vt. Xuaztin. **To invite**. يَدعوا .
Me 200 kes vexuandin bo şahî ya Bijarî.
_ :n.j.verbal noun. **Invitation**. دعوة .
Vexuandin a 200 kesa bi tinê ji ber tengavî ya cihî bû.

Vexuarin: j.tê.vt. Xuardinewe. **To drink**. يَشرَبُ .
Narîn kiça min, gelek pîpsîya venexu!
_ :n.j.verbal noun. **Drink**. شُرُب .
Gelek pîpsî vexuarin baş nîye.

Vexurandin: j.tê.vt. Axavtin a birêz. **To compliment**. يُجامِلُ .
Divê mirov mêhvanan vexurîne.
_ :n.j.verbal noun. **Compliment**. مُجامَلة .
Vexurandin karê mirov ên pêşkevtî ne.

Vezelyan: j.tê.vt. Xardan bilez. **To skirr**. يَنطَلِقُ بسُرعة .
Du mambiz vedizelyan,dema min dîtin.
_ :n.j.verbal noun. **Skirr**. إنطِلاقْ .
Vezelyan a mambizan ji tirsan bû.

Vêdan: j.tê.vt. Rakirin. **To pick up**. يَلتَقِطُ .
Me sêv vêdan ji bin darê.
_ :n.j.verbal noun. **Picking up**. لَقِط .
Sêv vêdan karê mindalan e.

Vêkevtin: j.tê.vt. Lêdan**. To hit (a target).** يُصيبُ الهَدَفْ .
Herdemî gulleyek berda nîşanê vêkevt.
_ :n.j.verbal noun. **Hit, Goal**. إصا بَةُ الهَدَفْ .
Vêkevtin a gulleyan li nîşanê gelek xoşe.

Vêkkevtin: j.tê.vt. Li hevdu dan. **To collide (with).** يَتَصادَمُ .
Du tirên vêkkevtin 20 mirov birîndarbûn.
_ :n.j.verbal noun. **Collision**. إصطِدام .
Vêkkevtin a tirênan kêmcaran çêdib/e/it.

Vêxistin: j.tê.vt. Hilkirin. **To light. To turn on**. يُشعِلُ .
Zînê fener vêxist bo ronahîyê.
_ :n.j.verbal noun. **Light, Turn on**. إشعال .
Vêxistin a fenerê bo ronahîyê bû.

Virêkirin: j.tê.vt. Şandin, Hinartin, Nardin. **To send**. يُرسِلُ .
Min du name virêkirin bo Amedê.
_ :n.j.verbal noun. **Sending**. إرسال .
Virêkirin a nameyan bo dil xoşkirinê bû.

Virrkirin: j.tê.vt. Direwkirin. **To lie, To tell a lie**. يَكذُبُ .
Merdanî Axavt û di axavtinê de gelek virrkirin.
_ :n.j.verbal noun. **Lying**. كِذبْ .
Virrkirin karê bê mejîyan e.

Viyan: j.tê.vt. 1.Wîstin. **To want, To like**. يَرغَبُ، يُريدُ
2.Hejêkirin. **To love.** يُحِبُّ .
1.Min viya ez biçim bo malê.
2.Azadî Lane viya û marekir.
_ :n.j.verbal noun. 1.**Like, want**. رَغبة، إرادة .2.**Love**.حبّ .
1.Viyan a min bo çûnê bi cih hat.
2.Viyan a Azadî bo Laneyê ser girt.

W

Wazînan: j.tê.vt. Wazanîn, Hewkirin, Dest jê berdan. **To cancel**. **يَكُفُّ عَن، يُبَطِّلُ**
Palan wazîna ji karkirinê.
_ :n.j.verbal noun. **Cancellation**. **كَفَّ عَن، إبطال، أبطل** .
Wazînan a palan ji ber kombûnê bû.

Wehbûn: j.tên.vi. Tirsan. **To frighten**. **يَخافُ، يَجزَعُ** .
Aramî ji nişkan ve wehkir Arî,Arî wehbû.
_ :n.j.verbal noun. **Frightening**. **جَزَعْ، خَوْفْ** .
Wehbûn ji nişkan bû ji ber hindê Arî tirsa.

Wehandin: j.tê.vt. Gazîkirin. **To cry**. **يَصيحُ الحَجَل** .
Dengê mêsûskê hat,sûsk ê nêr wehand.
_ :n.j.verbal noun. **Cry**. **صياحُ الحَجَل** .
Wehandin a sûsk ê nêr,gazîkirin e bo mêsûskê.

Wehkirin: j.tê.vt. Tirsandin. **To frighten**, **To terrify**. **يُخيفُ** .
Aram kurê min‹ çuca wehneke birayê xu!
_ :n.j.verbal noun. **Frightening, Terrifying**. **إخافة** .
Wehkirinê Arî nesaxkir.

Wekirin: j.tê.vt. Pejirandin. **To accept (to), To agree (to)**. **يَقبَلُ** .
Nazê wekir wekî bab ê wê xuaztî.
_ :n.j.verbal noun. **Acceptance, Agreement**. **قبول**.
Wekirin ne her dem başe.

Weran: j.tên.vi. Werhan. Kevtin, Berbûn. **To fall**. **يَتَساقط** .
Payiz hat û belg weran. Payiz hat û belg ên dirextan weran.
_ :n.j.verbal noun. **Fall**. **تَساقُط** .
Weran a belgan li payizê çêdib/e/it.

Werandin: j.tê.vt. Jê êxistin. **To tumble**. يُسقِط .
Şivanî belg ên çulî werandin bo pezî.
_ :n.j.verbal noun. **Tumble.** إسقاط، تَسقيط
Werandin a belg ên çulî şivan pêrabû.

Wergeran: j.tên.vi. Ji cih çûn. **To disjoin. To disjunction**. يَنخَلِعُ
Pê yê Şadî wergera ji kevtinê.
_ :n.j.verbal noun. **Disjunction.** خَلْع .
Wergeran a pê yê(piyê) Şadî,Şadî ji kar êxist.

Wergerandin: j.tê.vt. Ji cih birin. **To disjoin, To disjunction**. يُخلِعُ
Kevtinê geh a pê yê Şadî wergerand.
_ :n.j.verbal noun. **Disjunction**. خَلْع .
Bi wergerandinê geh a pê yê Şadî gelek êşa.

Wergêran: j.tê.vt. **1**.Ruî kirin pişt. **To invert.** يَقلُب .
2.Kirin zimanekî dî(din). **To translate**. يُتَرجِمُ .
1.Sînemê nan bo deyk a xu wergêra.
2.Kamiranî rêziman a kurdî wergêra zimanê inglîzî.
_ :n.j.verbal noun. 1.**Invert**. قَلب .2.**Translation**. تَرجُمة .
1.Wergêran a nanî Sînem pêrabû.
2.Wergêran a rêzimanê Kamiran pêrabû.

Wergirtin: j.tê.vt. Standin. **To take**. يَأخُذ .
Azadî pênos wergirt ji Botanî.
_ :n.j.verbal noun. **Take, Taking**. أخِذ .
Wergirtin a pênosî bo nivîsînê bû.

Werrîn: j.tên.vi. Rewîn. **To bark(at)**. يَنبَحُ .
Se werrîn,dema kerwan borî.
_ :n.j.verbal noun. **Barking**. نِباح .
Werrîn a seyan bi şevê pitir e ji rojê.

Westan: j.tên.vi. **1**.Mandîbûn. **To weary**. **To tire**. يَتعَبُ .
2.Hestan. **To rise, To get up.** يَنهَضُ.
1.Darî westa ji karkirinê.
2.Danî westa ser pêyan bo hozan xuandinê.
_ :n.j.verbal noun. 1.**Weariness**. تَعَبْ .2.**Rise,Rising**. نِهوض
1.Westanê Darî nesaxkir.
2.Westan a ser pêyan danî diyarkir.

Westandin: j.tê.vt. **1**.Mandîkirin. **To weary**. يُتعِبُ
2.Hestandin. **To get up.** يُنهِضُ
1.Karkirinê Darî westand.
2.Noşdarî nesax westand ser pêyan.
_ :n.j.verbal noun.1.**Weariness**. تَعَب .2.**Get up**. نِهوض .
1.Westandinê Darî êxist nav nivînan.
2.westandin a ser pêyan Danî da diyarkirin.

Westêkkirin: j.tê.vt. Rabûn ser pêyan. **To step, To walk**. يَخطو، يَمشي
Kur ê Azadî westêkkirin pêr.
_ :n.j.Verbal noun. **Stepping, Walking**. خَطو، مَشي
Westêkkirin a Dîlanî dilê Azadî xoşkir.

Weşan: j.tên.vi. 1.Berbûn, Kevtin. **To drop**. يَسقُط
2.Belavbûn. **To publish**. يَنشُر
1.Îro hin xox weşan ji darê.
2.Bilind!Kasêt a nû hat weşan;an ne?
_ :n.j.verbal noun.1.**Drop**. سِقوط .2.**Publishing**. نَشِر .
1.Weşanê xox kêmkirin.
2.Weşanê kasêt dan firotin.

Weşandin: j.tê.vt. **1**.Êxistin. **To drop.** .يُسقِط
2.Belavkirin. **To Publish.** يُنشِرُ
1.Bayî xox weşandin.
2.Pirtûkxaneyê pirtûk weşandin. Nivîsîngehê kasêt weşandin.
_ :n.j.verbal noun.1.**Drop.** سِقوط .2.**Publishing**. نَشِر .
1.Weşandinê xox bi darê ve ne hêlan.
2.Weşandinê kasêt û pirtûk dan firotin.

Wênegirtin: j.tê.vt. Fotokêşan. **To picture, To photograph**.
Min du wênegirtin bo mindalan.
_ :n.j.verbal noun. **Picturing. Photography**. تَصوير .
Wênegirtin karê wênegirî ye.

Wênekêşan: j.tê.vt. Resimkirin. **To draw**. يَرسُمُ .
Wênekêşî, wênekêşa bo dîmenek ciwan.
_ :n.j.verbal noun. **Drawing**. رَسِمْ .
Wênekêşan, karê wênekêşî ye.

Wêran: j.tên.vi. 1.Ne tirsan. **To dare**. يَتَجاسَر .
1.Şemalî diwêra bi tinê bijît.
_ :n.j.verbal noun. **Daring**. تَجاسُر .
Bi wêranê dê pêşkevî û dê şêyî bijî li cîhanê.

Wêranbûn: j.tên.vi. Kavilbûn. **To destroy**. يَخرَبُ .
4500 gund wêranbûn di enfalan de.
_ :n.j.verbal noun. **Destruction**. خَراب .
Wêranbûn a gundan,Çandin nehêla li kurdistanê.

Wêrankirin: j.tê.vt. Kavilkirin. **To destroy, To ruin**. يُخَرِّبُ .
Serbaz ên Saddamî gund wêrankirin.
_ :n.j.verbal noun. **Destruction, ruin**. تَخريب .
Wêrankirin a gundan daxuaza Saddamî bû.

Wicgirtin: j.tê.vt. kêrhatin. **To be useful.** يُفيدُ، يَنفَعُ .
Xuandin wicgirtin e bo her miroveké.
_ :n.j.verbal noun. **Usefulness.** فائدة ، نَفعْ .
Wicgirtin a xuandinê bo hemî kesan pêdivê ye.

Windabûn: j.tên.vi. Bezirbûn. **To lose**. يَضيعُ .
Armanc windabû li Amedê.
_ :n.j.verbal noun. **Loss, Losing**. ضِياعْ .
Windabûn li şar ên mezin asayî ye.

Windakirin: j.tê.vt. Bezirkirin. **To lose**. يُضَيِّعُ .
Şerê cîhanê yê yekem gelek kes windakirin.
_ :n.j.verbal noun. **Loss, Losing**. ضَياع ، تَضييع .
Windakirin di şar ên mezin de çêdibe.

Wirarbûn: j.tên.vi. Xilêlbûn, Bê hoşbûn, dilgirtin. **To swoon**. يُغمى عَلَيه.
Memê alan wirarbû di zîndanê de.
_ :n.j.verbal noun. **Swoon**. إغماء .
Memê ma di wirarbûnê de ta mirinê.

Wirarkirin: j.tê.vt. Xilêlkirin. **To swoon**. يُفقَدُ الوعي .

Bîrhatinan Mem wirarkir di zîndanê de .

_ :n.j.verbal noun**. Swoon.** فَقدْ ، إغماء .

Wirarkirinê Mem hêla bê xuarin.

Wîqandin: j.tê.vt. Dengê beqê. **To yell (the frog)**.يَصيحُ الضّفدع .

Spêdeyan û êvaran beq diwîqînin li celalan.

_ :n.j.verbal noun.**Yell.** صِياحُ الضّفدع .

Wîqandin a beqan êvaran xoşe.

X

Xapandin: j.tê.vt. Ji rê birin. **To deceive, To cheat**. يَحتالُ ، يَخدَعُ
Zaro zû dihên xapandin. Nezan zuî dihên xapandin.
_ :n.j.verbal noun. **Deceive, Cheat**. إحتِيال ، خِداع .
Xapandin a nezanan gelek asan e.

Xardan: j.tê.vt. Bezîn. **To run**. يَركُضُ .
Bijarî xarda ji malê heta bazarî.
_ :n.j.verbal noun. **Running**. ركِضْ .
Di xardan a 100 metra de Barzan bû yekem.

Xavbûn: j.tên.vi. 1.Tenabûn. **To calm**. يَهدَؤُ
2.Badan têkçûn. **To blunt** يَنفَلُّ
1.Hanê xavbû ji nişkan ve ji serlêşêwanê.
2. Benik ê badidayî xavbû ve di dest ên Sitiyê da.
_ :n.j.verbal noun. 1**.Calm**. هدوء .2.**Blunt**. فَلّ .
1.Xavbûnê Hanê tenakir.
2.Xavbûnê benik kir hirî.

Xavkirin: j.tê.vt. **1**.Tenakirin. **To calm.** يُهَدِّئ
2.Badan têkbirin. **To notch**. يَفُلُّ
1.Leymîn a tirhişk min xavkir.
2.Gulê benkê xu xavkir ve,çiku pêwistî hin hirîyê bû.
_ :n.j.verbal noun. 1.**Calm**. تَهدِئ .2.**Notch**. فَلّ .
1.Xavkirinê Leymîn nivand.
2.Xavkirinê benik kir hirî.

Xayandin: j.tê.vt. Dem kêşan. **To last, To continue, To go on.** يَستَغرقُ وَقتاً

Avakirin a xanî sê meha xayand.

_ :n.j.verbal noun. **Last. go on, continue**. إستِغراقُ وَقت، إستِمرار

Bo xayandin a avakirin a xanî sê meh başbûn.

Xebatkirin: j.tê.vt. Têgoşîn. **To struggle**. يُناضِلُ.

Jinan gelek xebatkirin heya maf standin.

_ :n.j.verbal noun. **Struggle**. نِضال.

Xebatkirin a jinan sergirt.

Xelan: j.tên.vi. Wergeran, Ji cih çûn. **To wrench**. يَنخَلِعُ.

Nazê kevt destê wê xela.

_ :n.j.verbal noun. **Wrench**. خَلعْ.

Xelan a destê Nazê zû çêbû ve.

Xelandin: j.tê.vt. **1**.Wergerandin. **To wrench**. يُخلِعُ.

2.Çemandin. **To bow** يَتَمايَلُ ، يَنحَني.

1.Telhê pê yê rîvî xeland.

2.Azadî li govendê xu xeland.

_ :n.j.verbal noun. 1.**Wrench.** خَلعْ .**Bowing**. تَمايُل.

1.Xelandin a pêyê rîvî,rîvî nelivkir.

2.Xelandin a li govendê Azad îna pêşçav.

Xemilandin: j.tê.vt. Razandin. **To dress**. يُزَيِّنُ.

Kiçikan xu xemiland bo seyranê.

_ :n.j.verbal noun. **dress**. تَزيينْ.

Xemilandinê kiçik înan pêşçav.

Xeparekirin: j.tê.vt. Binê derametî xoşkirin. **To grub, To hoe.** يَعزِقُ

Sê jinika rezê me xeparekir.

_ :n.j.verbal noun. **Grub, hoe**. عَزقْ.

Xeparekirinê berhem fîrand(fîrhand)(gelek zêdekir).

Xesandin: j.tê.vt. Demar a mêranî yê lê birîn. **To castrate.** ، خصَّى يُخصي

Me beran xesand da qelew bib/e/it.

_ :n.j.Verbal noun **. Castration.** خِصاء، خِصِيّ

Bi xesandinê beran qelew bû.

Xetimîn: j.tên.vi. Hat girtin. **To close**. يَنسَدُّ .
Borrî ya avê xetimî av jê ne hat.
_ :n.j.verbal noun. **Close**. سَدّ .
Xetimîn a borrîyê,borrî da guhorîn.

Xetimandin: j.tê.vt. Da girtin. **To close**. يَسُدُّ .
Teqnê(qurê) borrî xetimand.
_ :n.j.verbal noun**. Close**. سَدّ .
Xetimandin a borrîyê bi teqnê, hat vekirin.

Xewarebûn: j.tên.vi. Bezirbûn, Hindabûn. **To disappear, To miss.** يَنفقِدُ
Kurê Samanî xewarebû li Silêmanîyê.
_ :n.j.Verbal noun. **Disappearance, Missing.** فُقدان، ضَياع
Xewarebûn a kurê Samanî,Saman gêjkir.

Xewarekirin: j.tê.vt. Bezirkirin, Hindakirin. **To lose.** يُخفي، يُفقِدُ
Kurê min destê min berda li Silêmanîyê û xu xewarekir.
_ :n.j.Verbal noun. **Loss.** فقِد، إخفاء
Xewarekirin a kur ê min;serêş îna(anî)min.

Xêrabûn: j.tên.vi. Bilezçûn. **To hurry**. يَستَعجِلُ .
Zavayî got,”Xêrabin bo guhaztina bûkê!”Berbûkî xêrabûn bo guhaztinê.
_ :n.j.verbal noun. **Hurry**. عَجَلة .
Xêrabûn a zavayî bûk zû da guhaztin.

Xêrakirin: j.tê.vt. Lezkirin. **To hurry**. يُعَجِّلُ .
Gulîzarê xêrakir da şîv bigehit mêhvanan.
_ :n.j.verbal noun. **hurry**. تَعجيل ، عَجَلة .
Xêrakirin a Gulîzarê şîv gehand mêhvanan.

Xêvakirin: j.tê.vt. Xuarin, Tamkirin. **To test. To eat .** يَأكُلُ لاوّل مرّة يَذوقُ،
Min gundorek gehiştî dît li nav werzî;min şkand û xêvakir
_ :n.j.Verbal noun. **Testing, Eating.** أكِل لاوَّل مرّة، إذاقة
Xevakirinê bo min da zanîn,ku gundor ên îsal şirînin.

Xirbûn: j.tên.vi. Komvebûn. **To gather**. يَجتَمِعُ .
Hemî gundî xirbûn bo dawet a kurê Gizîrî.
_ :n.j.verbal noun. **Gather, Gathering**. إجتِماع .
Xirbûn a gundîyan dawet dan gerimkirin.

Xirkirin: j.tê.vt. Komkirin. **To gather**. يَجمَعُ .
Gizîrî gundî xirkirin bo zibar a gundî.
_ :n.j.verbal noun**. Gather**. تَجميع ، جَمعْ .
Xirkirin a gundîyan bo vekirin a cuyê bû.

Xirrekbûn: j.tên.vi. Firehbûn. **To widen, To enlarge.** يَتَّسِع
Lastîk a doxînê xirrekbû ji liberkirinê.
_ :n.j.verbal noun. **Enlargement.** تَوَسُّع
Xirrekbûnê lastîk da guhorîn.

Xirrekkirin: j.tê.vt. Firehkirin. **To widen, To enlarge.** يُوَسِّع
Liberkirinê lastîk a doxînê xirrekkir .
_ :n.j.Verbal noun. **Enlargement**. تَوَسُّع
Xirrekkirin a doxînê ji liberkirinê çêbû.

Xişdîtin: j.t.vt. Deraxudîtin. **To take the opportunity.** يَنتَهِزُ الفُرصة
Xanîyek erzan hat ber firotinê,min xişdît û min kirrî.
_ :n.j.verbal noun. **Taking the opportunity.** إنتِهازُ الفُرصة
Bi xişdîtinê xanîyek erzan bi dest ê min kevt.

Xuandin: j.tê.vt. Name xuandin. **To read**. يقرَؤُ .
Zanayî name bo gulê xuand.
_ :n.j.verbal noun. **Reading**. قِراءة .
Xuandin a nameyê Zana pêrabû.

Xuarin: j.tê.vt. Cuîtin û qotdan. **To eat**. يَـأكُلُ .
Salarî du sêv xuarin.
_ :n.j.verbal noun. **Eating**. أكِل .
Bi xuarinê mirov dijît.

Xuaztin: j.tê.vt. Daxuazkirin. **To ask**. يَطلُبُ .
Şîlanê deh dînar xuaztin ji babê xu.
_ :n.j.verbal noun. **Asking**. طلب .
Xuaztin a xuarinê karê parskerî ye.

Xudankirin: j.tê.vt. Perwedekirin. Xueyîkirin. **To breed**. يُرَبّي .
Pişîk têşk ên xu xudandikin.
_ :n.j.verbal noun. **Breed**. تَّربية .
Xudankirin a zarokan deybab dikin.

Xudûrkirin: j.tê.vt. Xuvederkirin. **To distance**. يُبعِدُ نفسَه .
Têşik mezin bûn pişîkê xudûrkir ji wan.
_ :n.j.verbal noun. **distance**. إبعاد .
Xudûrkirinê têşik belavkirin.

Xuehirbûn: j.tên.vi. Çeman, Nerastbûn. **To bend to curve**. يَعوَجُّ
Nemam xuehirbû bo layê xorê(rojê).
_ :n.j.verbal noun. **Bend, Curve**. إعوجاج .
Xuehirbûn a dîwarî, dîwar da herifandin.

Xuehirkirin: j.tê.vt. çemandin, nerastkirin. **To bend, to curve**. يُحَنّي
Di werzişkirinê de,min xu xuehirkir bo layê çepê û rastê.
_ :n.j.verbal noun. **Bend, Curve**. إنحِناء .
Xuehirkirin bo layê çepê û rastê, di werzişkirinê de, karek asayî ye.

Xugirtin: j.tê.vt. Ne livîn. **To fix**. يَثْبُتْ .
Singî xugirt di axê ra. Nemam nemir xugirt.
_ :n.j.verbal noun. **Fix**.ثبات ، ثُبوت .
Xugirtin a nemamê nemam da şînkirin(ruwakirin).

Xuhdan: j.tê.vt. Areqekirdin. **To sweat**. يَعرَقُ .
Palan li ber hetavê xuhdan.
_ :n.j.verbal noun. **Sweat**. تَعَرُّقْ .
Bi xuhdanê pale sistbûn.

Xuhilkêşan: j.tê.vt. Nav li xu dan. **To pride oneself on.** يَتَفاخَر
Hin mirov xuhildikêşin bi direw.
_ :n.j.Verbal noun. **Pride**. تَفاخُر
Xuhilkêşan a Direw(ji qesta) ji kêm aqilîye.

Xuhmalîn: j.tê.vt. Xuhpaqijkirin, areqpaqijkirin. **To wipe(sweat)**. يَمسَحُ العَرَقْ.
Her bêhnekê palan xuhdimalîn ji german.
_ :n.j.verbal noun. **Wipe(sweat)**. مَسحُ العَرَقْ .
Bi xuhmalînê pale tena dibûn.

Xuîlkirin: j.tê.vt. Bi layekê ve çemandin. **To bend, To incline.** يُمَيِّل، يَحني
Di werzişê da mirov xu xuîldike bo alê çepê û rastê.
_ :n.j.Verbal noun. **Bending, Inclination.** إمالة، حَني
Bi xuîlkirin a werzişî mirov aza dib/e/it.

Xujiberavêtin: j.t.vt. Xu jê kêşan. **To draw back, To withdraw.** يَنسَحِبُ
Me xu lêkda da biçin nêçîra kewan Lezgînî xujiberavêt
_ :n.j.Verbal noun. **Withdrawal.** إنسِحاب
Xujiberavêtin a lezgînî nêçîr têkda.

Xukêşan: j.tên.vi. **1**.Xusengandin. **To weigh**. يَزِنُ نَفسَهُ .
2.Xu da layekê. **To withdraw**. يَنسَحِبُ .
1.Adarê xukêşa derkevt 60 kêlogiram.
2.Nazê xukêşa ji kombûnê.
_ :n.j.verbal noun. **1.Weigh**. وَزن
2.Withdrawal. إنسِحاب، سِحِب .
1.Xukêşanê hêla Adar kêm xuarinê bixut.
2.Nazê ne başîkir ji xukêşanê ji kombûnê.

Xumalîkirin: j.tê.vt. Mîrîkirin. **To nationalize.** يُؤَمِّم
Îraqê Beşdarge ya neft a kerkûkê xumalîkir.
_ :n.j.verbal noun. **Nationalization.** تَأميم
Xumalîkirin a Beşdarge ya neft a kerkûkê sûd gehand Îraqê.

Xunavgirtin: j.tê.vt. Terkirin. **To moisten**. يَبتَلُّ ، يَندى .
Ez hişyar bûm,min dît çîmen xunavgirtî ye.
_ :n.j.verbal noun. **Moist**. تَنَدّى .
Xunavgirtin a çîmenê ji serma çêdib/e/it.

Xuran: j.tên.vi. Xurhan. **To rub**. يَنحَكُّ .
Destê min xura(xurha) min xurand.
_ :n.j.verbal noun. **Rub, Rubbing.** حَكّ .
Xuran a destê min ,ez êşandim.

Xurandin: j.tê.vt. Gemirandin. **To rub**. يَحُكُّ .
Destî bixurîne,heker xura!
_ :n.j.verbal noun. **Rub, rubbing**. حَكّ .
Xurandinê dest tenakir.

Xurrîn: j.tên.vi. gefkirin. **To threaten**. يُهَدِّدُ .
Mirovê jîr li kesê naxurr/e/it.
_ :n.j.verbal noun. **Threat, Threatening**. تَهديد .
Mirovê nezan xurrînê bikar dîn/e/it.

Xu**ş**an: j.tên.vi. Livîn a bêdestî mirovî. **To slide, To glide.** يَنزَلِقُ .
Danî rûniştin li sernişîvîyekê da bixuş/e/it.
_ :n.j.verbal noun. **Slide, Glide**. إنزلاق .
Xuşanê kirasê Danî dirand.

Xu**ş**andin: j.tê.vt. Xulivandin. **To slide, To glide**. يُزلِقُ .
Arî xu xuşand ji serê girî ta binê girî.
_ :n.j.verbal noun. **Slide, Glide**. إنزلاق .
Di xuşandinê de Darî bû yekem

Xutêkilkirin: j.tê.vt. Desttêvedan. **To intervene in.** يَتَدَخَّل في
Narê xutêkilî kar ê kur ê xu kir.
_ :n.j.verbal noun. **Intervention.** تَدَخُّل
Xutêkilkirin a kar ê kurî, karek ne başbû Narê kirî.

Y

Yarîgêran: j.tê.vt. Rêvebirin a yaryê. **To appoint as arbitrator.** **يُحَكِّمُ**
Kê yarîgêra di navber a Iraq û Îtaliya de?
_ :n.j.verbal noun. **Arbitration**. **تَحكيم** .
Yarîgêran karê yarîgêrî ye.

Yarîkirin: j.tê.vt. Leyîztin. **To play**. **يَلعَبُ** .
Mindalan yarîkirin li gorepan a Dihokê.
_ :n.j.verbal noun. **Play, playing**. **لِعب** .
Yarîkirin xuîn a yarîkerî ji ruînî paqijdik/e/it.

Yarîzanîn: j.tê.vt. Leyiztinzanîn. **To know how to play.** **يَعرفُ أصولُ اللّعب**
Ne hemî yarîzan yarîkerin.
_ :n.j. Verbal noun. **Knowing playing rules.** **عارفٌ أصولُ اللّعب**
Yarîgêr yarîzanînê baş dizane.

Yaxegirtin: j.tê.vt. Bersinggirtin. **To Challenge**. **يَتَعَرَّضُ ل** .
Behdînî yaxe ya Lezgînî girt û lêxurrî.
_ :n.j.verbal noun. **Challenge**. **تَعَرُّض ل** .
Yaxegirtin kar ê bê mejîyan e.

Yekbûn: j.tên.vi. Bûn ligel hev. **To unite**. **يَتَوَحَّدُ** .
Partî û Yeketî yekbûn berî sal a 1975-ê.
_ :n.j.verbal noun. **Unity**. **وَحدة** .
Yekbûn a Partî û Yeketî di berjewendîya miletê kurd de ye.

Yekgirtin: j.tê.vt. Hevgirtin. **To unite, To unify**. يَتَّحِدُ .
Kurd ên başûr yekgirtin û serkevtin.
_ :n.j.verbal noun. **Union**. تَوَحُّدْ .
Yekgirtin a milet ê kurd serferazî ye.

Yekkirin: j.tê.vt. Kirin ligel hev. **To unify**. يُوَحِّدُ .
Kurdan Iraq yekkirin û cudabûn neviyan.
_ :n.j.verbal noun. **Union**. تَوحيد .
Yekkirin a Iraqê daxuaz a kurdan bû.

Z

Zalbûn: j.tên.vi. Serkevtin, bidest ve înan. **To triumph, To overcome**. يَغلبُ، يَنتَصِرُ
Kurd di şerê Xokurkê de zalbûn.
_ :n.j.verbal noun. **Triumph, Beat**. نَصِر .
zalbûn a pêşmergeyî di şerê Xokurkê de ji mêranî ya wan bû.

Zalkirin: j.tê.vt. Serxistin. **To overcome. To beat**. يُغلِبُ
Mêranî ya kurdan,kurd zalkirin.
_ :n.j.verbal noun. **Triumph, Beat**. نَصِر ، غَلبة .
Zalkirinê kurd gehandin maf ên wan.

Zamdarbûn: j.tên.vi. Brîndarbûn. **To wound.** .يَنجَرِحُ
Balo di şerê Batîfê de zamdarbû.
_ :n.j.verbal noun. **Wound, Wounding**. جَرحْ .
Zamdarbûn a Baloyî di rahêlanê de çêbû.

Zamdarkirin: j.tê.vt. Brîndarkirin. **To wound**. يَجرَحُ .
Pêşmergeyan 10 Serbaz ên Dijminî zamdarkirin.
_ :n.j.verbal noun. **Wound, wounding**. جَرحْ .
Bi zamdarkirin a 10 serbazan,dijmin paşdakişa.

Zan: J.tê.vt. Jidaykbûn. **To give birth to, To beget**. يولَدُ .
Bizinê du khar zan pêr.
_ :n.j.verbal noun. **Give birth to**. ولادة ، تَوليد .
Bi zan a du kharan şîr mişebû.

Zanîn: j.tê.vt. Agadarbûn, Pêhesan. **To know**. يَعلَمُ ، يَعرفُ .
Gulê dizanî,ku bizin dê zêt.
_ :n.j.verbal noun. **Know**. معِرفة .
Zanîn a Gulê bo zan a bizinê,Gulê amadekir bo arîkarîyê.

Zarkirin: j.tê.vt. Devkirin. **To pronounce**. يَتَلَفَّظ .
Omêd fêrbû elîfbê ya kurdî zarbik/e/it.
_ :n.j.verbal noun.**Pronunciation**. تَلَفُّظ .
Fêrbûn a zarkirin a elîfbê ya kurdî dilê Omêdî xoşkir.

Zarvekirin: Zerzerkîvekirin. **To imitate**. يُحاكي ، يُقَلِّد .
Hin kes leyîztokan dibînin û zarvedikin.
_ :n.j.verbal noun. **Imitation**. مُحاكاة ، تَقليد .
Bo zarvekirnê Pilo yê Zaxoyî zîrek e.

Zehifbûn: j.tên.vi. Mişebûn, Bûn gelek. **To increase**. يَتَكاثَرُ .
Gundor zehifbû bi çandinê.
_ :n.j.verbal noun. **Increase**. تَكاثُر .
Zehifbûn a berhemê gundoran ji barîn a baranê bû.

Zehifkirin: j.tê.vt. Mişekirin, Gelekkirin. **To increase**. يُكَثِّرُ .
Barîn a baranê çandin a gundoran zehifkir.
_ :n.j.verbal noun. **Increase**. تَكاثُر ، كَثرة .
Zehifkirina çandin a gundoran,gundor erzankirin.

Zelalbûn: j.tên.vi. **1**.Ruhinbûn. **To clarify.** يُوَضِّح، يُصَفّى
2.Bijuînbûn. **To refine** يُنَقّى .
1. Bû spêde dunya zelalbû.
2.Av şêlûbû me şeb kir têda zelalbû.
_ :n.j.verbal noun.1.**Clarity.**وضوح .2.**Refinement.**صَفاء، تَنقية .
1.Bi zelalbûn a dunyayê esman bû şînê vekirî.
2.Zelalbûn a avê,av da vexuarin û bikarînan.

Zelalkirin: j.tê.vt. **1**.Ruhinkirin. **To clarify**. يُصَفّي
2.bjuînkirin. **To refine.** يُنَقّي
1.Hildan a rojê dunya zelalkir.
2.Têkirin a şebê av zelalkir.
_ :n.j.verbal noun.1.**Clarity**.تَصفية .2.**Refinement**. تَنقية
1.Zelalkirin a dunyayê pale ji xewa şirîn hişyarkirin.
2.Zelalkirin a avê,karê şebê bû.

Zeliqandin: j.tê.vt. Nuîsandin, Pêvehêlan. **To cleave, To agglutinate**. يُغري، يُلصِقُ .
Pûl hat zeliqandin bi nameyê ve.
_ :n.j.verbal noun. **Agglutination**. تَغرية ، لَصِق .
Bê zeliqandin a pûlî name nahê şandin.

Zeliqîn: j.tên.vi. Nuîsan, pêvenan. **To adhere.** يَلصَقُ.
Hin xim zeliqî bi kirasê ximkerî ve.
_ : n.j.verbal noun. **Adherence.** إلتِصاق ، لَصِق.
Zeliqîn a ximê bi kirasî ve,kiras da şûştin.

Zelyan: j.tên.vi. Lezandin. **To hurry, To quicken.** يَسرَعُ.
Aras dizelya di birêveçûnê de.
_ : n.j.verbal noun. **Hurrying.** إسراع ، سُرعة.
Zelyan a Arasî di birêveçûnê de, da bigehit karî.

Zerbûn: j.tên.vi. **1**.Çirçbûn. **To yellow.** يَصفرُّ ، يَذبُلُ
2.Gehiştin. **To ripe.** يَنضَجُ
1.Nemam zerbûn ji kêm avî.
2.Gundor zerbûn hatin çinîn.
_ : n.j.verbal noun.1.**Yellowness.** ذبول .2.**Riping**. نِضوج.
1.Zerbûn a nemaman ji kêm avî bû.
2.Zerbûn a gundoran,gundor dan çinîn û firotin.

Zerkirin: j.tê.vt. Rengkirin bi zerî. **To yellow.** يُلَوِّنُ بالاصفر.
Me hemî dergeh zerkirin.
_ :n.j.verbal noun. **Yellowness.** تَلوين بالاصفر.
Zerkirnê dergeh çiwankirin.

Zêdebûn: j.tên.vi. Hatin /ser/gel. **To increase**, **To grow.** يَكثُرُ،
Dirav di bankê de zêdedib/e/it. Çêl zêdebûn bi zanê.
_ :n.j.verbal noun. **Increase.** إزديا د ، كَثرة.
Zêdebûn a diravî di bankan de çêdib/e/it.

Zêdekirin: j.tê.vt. Havêtin ser, pirrkirin. **To increase.** يَزيدُ، يُكثِرُ
Me çêl zêdekirin bo şîrî.
_ :n.j.verbal noun. **Increase.** تَكثير، زيادة.
Bi zêdekirin a çêlan şîr zêdebû.

Zêndîbûn: j.tên.vi. Vegeran jiyanê. **To resuscitate.** يَحيّي
Bengîn ma nehişyar du roja;paşî zêndîbû ve.
_ :n.j.verbal noun. **Resuscitater.** إحياء بَعدَ الإغماء.
Zêndîbûn a Bengînî Noşdar pêrabû.

Zêndîkirin: j.tê.vt. Vegerandin jiyanê. **To resurrect**. يُحيي .
Noşdarî dilgirtîyek zêndîkir ve.
_ :n.j.verbal noun. **Resurrection**. إحياء ، بَعث .
Zêndîkirin a dilgirtî noşdar pêrabû.

Zêrevanîkirin: j.tê.vt. Çavdêrîkirin. **To watch**. يُراقِبُ .
Me du şeva zêrevanîkir û me diz girt.
_ :n.j.verbal noun. **Watch**. مُراقبة .
Bi zêrevanîkirnê me diz girt.

Zêrkirin: j.tê.vt. Kiraskirin bi zêrî. **To gild**. يُطلي بالذّهَب .
Sîqalê didanek xu zêrkir.
_ : n.j.verbal noun. **Gild**. طلاء بالذّهب .
Zêrkirin a didanî giran rawesta li ser Sîqalê.

Zikçûn: j.tên.vi. Rîtin a ruhin. **To purge**. يَسهَلُ البَطِن .
Bi xuarin a helhelokan zikdiçit.
_ : n.j.verbal noun. **Purge**. إسهال .
Zikçûnê Salar lawazkir.

Zikêşan: j.tên.vi. Jankirin a zikî. **To gripes**. يوجَعُ البَطِن .
Bi xuarin a gelek zikê min êşa.
_ :n.j.verbal noun. **Stomach ache**. وَجَعُ البَطِن .
Zikêşan divê bihê çareserkirin.

Zikmezinbûn: j.tên.vi. Gewrebûn a zikî. **To have a large stomach.** يُكَرِّشُ
Bi xuarin a gelek zikmezindibe.
_ :n.j.verbal noun. **Potbelly, Paunch**. تَكَرُّش **.**
Zikmezinbûn ji xuarin a gelek e.

Zikmezinkirin :j.tê.vt. Gewrekirin a zikî. **To conceive**. يَحبَلُ **.**
Gulê her du sala zikîmezindik/e/it.
_ :n.h.verbal noun. **Pregnancy**. حَبَلْ .
Bi zikmezinkirin a bûkê dilê xesûyê xoşdib/e/it.

Zikpêsotin: j.tê.vt. Dilpêveman. **To sympathize**. يَعطِفُ على .
Arî çewa danî dît direjkirîye, zikpêsot û bir bo xestexanê.
_ :n.j.verbal noun. **Sympathize**. عَطفٌ على **.**
Bi zikpêsotin a Arî ,Danî hat birin bo xestexanê.

Zikpiffbûn: j.tên.vi. zikmezinbûn. **To conceive**. يُحبَلُ بالوَلَد .
Dema zikê Nazo piffbû,dilê mêrê wê xoşbû.
_ :n.j.verbal noun. **Pregnancy**. حبَلْ ، حمِلْ .
Bi zikpiffbûn a Nazo dilê mêrê wê xoşbû.

Zikpiffkirin: j.tê.vt. zikmezinkirin. **To conceive**. يُحَبِّلُ .
Nazo zikpiffkir da dilê mêrê xu xoşkit.
_ :n.j.verbal noun. **Pregnancy.** حَمِل .
Mêrê Nazo bi zikpiffkirin a wê dilxoşbû.

Zimanzanîn: j.tê.vt. Agadarê rêzimanê. **To know (language**).
يَعرفُ لُغة.
Xelat zimanzan e,di zimanê inglîzî de.
_ :n.j.verbal noun. **Knowing (language**). مَعرفة اللغة .
Zimanzanîn ji rêzimanzanînê ye.

Zincîrkirin: j.tê.vt. Bestin bi zincîrê. **To enchain, To fetter**. يَصفِدُ
Hesp hat zincîrkirin da ne rev/e/it.
_ :n.j.verbal noun. **Fetter, Shackle**. رَبط بالسِّلسِلة .
Zincîrkirinê ne hêla hesp birev/e/it.

Ziravbûn: j.tên.vi. Barîkbûn. **To thin, To fine**. يَصبَحُ رَفيعاً .
Darsêv a me berî sê sala ziravbû,niha stûre.
_ :n.j.verbal noun.**fine.** رَفيع .
Ziravbûn a nemam ên sêvan ji nuî çandinîyê bûn.

Ziravkirin: j.tê.vt. Barîkkirin. **To thin, To fine**. يُنَحِّلُ .
Me benik ziravkir da bihê girêdan.
_ :n.j.verbal noun. **Fine**. نِحول .
Ziravkirin a benkî ji ber girêdanê bû.

Zirravbirin: j.tê.vt. Tirsandin, Piçandin. **To frighten**. يُخَوِّفُ .
Evînê got Ciwanê,``weh!``zirravlêbir.
_ :n.j.verbal noun**. Fright**. خَوفْ ، هَلَعْ .
Zirravbirin a zarokan bi dîtin a hirçan çêdib/e/it.

Zirîn: j.tên.vi. deng ji kerî hatin. **To scream**. يَزعَقُ ، يُزَنعِرُ .
Ker zirî,dema maker dîtî.
_ :n.j.verbal noun. **Scream**. زَعيقُ الحِمار .
Zirîn a kerî li zivistanê kêmtire ji biharê.

Zirtberdan: j.tê.vt. Xu pivdan. **To praise, To extol**. يَمدَحُ .
Herekolî Narîn dît li bazarî zirtberdan bo wê.
_ :n.j.verbal noun. **Praise**. مَدِحْ.
Zirtberdan karê bê aqilan e.

Zivirandin: j.tê.vt. Sorandin. **To turn, To spin**. يُدَوِّرُ .
Perîyê xu zivirand heta gêjbû.
_ :n.j.verbal noun. **Turning, Spinning**. دَوَران .
Zivirandinê Perî gêjkir.

Zivirbûn: j.tên.vi. Sextbûn. **To roughen. To coarsen**. يَتَخَشَّنُ .
Xanik zivrbû ji bikarînanê. Xanik zivirbû ji nanpehtinê.
_ :n.j.verbal noun. **Roughness, Coarseness**. خِشونة .
zivirbûnê xanik da avêtin.

Zivirîn: j.tên.vi. Sûrîn. **To turn, To spin**. يَدورُ .
Cencer dizivir/e/it li ser qirşî.
_ :n.j.verbal noun. **Turning, spinning**. دَوَران .
Zivirîn a cencerê genim da cudakirin ji qirşî.

Zivirkirin: j.tê.vt. Sextkirin. **To Roughen**. يُخَشِّنُ **.**
Nanpehtinê xanik zivirkir.
_ :n.j.verbal noun. **Rough**. تَخَشُّن .
Zivirkirin a xanikê ji nanpehtin a gelek çêbû.

Zîldan: j.tê.vt. Ruwan, Şînbûn. **To grow**. يَنموا .
Hemî genimê me çandî zîlda.
_ :n.j.verbal noun. **Growth**. نِموّ .
Zîldan a genimî dilê cotyarî xoşkir.

Zîndankirin: j.tê.vt. Hebiskirin. **To imprison**. يُسجِنُ .
Gurgîn du sala hat zîndankirin.
_ :n.j.verbal noun. **Prison, Imprisonment**. سَجِن .
Zîndankirinê Gurgîn gelek êşand.

Zînkirin: j.tê.vt. Zîn danan ser piştê. **To saddle**. يُسرِجُ .
Lawînî hesp zînkir.
_ :n.j.verbal noun. **Putting the saddle (on the horse).** سَرَّج .

Zînkirinê hesp amadekir bo suyarbûnê.

Zîrekbûn: j.tên.vi. Çelengbûn, Xêrabûn. **To Activate, To quicken**. **يَنشَطُ**

Arî zîrekbû bo xardanê.

_ :n.j.verbal noun. **Activity, Activeness**. **نَشاط .**

Zîrekbûnê Arî pêşêxist li fêrgehê.

Zîrekkirin: j.tê.vt. Çelengkirin, Xêrakirin. **To activate**. **يُنَشِّطُ** .

Hesp hat zîrekkirin bi taqîkirnê.

_ :n.j.verbal noun. **Activity, Activeness**. **نَشاط ، تَنشيط**.

Bi zîrekkirinê hesp bû yekem di berêkaneyê de.

Zuîran: j.tên.vi. Tavê birin. **To burn**. **يَلسَعُ ، يَلذَعُ** .

Ruî yên Salarî zuîran li ber tavê (hetavê).

_ :n.j.verbal noun. **Burning**. **لَسِعْ ، لَذِعْ** .

Zuîranê ruî yên Salarî sorkirin.

Zuîrandin: j.tê.vt. Tavê revandin. **To burn**. **يُلذِعُ** .

Tavê ruî yên Salarî zuîrandin.

_ :n.j.verbal noun. **Burn. لَذِع ، حَرِق** .

Zuîrandin a ruî yên Salarî ji tîrêj a tavê çêbû.

Zîvalbûn: j.tên.vi. Diran, Pijikîn. **To be cut**, **To tear**. **يَتَمَزَّقُ** .

Cil ên Xincerî zîvalbûn di ber da.

_ :n.j.verbal noun. **Cutting up, tear**. **تَمَزُّق** .

Zîvalbûn a cil ên Xincerî ji pîsatîyê bû.

Zîvalkirin: j.tê.vt. Dirandin, Pijikandin. **To tear to pieces**. **يُمَزِّقُ**

Xanzê cil ên xu zîvalkirin.

_:n.j.verbal noun. **Tear, Rupture**. **تَمزيق .**

Bi zîvalkirin a cilan Xanzê ma ruîs.

Zîvkirin: j.tê.vt. Bi zîvî kiraskirin. **To silver**. **يُكسي بالفِضَّة** .

Sînemê didanek xu zîvkir.

_ :n.j.verbal noun. **Silver**. **كَساء بالفِضَّة** .

Bi zîvkirin a didanî Sînem ciwanbû.

Zîzbûn: j.tên.vi. Silbûn. **To quarrel**. **يَتَخاصَمُ** .

Nazê zîzbû ji mêrê xu.

_ :n.j.verbal noun. **Quarrel**. **خِصام** .

Zîzbûnê Nazê da berdan ji mêrê wê.

Zîzkirin: j.tê.vt. Silkirin. **To argue**. يُخاصِمُ .
Hewî ya Nazdarê,Nazdar zîzkir.
_ :n.j.verbal noun**. Argue**. خِصام .
Zîzkirinê Nazdar da cudakirin ji hewîyê.

Zorbûn: j.tên.vi. Bûn gelek, Pirrbûn. **To increase**. يَزدادُ **.**
Hêk zorbûn bi xudankirin a mirîşkan.
_ :n.j.verbal noun. **Increase**. إزدِياد .
Bi zorbûn a hêkan,me hêk firotin.

Zorkirin: j.tê.vt. Kirin gelek. **To increase**. يُزَيِّدُ .
Me mirîşk zorkirin bo hêkan.
_ :n.j.verbal noun. **increase**. إزدِياد .
Zorkirin a mirîşkan hêk mişekirin.

Zorzanîn: j.tê.vt. Bû profêsûr. **To study thoroughly**. يَتَبَحَّرُ، بالعِلم
Celadetî kîmya zordizanî.
_ :n.j.verbal noun. **Thorough study**. **تَبَحُّر بالعِلم .**
Zorzanîn bi xuandin a bala(bilind) çêdib/e/it.

Paşgotin

Dema min biryar dayî,ku ez ferhengê pîşkan (The dictionary of verbs) binivîsim,eger a min ew bû:-

1.Weheye bib/e/it pêngavek bo zimanê kurdî yê yekgirtî.

2.Da şaşî ne hên kirin di jêder û dem ên pîşkan de (The infinitives and tenses of the verbs). Di axavtin û nivîsînê de, ez gelek şaşîya dibihîsim di wan babetan de, mixabin!

Jêder ên evî karî (the sources of this work) hin ferheng ên kurdî, Inglîzî û erabî bûn,ligel zanîn a min. Weheye min hin pîşk (verbs). Ji bîrkiribin;ez hîvîyê dikim hûn min agehdarbikin da bihên biservekirin di çap ên dî(din) de.Biborin min hin pîşk ne nivîsîn ew ên ji peyvek (erebî + kirin) kevtîn di zimanê kurdî de. Wek bo nimone:-

Şuxil(şûl) + kirin. = şûlkirin.
Meş + kirin. = Meşkirin.
Fikir + kirin. = Fikirkirin.
Qetil + kirin. = Qetilkirin.

Û hin pîşk ên din. Çiku me li cihê ewan, pîşk ên kurdî yên petî hene. Wek:-

Erebî	Kurdî
Şûlkirin	Karkirin
Meşkirin	Çûn(bi rêve çûn)
Fikirkirin	Hizirkirin
Qetilkirin	Kuştin

Têbînî:1.(kirin û kirdin) min (kirin) bikaranî,çiku:-rih a kirinê=(k). Bike, dike, dê ke, kir, dikir, kirîye, kirîbû. (kirdin) rih a (kirdinê)= (kir). ew naguncêt ligel dem ên kurdî. kurd nalên:- bikire, dikire, dê kire.

2.(Birin) û (Birdin) min (Birin) bikarîna, çiku:- rih a birinê=(b). Bibe, dibe, dê be, bir, dibir, birîye, birîbû. (birdin) rih a (birdinê)=(bir). Nahê gotin: bibire, dibire dê bire.

Têbînî:2.**Helbijartin** û **helbijardin**.Min **helbijartin** nivîsî,çiku birk a dawî ya helbijartinê,(tin) e û (a) di birk a pêşî wê da heye; vêca rih(reg) dê b/e/it(**helbijêr**)bigoreyî rêz ên derînan a rihê ji jêderî. Helbibijêre, heldibijêre, helbijart, heldibijart, helbijartî ye, helbijartî bû.

Helbijardin: Birk a dawî(din)e û (a) di birk a pêşî wê da heye; Rih(reg) dê b/e/it (**Helbijîr)** bigoreyî rêz ên derînan a rihê ji Jêderî û ew ne tewawe.

Ez hîvîyê û daxuazê ji her kurdekê dikim xu fêrî rêziman a kurdî Bik/e/it bi her du zarava:soranî û kirmancî. Da zimanê me çû şa şî têda ne mînin.

Mixabin! Hin rewşenbîr ên dever a Badînan nizanin zimanê kurdî bixuînin û binivîsin,çiku xuandin a wan ya seretayî bi zimanê erebî bû.Ma ne kirête gelî biray ên hêja! Xu fêrbikin birayîno!

Li dawîyê ez hîvîya serkevtinê dikim bo xuandewar ên hêja û daxuaz a lêbo- rînê ji kurtîyan jî dikim; çiku çukes nînin şaşîya nekin.

Jîyan û serkevtin bo gelê me yê aza û azad.

Supasî bo mamhostayê hêja Xelat Remezan neccar; bo pêdaçûn a zimanê inglîzî.

Parêzer Îbrahîm Remezan Zaxoyî.

Jêder ên pirtûkê
The sources of the book

1. Ferhengî Mehabad, kurdî erebî. Daner: Kêwî mukrîyan.
2. Ferhengî kurdistan, kurdî kurdî. Daner: Kêwî mukrîyan.
3. Ferhengî Estêre geşe, kurdî erebî. Daner: Fazil nîzameddîn.
4. Qamos a Selaheddîn, Inglîzî kurdî. Daner: Selah Seidila.
5. Qamos a el Mewrid, Inglîzî erebî. Daner: Munîr Beilebekî.
6. Qmos a el mewrid,Erebî inglîzî. Daner: Munîr beilebekî.
7. Qamos a modern,Erebî inglîzî. Daner: Elyas A. Elyas.
8. Qamos a el muncid, Erebî erebî. Daner: Liwîs Meilûf.
9. Rêziman a kurdî,kurdî inglîzî erebî. Daner: parêzer Îbrahîm Remezan zaxoyî sal a 1998-ê.
10. Îdyem êt kurdî. Daner: Sadiq Behaaddîn Amêdî.